



Zanîngeha Mardin Artukluyê
Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê
Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

**ROLÊ MORFEMÊN NIVŞÎ
DI SENTAKSA ZIMANÊ KURDÎ DE
(GOVERA BEHDÎNÎ)**

MAJID JABAR ABOZAID

15711018

Şêwirmend

Doç. Dr. Rafîk Sulaiman

Mêrdîn 2018

K.T.

Zanîngeha Mardin Artukluyê
Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê
Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

**ROLÊ MORFEMÊN NIVŞÎ
DI SENTAKSA ZIMANÊ KURDÎ DE
(GOVERA BEHDÎNÎ)**

MAJID JABAR ABOZAID

15711018

Şêwirmend

Doç. Dr. Rafik Sulaiman

Mêrdîn 2018

TAAHHÜTNAME

TÜRKİYE’DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Mardin Artuklu Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum “Rolê Morfemên Nivîşî di Sentaksa Zimanê Kurdî de, Govera Behdînî” adlı tezin/projenin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, tezimin/projemin kağıt ve elektronik kopyalarının Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

- Tezimin/Projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.
- Tezim/Projemin sadece Mardin Artuklu Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.
- Tezimin/Projemin ... yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin/projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.

.../.../.....

MAJID JABAR ABOZAID

KABUL VE ONAY

Majid Jabar ABOZAID tarafından hazırlanan “Rolê Morfemên Nivşî di Sentaksa Zimanê Kurdî de, Govera Behdînî” adındaki çalıřma, Savunma Sınavı Tarihi tarihinde yapılan savunma sınavı sonucunda jürimiz tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı **YÜKSEK LİSANS TEZİ** olarak oybirliđi / oyçokluđu ile kabul edilmiřtir.

Doç.Dr. Abdurrahman ADAK (Bařkan)

Prof.Dr. Mehmet Edip ÇAĐMAR (Üye)

Doç.Dr. Rafik SULAIMAN (Danıřman)

PÊŞGOTIN

Ev vekolîn mijara rolê morfemên nivîşî di sentaksê de bi xweve digire. Me pêdivî dît vê mijarê weku vekolîn encam bidin, ji ber ku nivîş her ji Kevin de di pirtûkên zimanî de amaje pê hatiye dan. Vekolîn li ser layenê nivîşê (siruştî, rêzimanî) yê navan hatiye kirin. Di zimanê kurdî de bikarîna nivîşî ji diyalektekê bo yeke dîtir cuda ye, herweha carinan gover û devokên yek diyalêktê jî ji hev cuda ne. Govera Behdînî yek ji wan goverên diyalekta serî ya zimanê kurdî ye ku bi rêjeyeke berifreh morfemên nivîşî bi kar tê anin.

Nivîşê rêzimanî yê navî mijara vekolîna me ye, lewra bi şêweyekî giştî morfema nivîşî tenha dû nivîşan (nêr, mê) diyar dîke, çî ew nav ji layê nivîşî ve zayende, duzayende, bêzayende be, herweha di vê govera Behdînî da morfema nivîşî tenha bo destnîşankirina nivîşî nîne, belku hindek rolên sentaksî ergatîv, akûzatîv, berdewamî, tamamî... hene û keresteyê vekolînê ji axaftina rojane ya axêverên vê goverê hatiye wergirtin.

Ev vekolîne dê bibe rêxweşkerek bo encamdana hindek vekolînên dî ku berawirdî di navbera gover û devokên kurmanciya serî de li ser hebûn û bikarîna morfemên nivîşî bêne encamdan.

Spasî bo Doç. Dr. Rafik Sulaiman ku serpirîştîya vê nameyê kiriye; bo Zanîngeha Mardin Artukluyê û bi taybetî Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî; bo hemî mamosteyên ku di kursên xwendinê de wane gotine min. Spas bo Dr. Sanya Cebar Ebuzeyd û P. D. Ebdulwehab Xalid Musa bo alîkariya wan.. Herweha spas bo hevjin, dayik, xwişk, bira û mamê min.

Ev name diyarî ye bo:

Giyane bavê min ê dilovan.

Dayik û xwişk û birayê min.

Hevjîna min.

Her du keçên min *Aşna û Jilayê*.

KURTE

Nivş û morfemên nivşî ji layê hindê vekoler û rêzimanivîsan ve hatine behskirin belê weku babeteke serbixwe vekolîn li ser nehatiye encamdan. Lewra me ev babet bo vê vekolîna bi navê “Rolê Morfemên Nivşî di Sentaksa Zimanê Kurdî de, Govera behdîni” hîlbijart.

Giringiya vê vekolînê ew e ku morfemên nivşî bi şêweyekî berbelav di vê goverê de bi kar tên û wan layenên sentaksî, ku ev morfem rolê xwe di gire û risteyê de dibîne, diyar dikin. Ciyawazî di navbera nivşê siruştî û rêzimanî de heye, morfemên nivşî li dûv doxê rêzimanî di gire yan risteyê de tê guherîn, morfemên nivşî yê hevşêweyî doxên ciyawaz di vê goverê de derdibire û morfemên nivşî rol di diyarkirina rûkarên karî de heye.

Me nimûne ji axaftina rojane ya axêverên vê goverê wergirtine. Ev morfem li dûv nivşî û şêwe û cihê hatinê û rolê wan di nimûneyan de xuyakirî ne.

Giringtirîn encamên vê vekolînê, diyarkirina doxên xistineser, amaje, gazîkirinê, tîyan di gireyê de; doxên ergatîv, aqûzatîv di risteyê de ye.

Peyvên Sereke: Morfem, Zayenda Siruştî, Zayenda Rêzimanî, Sentaks, Rawe.

ÖZET

Kürtçe’de cinsiyet morfemleri çeşitli gramercilerin kitaplarında değinilse de şimdiye kadar bağımsız bir konu olarak ele alınmamıştır. Bundan dolayı “Behdini Yöresi Örnekleminde Kürt Dilinde Cinsiyet Morfemlerinin Rolü” adlı bu çalışmada bu konuyu Behdini yöresi örnekleminde el aldık.

Kürtçenin bu yörede konuşulan diyalektinde cinsiyet morfemleri yaygın bir şekilde kullanıldığından dolayı, öbeklerde ve cümlede çeşitli roller üstlenen bu morfemlerin öneminin gösterilmesi için bu yöre seçilmiştir. doğal cinsiyet ve dilbilgisel cinsiyet arasında fark var mı, Cinsiyet morfemleri gramatik hallere göre öbekte ve cümlede değişmekte midir, eşbiçimli morfemler bu yörede farklı halleri ifade etmekte midir ve cinsiyet morfemlerin fiil görünüşlerinde rol almakta mıdır Alıyorsa hangi görünüşlerde almaktadır.

İçin bu yörenin konuşulan günlük dilden örnekler alınmıştır. Bu morfemler cinsiyet, şekil, eklendikleri yer ve rollerine göre seçilen örneklerde görülmektedir.

Bu çalışmanın en önemli sonuçları öbeklerde genitif, işaret, seslenme ve büküm hallerinin; cümlelerde ise ergatif ve akuzatif hallerinin gösterilmesidir.

Anahtar Kelimeler: Morfem, Doğal Cinsiyet, Dilbilgisel Cinsiyet, Sentaks, Kip.

ABSTRACT

This research deals with “The Role of Gender Morpheme in syntax of Kurdish Behdini Region as Sample”, gender and gender morpheme, which were explained by some researchers and grammarians, however, as an independent subject no researches were made about it. As a reason, we have chosen this as a subject research.

The important of this research shows that the gender morpheme was made randomly in this sub –dialect. The role of morpheme was appeared in phrase and sentence syntactically.

there is a different between natural gender and grammar, the gender is morpheme as a grammatical case happened in phrase or sentence, there a is differentiated cases in gender morphemes as two faces in this sub –dialect happened, the gender are morphemes showed the aspect of verbs.

We take examples from dialy speech of the speakers that used the sub-dialect. These morphemes were made according to their gender, shapes, places that they brought and roles in sentences..

The most important results of this research are to show the cases of genitive, signs, announcement and oblique in phrase and the cases of ergative and accusative in sentence.

Key Words: Morpheme, Natural Gender, Grammatical Gender, Syntax, Mood.

NAVEROK

PÊŞGOTIN	III
KURTE.....	IV
ÖZET	V
ABSTRACT	VI
NAVEROK	VII
KURTEBÊJE.....	X
LÎSTA HÊMAYAN	XI
BÊJEYÊN HEVWATA.....	XII
DESTPÊK	1

1. BEŞA YEKEM

PÊNASEYA MORFEMÊ Û CUREYÊN WÊ

1.1. PÊNASEYA MORFEMÊ	5
1.1.1. CUREYÊN MORFEMAN.....	6
1.1.1.1. Morfema Serbixwe.....	7
1.1.1.2. Morfema Nîmçe Serbixwe	7
1.1.1.3. Morfema Bend Û Cureyên wê	7
1.2. Morfemên Nivşî.....	10
1.2.1. Nivşê Siruştî û Rêzimanî	11
1.2.2. Cureyên Nivşî di Zimanê Kurdî de.....	13
1.2.2.1. Nivşê Siruştî û Cureyên Wî.....	13
1.2.2.1.1. Polînkirina Nivşê Siruştî di Karên Berê de.....	14
1.2.2.1.2. Hilsengandina Polînkirina Nivşê Siruştî di Karên Berê d.....	17
1.2.2.2. Nivşê Rêzimanî û Cureyên Wî.....	18
1.2.2.2.1. Polînkirina Nivşê Rêzimanî di Karên Berê de.....	19
1.2.2.2.2. Hilsengandina Polînkirina Nivşê Rêzimanî di Karên Berê da....	22
1.2.3. Nivşên Rêzimanî yên Navên Bêzayend di Zimanê Kurdî de ..	24
1.2.3.1. Nivşê nêr	24
1.2.3.2. Nivşê mê	25
1.2.4. Elomorfemên Morfemên Nivşî.....	26
1.2.5. Peywendiya Morfemên Nivşî bi Morfofonîmê ve.....	29
1.2.6. Peywendiya Morfemên Nivşî bi Morfosentaksê ve	30
1.2.7. Peywendiya Morfemên Nivşî bi Morfofonosentaksê ve	31

2. BEŞA DUYEM

GIRE, TAYBETMENDÎ Û CUREYÊN WÊ Û TÊGEHÊ SENTAKSÊ, RISTE Û DOXÎ Û ROLÊN MORFEMÊN NIVŞÎ DI SENTAKSA ZIMANÊ KURDÎ - GOVERA BEHDÎNÎ DE

2.1. GIRE (FIRÊZ).....	34
2.1.1. Pêkhênên Gireyê.....	34
2.1.2. Taybetmendiyên Gireyê	36
2.1.3. Cureyên Gireyê.....	37
2.1.3.1. Gireya Navî	37
2.1.3.2. Gireya Pêşnavî.....	47
2.1.3.3. Gireya Karî	49
2.1.4. ROLÊN GIREYAN DI RISTEYÊ DE.....	52
2.2. PÊNASE Û TÊGEHÊN SENTAKS, RISTÊ Û DOX	55
2.2.1. Sentaks	55
2.2.2. Riste.....	56
2.2.3. Dox	57
2.3. ROLÊ MORFEMÊN NIVŞÎ DI GIREYÊ DE.....	57
2.3.1. Doxê Xistineser Û Cureyên Xistineser.....	57
2.3.2. Diyarker.....	62
2.3.2.1. Doxê Tiyan	63
2.3.2.2. Doxê Amajeyê.....	63
2.3.2.3. Doxê Gazîkirinê.....	67
2.3.3. Kopîkirin.....	68
2.3.4. Rolê Morfema Nivşî di Sînardarkirina Gireya Navî de	69
2.4. Rolê Morfemên Nivşî di Sentaksê de.....	71
2.4.1. Sîstemên Doxî	71
2.4.1.1. Ergatîv û Cureyên Wê	73
2.4.1.2. Doxê Nomînatîv û Doxê Absolutîv	75
2.4.1.3. Doxê Ergatîv û Doxê Akuzatîv	76
2.4.2. Rolê Morfemên Nivşî di Destnîşankirina Doxî di Zimanê Kurdî de.....	77
2.4.2.1. Doxê Tiyan	78
2.4.2.2. Doxê Akuzatîv.....	79
2.4.2.3. Doxê Ergatîvî.....	80

2.5. Rolê Morfemên Nivî Di Diyarkirina Rûkaran (Espêktan) de.....	82
2.5.1. Pênaseya Rûkaran (Espêktan)	82
2.5.1.1. Destnîşankirina Rûkara Berdewamiyê	83
2.5.1.2. Destnîşankirina Rûkara Temamiyê	85
ENCAM.....	90
ÇAVKANÎ.....	92

KURTEBÊJE

<i>Am</i>	Amaje
<i>Ebs</i>	Ebsulutîv
<i>Ak</i>	Akûzatîv
<i>Er</i>	Ergatîv
<i>Bi</i>	Biker
<i>Ber</i>	Berkar
<i>Bu</i>	Burî
<i>Pêş</i>	Pêşnav
<i>Ta</i>	Taf
<i>Tê</i>	Têper
<i>Têne</i>	Têneper
<i>Te</i>	Temamî
<i>T</i>	Tîyan
<i>Xi</i>	Xistineser
<i>D</i>	Dox
<i>Dî</i>	Dîyarker
<i>Ra</i>	Rastewxo
<i>Rû</i>	Rûkar
<i>Se</i>	Sere
<i>K</i>	Kar
<i>G</i>	Gire
<i>M</i>	Morfem
<i>N</i>	Nav
<i>Niv</i>	Nivş
<i>Ne</i>	Nerastewxe
<i>No</i>	Nomînêtîv
<i>Nîş</i>	Nîşane
<i>Nebu</i>	Neburî
<i>Hev.ci</i>	Hevalkarê cih
<i>Hev.çe</i>	Hevalkarê çawanî
<i>Hev.de</i>	Hevalkarê dem
<i>A</i>	Agent
<i>O</i>	Object
<i>S</i>	Subject

LÎSTA HÊMAYAN

Ø	Morfema sifir
*	Nerêzmanî bûn

BÊJEYÊN HEVWATA

Amraz	Daçek
Arîşe	Pirsgirêk
Çavpêkeftin	Dîdar
Gover	Beşe diylikta "dever"
Dox	Rawe
Hevalnav	Rengdêr
Jêder	Çavkanî
Ko	Kom "gelejimar"
Mê	Mêza
Nêr	Nêrza
Taf	Demê karî (rêzmanî)
Tak	Kit "yekejimar"
Tîyan	Tewang
Sentaks	Hevoksazî
Xistineser	Palvedan "Ravek"

DESTPÊK

NAV Û NÎŞAN Û SÎNORÊN VEKOLÎNÊ

Ev vekolîn bi navê “Rolê Morfemên Nivîşî di Sentaksa Zimanê Kurdî de, Govera Behdînî” e .Sînorê vê vekolînê li ser sentaksa kurdî ye û her du yekeyên sentaksî gire û riste bi xwe ve digire. Bi wata morfemên nivîşî herdû astên morfolocî û sîntaksî bi xove digirt, di morfolocî da ev morfime morfimeka rêzmanîya navî ye û rolên vê morfimê diyarkirna doxane di sîntaksê da.

ARMANCA VEKOLÎNÊ

Armanca vê vekolînê ew e ku em wan rolên morfemên nivîşî di sentaksê de bidin diyarkirin û her weha cureyên morfemên nivîşî li gor doxan diyar bikin. Bikaranîna van morfeman yek ji taybetmendiyên vê diyalektê ye û zimanê vê diyalektê ji ber hebûna morfemên nivîşî ligel gireyan bi zimanekî ergatîvî tê nasîn.

EGERÊ HILBIJARTINA VEKOLÎNÊ

Babetê morfemên nivîşî di govera behdînî de bi şêweyekî giştî berbelav e û ev morfem şêweyên cuda cuda hene û herweha hindêk caran yek şêweyî jî rolên cuda hene. Lewra me bi fer dît vê vekolînê li ser vê mijarê encam bidin û van morfeman destnîşan bikin û rolên wan di gire û sentaksê de xuya bikin. Her çend ev babet di hindêk pirtûk û nameyên akademîk de hatiye behskirin, lê belê weku vekolîneke taybet bi morfemên nivîşî nehatiye encamdan û ev mijar bi şêweyekî nesereke hatiye behskirin mîna nameyên akademîk yên "Segvan Cemîl Mihemed û Silîman Îsma'îl Receb" li gel babetên dî yên sentaksî hatiye xuyakirin.

GIRINGIYA VEKOLÎNÊ

Giringiya vê vekolînê ew e ku bi rolên morfemên nivîşî di sentaksa zimanê kurdî bi taybetî di vê goverê de radibe. Giringîya vê vekolînê ewe ku bikar înanîna morfemên nivîşî ji layê axiftinkerê vê goverê da ji goverên dî yên diyalêkta kirmancîya serî berbelavtîre, eve dibite êk ji taybetmendiyên vê goverê.

RÊBAZA VEKOLÎNÊ

Ev vekolîn li dûv rêbaza pesnê (wesf) û şirovekarî hatiye encamdan û ev xebate xebata qadê û teorîk e.

KERESTEYÊN VEKOLÎNÊ

Bo encamdana vê vekolînê ew nimûneyên hatine berçavkirin ji axaftina rojaneya xelkê û hozan û çîrokên vê goverê hatine wergirtin.

ARIŞA VEKOLÎNÊ

Morfîma nivşî (ê) êk şêweye belê dû nivşên (nêr û mê) û sê doxên (tiyan, xistineser û gazîkirin) diyar diket.

Ev morfîma nivşî pêdiviye di her dû astên zimanî (morfolocî û ssentaksê) de bihête behiskirin, lewra di morfolocî da bi tenê nahête bahiskirin û di sentaksê da bê morfolocî nahête behiskirin.

Ji bilî doxê (êrgatîv û ekuzetîv û tiyan) di gel berkarî û bikerî da rûkarên karî diyardiken û cihê hatna wana bo axiftinkerî û guhdarî bi zehmete

PIŞKÊN VEKOLÎNÊ

Ev vekolîn ji bilî pêşekî û derwaze û encaman ji dû beşan pêk tê:

Beşa yekem ji dû bendan pêk tê:

Bendê yekem ji pênaseya morfemê û cureyên wê.

Bendê duyem ji morfema nivşî û nivşê siruştî û rêzimanî û polînkirin û hêlengandina nivşê siruştî û rêzimanî di karên berê de û nivşên rêzmanî yên bêzayend û her weha peywendiya morfemên nivşî bi elomorfan û morfofonîm û morfofosentaks û morfofonosentaks.

Beşa duyem ji pênc bendan pêk tê:

Bendê yekem ji pênaseya gire û pêkhênên û taybetmendiyên wê û cureyên gire û pêkhênên her gireyekê û bi şêweyekî giştî û cureyên gireyê ji layê pêkhatinê ve hatiye diyarkirin û rolên gireyên navî û pêşnavî û karî diyar dike.

Û bendê duyem ji pênaseya sentaks û riste û doxî pêk tê.

Bendê sêyem behsa rolê morfemên nivşî di gireyê de weku doxê xistineser û diyarker û kopîkirin û rolê morfîma nivşî di sîmordarkirina gireyê pêk tê.

Bendê çwarem ji rolê morfemên nivşî di sentaksê û sîstemên doxî û cureyên doxî û rolê morfemên nivşî di destnîşankirina doxê ergatîv û akuzatîv û tiyan de pêk tê.

Bendê pêncem ji rolê morfemên nivşî di diyarkirina rûkaran û pênaseya wê û destnîşankirina rûkarên berdewamî û tamamî pêk tê.

ÇEMKNASÎ

Ji layê dîrûkê ve

Ji nîva duwê ji çerxê sêzdê navê behdînan hatîye wergirtin ji navê bapîrê xîzana desthelatdar (behaedîn kurê şuca'î) hindek dîrûknas xuya dikin, ku navê devera behdînan ji peyva (beh dînan) hatîye wergirtin û ramana wê (baştirîn ayn) û hindek dibêjin ev nave ji

peyva (bedîn) hatîye wergirtin, ku peyveka sasanîye û ramana wê (aynê bi xweşî û bextewer) û hindek dî dibêjin (behdînan) ji peyva (bax dîn) hatîye wergirtinan, ku baxê aynan e, lewra gelek ayn li devera behdînan hebûn mîna aynê îslamê, mesîhî, cuhyatî (yehudî), êzdyatî. Lê hindek dîruknaşên dî dibêjin navê behdînan gelek kevintire ji boçûnên li serî amaje pêhatîye dan, lewra ji berî aynê îslamê bigehite vê deverê navê vê deverê (hadyabîn) yan (edyabîn) bû.

Ji layê cografî ve

Devera behdînî pêk dihêt ji deverên rojavayê zêyê mezin, yan ku rojhelatê behdînî sinordare bi ruybarê zêyê mezin û li başûrî digehite parêzgeha muslê, li rojavayê sinorê behdînî digehite sinorê wilatê suryê û li bakûrê rojava sinorê behdînî digehite cizîra botan û bakûrê behdînî hevsinore di gel devera hekarî.

Devera behdînî ji van deverdariyan pêkdihêt:

A- deverdariya Duhokê ji van nahiyên pêk dihêt:

1- Duhok 2- Zawîte 3- Mangêş

B- deverdariya Amêdyê ji van nahiyên pêk dihêt:

1- Amêdî 2- Dêrelök 3- Sersing 4- Kanî masî 5- Bamernê 6- Çemankî

C- deverdariya Zaxo ji van nahiyên pêk dihêt:

1- Zaxo 2- Batîfa 3- Derkarê 4- Rizgarî

D- deverdariya Sêmêl ji van nahiyên pêk dihêt:

1- Sêmêl 2- Batêl 3- Feydiyê

E- deverdariya Akrê ji van nahiyên pêk dihêt:

1- Akrê 2- Girdeşîn 3- Bicêl 4- Dînantê

F- deverdariya Şêxan ji van nahiyên pêk dihêt:

1- Şêxan (Îsivnê) 2- Etrûş 3- Qesrok 5- Ba'erdê 6- Zîlkan (Farûq)

G- deverdariya Berdereş ji van nahiyên pêk dihêt:

1- Berdereş 2- Kelek 3- Roviya 4- Daretû

Li devera behdînî gelek huz û 'eşîretên hene mîna:

1- Sindî 2- Gulî 3- Silêvaney 4- Kuçer 5- Duskî 6- Mizurî 7- Berwarî
(jêrî û jûrî) 8- Nihêlî 9- Rêkanî 10- Nêrwey 11- Zêbarî 12- Sûrçî 13- Herkî
14- Barzanî.

Têbînî: nîşneyên "dî = diyarker, se = sere, ta = taf, tê = têper, * = nerêzmanî


..." ev di kurtbêjî û lîsta hêmayan hatiye behis kirin.

1. BEŞA YEKEM
PÊNASEYA MORFEMÊ Û CUREYÊN WÊ

1.1. PÊNASEYA MORFEMÊ

Ziman bi şêweyekî giştî sistemek e ku ji çendîn yasa û destûran pêk tê. Hindek ji van yasayan di navbera zimanan de hevpar in û hindek jî taybet in bi zimanekî diyarkirî ve. Morfem jî yek ji wan mijaran e ku di piraniya zimanên cîhanê de hene û cureyên zimanan li ser cureyên morfeman dabeşî çend cureyan dibin. berî peydabûna hizra morfemê biçûktirîn yekeya morfolojîyê peyv bû. zimannasan hest bi hindê dikir ku bo şirovekirina zimanî bo biçûktirîn yeke ku peyv bû, narawiste lewra hindek yekeyên dî ku ji peyvê biçûktir in, hem rolê dariştina peyvê hem rolê rêzimanî yê peyvê diyar dikin. Ji ber vê çendê zimanvanê emerîkî Bilomfêld darhênerê hizra morfemê di zimanî de bû û "di destpêka salaên çilan de hizra morfime peydabû" (mihemeh me'ruf fetah, 1990: 80) vê mijarê di babetên zimanî de di vekolînên zimannasên qutabxaneyê binyatgeriyê de serî hilda. Morfîm peyveka girîkîye û ji dû pişkan pêkdihêt "morph" bi wataya form û "eme" bi wata yeka cudaker dihêt (Rabirt endirsun hal, 1380: 112).

Morfem bi gelek şêwe û cureyan hatiye pênasekirin û ev pênasekirin her li dûv çiyawaziya vekolîn û karên zanistî yên her vekolerekî yan zimanvanekî li gor qutabxaneyên zimanî yên cuda hene. Em dê hindek ji wan pênasan berçav bikin hemî amurên rêzimanî bo çend daneyên biçûk tên şirovekirin, ku dibêjin morfem (Mihemed Me'ruf Fetah, 1990: 71). Di vê pênaseyê de hatiye diyar kirin ku peyv, gire û riste keresteyên zimanî ne bo çend daneyên biçûktir tên şirovekirin, ku ew dane jî morfem e:



$$\begin{array}{ccc} \text{Çû} = \text{ç} & + & \text{û} \\ \downarrow & & \downarrow \\ \text{Regê.k} & & \text{m.ta.bu} \end{array}$$

Merem ji morfemê, biçûktirîn daneya watedar e ku neşêt biçûktir lê bê bi mercekî wateya wê têk neçe (Ewrehman Hacî Maruf, 2014: 34-35), biwate peyva “ber” ji sê fonîman /bi/, /e/, /r/ pêk tê û dibe morfemek. Ku wate biçûktirîn daneya watedar e. Bo nimûne eger fonîma /r/ jê bê jêbirin (ladan) li vir “be” dimîne û “be” wateyê nade. Ku wate “be” nabe morfem çunkî wateya wê ya bineret têk çûye bi ladana fonîma /r/. Morfem biçûktirîn yekeya watedar yan roldara zimanî ye, ku di rêzkirineke rêkûpêk a yekeyên rêzimanî yên zimanî di pêkhata peyvê de bi kar tê (Îran Kilyasî, 1380:21). Di vê pênaseyê de amaje bi hebûna nîşanên rêzimanî dike ku wan nîşanan rolên taybet di zimanî de bi xwe ve hene. Her weha amaje bi çawaniya rêzbûna van nîşanan ligel peyvê dike:

$$\begin{array}{ccccc} \text{5-Kurd} & + & \text{istan} & + & \text{ê} = \text{Kurdistanê} \\ \downarrow & & \downarrow & & \downarrow \\ \text{n} & \text{paşgirê} & \text{dariştinê} & \text{nîş.rêzimanî} & \end{array}$$

Di nimûneya (5) de diyar dibe ku paşgirê li berî nîşana rêzimanî tê, eger di heman nimûneyê de berî paşgirî hat wateya peyvê hildiweşîne, lewra rêzbûna morfeman hatiye têkdan:

$$\text{6-Kurd} + \text{ê} + \text{stan} = * \text{Kurdêstan}$$

"Morfem birîtiye ji biçûktirîn pirta me'nadara zimanî" (Sadiq Behaeldîn Amêdî, 1987:149). Morfem biçûktirîn daneya watedar a zimanî ye ji fonîmekê yan zêdetir pêk tê û rolek di rêzimanê de heye bi guherîn û jêbirina (labirna) her fonîmekê yan bi parçe parçekirina wê wate û rolê bineretên wê têk diçin (Wirya 'Umir Emîn, 2004:212). Morfem pêkhatî ye ji biçûktirîn parçeya watedar a peyvê (Xisru Xulam 'Elî Zade, 1382: 253). Sadiq Bihaeldîn Amêdî û Wirya 'Umer Emîn û Xisru Xlam 'Elî Zade, van her sê zimannasan diyar kirîne ku morfem bi biçûktirîn yekeya watedar hatiye hijmartin. Sadiq Bihaeldîn Amêdî û Wirya 'Umer Emîn diyar kiriye ku morfem watedara zimanî ye bi şêweyekî giştî, lê belê Sru Xlam 'Elî Zade bi watedara peyvê hijmartîye.

1.1.1. CUREYÊN MORFEMAN

Morfem di zimanî de bi tenê yek cure û şêwe nîne, belku li dûv wateya ferhengî û li dûv cih û rolê wan bi ser çend cureyan de hatiye dabeşkirin. Bi şêweyekî giştî morfem bi ser sê cureyan hatiye parvekirin:

1.1.1.1. Morfema Serbixwe

Ev morfem, di ferhenga zimanî de ramana xwe ya serbixwe heye û dişet bi tenê bê bikaranîn. "Morfîmên serbixu ew morfîmin ji layê form û watayê bi şêweyekê serbixu derdikevin" (Silêman Îsma'îl Receb, 2001: 24). Bo nimûne: çiya, azad, dar...

1.1.1.2. Morfema Nîmçe Serbixwe

Ev morfem, ku ji layê formê ve serbixwe ye, belê ji layê wateyê ve serbixwe nîne weku amrazên peywendiyê "bo, ji, li ..." û lêkdanê "û, yan, belê ..." û gîhandinê "çunkî, ku...".

1.1.1.3. Morfema Bend Cureyên wê

Ew cureyê morfemê, ku bi tenê bi kar nayê û wateya serbixwe nîne, belê ligel morfemeke serbixwe tê bo dariştina peyveke nû û wateyeke nû di ferhengê de dirust dike yan formê peyvê diguhere û rolekî rêzimanî diyar dike, "ew morfîmeye ku çi deman mîna daneyeka serbexo dernakevît û di gel morfîmeka dî derdikevit" (Wirya 'Umer Emîn, 2004: 118). Morfîma bend dibe çend cure:

1- Morfema Bend a Darêştî

Ev cureya morfemê ye ku digel morfemeke serbixwe tê bo dirustkirina peyveke nû. Morfema bend a darêştî bi şêweyekî giştî çend cure ne:

A-Pêşgir

Ev morfem e berî morfema serbixwe tê: heval, bêhêz, bikuj, wergêran, nexoş...

B-Paşgir

Ev morfem e piştî morfema serbixwe tê "ew pirtikin yên bi paşiya xeberan ve dizeliqin û fikra wan diguhêzin" (Qenatê Kurdo, 1990: 57): zêrîn, cutyar, evîndar, asinger, bêrîvan...

P-Navbend

Ew morfem e dikeve navbera morfemên serbixwe "ew morfîmin dikevîne navbera morfîmên dîtir û erkê dariştinê dibînin" (Silêman Îsma'îl Receb, 2001: 29): dul û dul, kêleşîn, seranser, dar û ber...

2- Morfema Bend a Regî

Regê her karekî morfema bend e: çi, kuj, be, hê, fir...

3- Morfema Bend a Yekane

Ev morfem e xwediye formeke serbixwe ye û bi tenê bi kar nayê û tenha digel yek morfema serbixwe pişkdariyê di dariştina wateyeke nû de dike:

belaş û 'elas, dar û bar, xîç û mîç...

4- Morfema Bend a Binkeyî

Ev morfem e hilgirê wateya sereke ya peyvê ye, belê bi tenê ramanê nade. (Nazenîn Celal Ehmed, 2004: 82): fêrkirin, wazhênan, niqumbûn, handan ..

5- Morfema Bend a Xweyî

Ev morfem bi tenê cihnavê xweyî bi xwe ve digire û tenê watayê nade:

xweparastin, xweragirtin, xwefiroş...

6- Morfema Bend a Rêzimanî

Ew morfem in yên di biyavê gire û risteyan de kar dikin, peywendiyê di navbera peyvekê û beşên dîtir ên risteyê de xuya dikin û rolekî rêzimanî dibînin û şêweyên cuda cuda yên rêzimanî pêk tînin. Anku li pey rolî hatine binavkirin (Segvan Cemîl Mihemed, 2008: 17). Her weha haletê rêzimanî yê peyvê xuya dikit (From Kin, V, 1988 : 63). morfema rêzimanî bi navê morfema sentaksî jî bi kar tê, lewra peywendiyên peyvê di çarçoveya gire û risteyê de diyar dike (Şêrku Heme Emîn Qadir, 2002: 33). Ku wate morfema benda rêzimanî formê peyvê diguherîne û peywendiyên rêzimanî yên peyvê diyar dike. Belê wateya peyvê naguhere û nabe egerê peydabûna wateyê nû di zimanî de. Morfemên rêzimanî ji layê jimarê ve ji morfemên (serbixwe û bendiyên dariştinê) kêmtir in û her pişkeka axaftinê (nav, hevalnav, kar) her yekê ji wan morfemên taybet bi xwe ve hene. Morfemên bendên rêzimanî yên navî (nasyarî, nenasyarî, kum, nivîş) ne:

7-Kureke



m.nasîne

8-kuryêk



m.nenasîne

9-kuran



m.kumê (pirjimar)

10- kurê te



m.niv

Morfemên bendên rêzimanî yên hevalnavî (tir, tirîn) ev her du morfem ligel hevalnavê çawayî pileyên hevberkirî û bala nîşan dide:

11-Zîrektir



m. Pileya hevberkirinê

12-zîrektirîn



m.Pileya bala

Morfemên bendên rêzimanî yên karî (taf, rêje, nerê, rûkar):

13-Xwand



m.Ta.bu

14-dixwînim



m.Ta.niho

15-dê xwînim



m.ta.dihêt

16- bixwînim



M.Rêjeya mercy.ta.dihêt

17-xwandiba



m.Rêjeya mercî.ta.bu

18-xwandibît



m.Rêjeya mercî.ta.bu

19-Bixwîne



M.Rêjeya fermanî.ta.dihêt

20-Nexwînim



M.Nerê rêjeya mercî.ta.dihêt

21-naxwînim



m.Nerê rêjeya ragehandinê. Ta.dihêt

22-Nexwanid



M.Nerê rêjeya ragehandin.ta.bu

23- dixwand



M.rû.berdewam

24-xwandîn e



m.rû.te

25-xwandbû



m.rû.dûr

Her pişkeke axaftinê (nav, hevalnav, kar) morfemên rêzimanî yên taybet bi xwe ve hene û bikaranîna wan ligel heman pişka axaftinê zor in, bo nimûne morfema nerêkirinê ligel hemî cureyên karan bi kar tê. Belê morfemên dariştinê ligel hindêk karan tê:

26-ragehandin

27- *ramirin

1.2. Morfemên Nivşî

Ev morfem ligel navî bi kar tê û cureyê nivşê navî (nêr, mê) xuya dike û bo her nivşekî morfemeke taybet di zimanê kurdî de heye. Yek ji cureyên morfemên bendên rêzimanî "(sentaksî" ye, li gor cih û hatina wê di gire û risteyê de tê guherîn:

28- 'alema ji ber te ketî qehir û xemê

Ez bixo xeriqîm di behra elemê (Ehmedê Nalbend, 1998: 11)



M.niv.mê.d.xi

29-Stêrê romanek xwand.



M.niv.mê.d.ti

30-Ew stêra he



M.niv.mê.d.am

Ev morfem ji layê jimarê ve tak e û ew navê ligel tê bi navekî tak tê nasîn. Her weha morfemên nivîşî derbirînê ji nasyariyê jî dikin, bi taybetî eger di navbera du navan yan navekî û hevalnavekê de bîn:

31-Pirjîna çinarê

32-Pirjîna zîrek

Di nimûneyên (31), (32) de navê “pirjîn” bi rêya navê “çinar” û hevalnavê “zîrek” pitir tê nasîn ka merem jê “pirjîna çinarê” ye, nek “pirjîna azadî” ye, her weha digel hevalnavî jî bi heman awayî. ev morfem bi rolekî berçav di sentaksa zimanê kurdî de heye û rolê vê morfemê di beşa sêyem de bi têrûteselî tê behskirin.

1.2.1. Nivîşê Siruştî û Rêzimanî

Peyva nivîşî di zimanî de axêver bi kar tîne û yek ji wan têgehan e bo diyarkirin û pênasekirinê. Bi şeweyekî giştî çend girîftên rêzimanî û lojîkî tên pêş. Bi taybetî di rêzimana kevin de, têkelkirina şewê û wateyê dibe yek ji van girîftan. Gelek rêzimannivîsên kevin bizavkirine wê ciyawazîya hestpêkera di navbera nêr û mê de di cîhana ji derve de diyar bikin (Mihemed Rezayî Batîni, 1993: 33).

Nivîşê siruştî: Ew nivîş e ku peywendî bi pêkhata biyolojîk a giyandaran ve girêdayî ye ku ji aliyê nivîşî ve nêr e yan jî mê ye. nivîşê rêzimanî zaravayê zimanî “gender” ji peyva latîni ya “genus” hatiye bi wateya cure yan resen tê, ku di zimanî de bi wateya polînkirina nav û cihnavan li gor hebûn yan nebûna nivîşî tê û ev nivîş jimar û doxê navî diyar dike (Hikimet Yunis Mihemed, 2007: 35). Nivîş diyardeyeke zimanvanî ye tu peywendîya wî bi wateya navî yan nivîşê biyolojîk (siruştî) ve nîne. Ku wate ji layê lojîkî ve (mentiqî) serbixwe ye (Lyonis, 1968:284). Peywendî di navbera nivîşê rêzimanî yan zimanî û nivîşê siruştî wek peywendîya di navbera tafê (demê rêziman) û demê siruştî (ew demê mrov têde dijî) ye (Quirk, Ri . Et At 1972 :187).

Ji layê lojîkî ve nivîş ewan giyandaran vedgire ku xwedan nivîşê siruştî ne. Ku wate dizên û vedizên, belê di zimanî de li dûv nîşanên rêzimanî yê taybet bi wî nivîşî ve nav ji layê nivîşî ve tê destnîşankirin:

1- Kiç, jin, bûk, xwesî, mirîşk ... ji layê lojîkî ve nivîşê mê ne.

2- “Pirça wî” morfema “a” di zimanê kurdî de bo nivîşê mê ligel navî tê. Ji ber hindê navê “pirç”ê dibe navê mê. Lewra di zimanî de du cureyên nivîşî hene: nivîşê siruştî/xwezayî û nivîşê rêzimanî. “Nivîş di zimanên îranî yê kevin (avesta û farsiya kevin) de hebû û sistemeke tam û rêk û pêk di morfolojiyê de diyar bû. Belê ligel borîna demî ev diyarde di hindêk zimanan de ji nav çû” (Ewrehman Hacî Maruf,

2014: 174). Belê di zimanê kurdî de bi taybetî diyalekta kirmancî ya serî û pişkek ji diyalekta kirmancî ya xwarê ev diyardeya zimanî hatiye parastin û heta niha jî bi kar tê. bi şeweyekî giştî nav di zimanî de li ser binemayê nivşê rêzimanî bi alîkariya morfemên nivşî (nêr û mê) tên dabeşkirin bêyî ku nivşê siruştî yê wan navan bê berçavgirtin. Morfemên nivşî yek ji morfemên bendên rêzimanî ne ku ligel navî tên. Berî ku em behsa vê mijarê bikin, pêdivî ye em bizanin ka nivş bi şeweyekî giştî çi ye? Çend cureyên nivşan hene û ciyawazî di navbera wan de çi ye?

Yek ji taybetmendiyên diyalekta kirmanciya serî hebûna nivşê rêzimanî ye ku ev diyarde bi rêya hindê morfemên rêzimanî yên navî diyar dibin û ev morfem ligel nav û cihnavan bi kar tê. hebûna morfemên nivşî di zimanî de mijdariya nivşê siruştî bo wan navên ku bo her du nivşan (nêr, mê) bi kar tê, mijdariyê nahêle bo nimûne di zimanê kurdî de “zarok” yek ji wan navan e ku ji layê nivşê siruştî ve duzayend e. Hem bo nivşê nêr û hem bo nivşê mê bi kar tê. Belê diyarkirina nivşê vê peyvê li dûv hatina morfema nivşî dimîne. Eger morfema nivşî mê wergire navê zarok amaje bi zarokeke nivşê mê dike, bo nivşê nêr jî bi heman şeweyî:

33-Zarok ê/ a min

(ê) ev morfema rêzimanî nivşê navê nêr diyar dike. Ku wate nivşê zarokî nêr e.

(a) ev morfema rêzimanî nivşê navê mê diyar dike. Ku wate nivşê zarokê mê ye.

34- Ewê nivîser dît.

35- Ewî nivîser dît.

Ewê/ewî di nimûneyên (34), (35) de morfema (ê, î) nivşê cihnavî diyar dike ka nêr e yan jî mê ye. Di zimanê kurdî de hatina morfema nivşê nêr û mê amaje bi navî ji layê jimarê ve bi takîyê dike ku peywendiyê rêzimanî di navbera wan de peyda dike ku dibêjin rêkkeftin. Morfemên nivşî ji bilî diyarkirina nivşî, jimareya navî ji layê takîyê ve diyar dikin. “Rêkkeftin ew peywendî ye ku di navbera du amurên rêzimanî de ye eger yek ji wan taybetmendiyeke yan sîmayekî diyarkirî hebe divê di navbera keresteyên dî de jî hebe” (Quirk, Ri . Et At. 1972: 359):

36- Hevalê baş

Di nimûneya (36) de rêkkeftin di navbera wan de ji layê jimarê û nivşî ve ye ku amaje bi “yek hevalî” û ji layê nivşî ve amajê bi nivşê “nêr” dike. Her weha hebûna morfema rêzimanî (ê) jî amaje bi van her du taybetmendiyên rêzimanî dike: (ê) morfema rêzimanî ya navî ye, ji layê nivşî ve bo nivşê nêr bi kar tê û ji layê jimarê ve takîyê nîşan dide û navê “heval” jî bi heman şeweyî. Morfema (ê) hem nivş û

jimare heye, ev peywendiya rêzimanî bi rêya rêkeftina di navbera morfema nivşî û ew navê ku ligel tê û diyar dibe.

37-hevalên baş

Di nimûneya (37) de morfema nivşê nêr û mê nehatiye belku morfema komê (ên) hatiye lewra navê “heval” amaje bi jimareyekê pirtir ji yekê dike û nivşê navê “heval” jî diyar nake. morfemên rêzimanî yên nivşê doxê navî jî di zimanî de diyar dikin. Di zimanê kurdî de ev morfem çend doxan di ristê de dibîne. Di vê vekolînê da beşa sêyem bo van doxan hatiye terxankirin.

1.2.2. Cureyên Nivşî di Zimanê Kurdî de

1.2.2.1. Nivşê Siruştî û Cureyên Wî

Zimanê kurdî yek ji wan zimanan e ku xwedî nivşê siruştî û rêzimanî ye. Erê ev her du cureyên nivşî hev digirin û ji layê hebûnê ve wekhev in? Bo bersivdana van pirsan bi şêweyekî giştî em dê boçûnên rêzimannivîsan li ser diyalekta kurmanciya serî wergirin û hilsengînin.

Nivş bi şêweyekî giştî di hindêk zimanan da heye û di hindêk zimanan de nîne yan jî di demên kevin de di wan zimanan de jî hebû belê niha ji dest dayî ne ji ber egerê guherîna sîstemê zimanî yan jî ji ber egerên civakî, rewşenbîrî û siyasî.

Nivş di zimanên hînt-ewrupî de bi du sîsteman kar dikin:

1-Sîstemê du nivşî: Nav di van zimanan de yan nêr e yan mê ye. Wek zimanê frensî, spanî, îtalî û kurdî (govera Behdînî).

2-Sîstemê sê nivşî: Di van zimanan de nav yan nêr e yan mê ye yan bê layen e. Wek zimanê rûsî, elmanî û îngilîzîya kevin û nû (Hikmet Yunis Mihemed, 2007: 37).

Eger em nivşê siruştî yê navî ji layê zayendê ve wergirin dibe navê mê, nêr, dulayen, bêlayen. Navê mê, ew cureyê navî ye ku di bineret de bo nivşê mê ji layê axêverê kurd ve tê bikaranîn. Navê nêr, ew cureyê navî ye ku di bineret de bo nivşê nêr ji layê axêverê kurd ve tê bikaranîn. Ev her du cureyên navî di ferhenga zimanê axêverê kurd de heye. Bo axêverî û guhdarî bê mijdar in û bê girîft in.

Navê duzayend, ew nav e ku bo her du nivşan (nêr, mê) bi kar tê, bo pitir têgihîştin û zelalbûna mijdariya nivşî li gor ew dewrûberê axivtinker û guhdar li ser diaxivin, dizanin ku ew navê duzayend yan nêr e yan mê ye, morfema nivşî ya taybet ya wî nivşî ligel tê:

38-Mamosteyê babetî

39-Mamosteya babetî

Ku wate ev cure nav di ferhenga zimanê kurdî de hilgirên sîmayên her du nivşan in. Ev her sê cureyên navan bo xwedî giyanan (giyandaran) di zimanê kurdî de bi kar tê.

Navê bêzayend, ew cureyê navî ye ku ji layê nivşî ve bêlayan e û di zimanê kurdî de bo navên bêgiyan bi kar tê û bo diyarkirina nivşê navê bêlayan bi hatina morfemên nivşî pişt dibestin.

1.2.2.1.1. Polînkirina Nivşê Siruştî di Karên Berê de

(Ciger Xwîn, 1961: 25)

Cureyên nivşî	Nimûne
1-nêr	Mêr, beran, hesp
2-mê	Jin, bizin, mehîn
3-nêr û mê	Hirç, şêr, kevok

(Qenatê Kurdo, 1981: 35-42)

Cureyên nivşî	Nimûne
Nav ji layê sroştî ve sê cure ne	
1-navên ruhber:	
A- navên cinsê mê (zayenda mê)	
navên ser heywanan	Bizin, mirîşk, çêlek...
navên ser meriyan	Jin, bûk, dayik...
navên jinan	Xezal, rihan, perîşan...
B- navên cinsê nêr (zayenda nêr)	
navên ser heywanan	Nêrî, beran, ga...
navên ser meriyan	mêr, kur, xort...
navên mêran	keleş, silo, ferman...
2- navên tiştên neruhber:	
navên tiştên neruhber yê cinsê	defter, kitêb, qelem...
mê	
navên tiştên neruhber yê cinsê	kon, nan, xanî...
nêr	
3- navên heinyê yê du cinsî	
Mê	hevala min seyrane
Nêr	hevalê min dixîne

(Sadiq Behaeldîn Amêdî, 1987: 158)

Cureyên nivîşî	Nimûne
Nav ji layê zayendê:	
1-navê nêr	Nêrî, serdar
2-navê mê	Bizin, sînem, mêkew
3-navê nêtral (duzayend)	Dust, heval

(Mihemed Tahir Guherzî, 1999: 62-65)

Cureyên nivîşî	Nimûne
1-nêr	
A-navê nêr yê rast û dirust	Mêr, nêrî, beran
B-navê nêr yê nedirust	Gopal, xanî, text
2-mê	
A-navê mê yê rast û dirust	Jin, bizin, mahîn
B-navê mê yê nedirust	Av, stêr, pirtûk
3-navê hevbeş	Mîrov, hirç, hêstir

(Celadet Alî Bedir-Xan, 2002: 52-53)

Cureyên nivîşî	Nimûne
A- zayend di zimanê kurdmancî de du zayend hene:	
1-zayedê nêr:	
navên mirovan	Cemşîd, xurşîd...
navên heywanên nêr	Nêrî, ga, beran...
navên tiştine nerihber yên nêr	Xanî, gir, derî...
2- zayedê mê:	
navên mirovan	Sînemxan, jin, pîr...
navên heywanên mê	Meh, çêlek, bizin...
navên tiştine nerihber yên mê	Dar, tîfing, gol...
B- navên heyberên rihber:	
navên heyberên rihber yên nêr	Bira, pismam, kur, kewê nêr, nêreker...
navên heyberên rihber yên mê	Xweh, dotmam, keç, kewa mê, maker...

Fazil 'Umer, 2004: 107)

Cureyên nivşî	Nimûne
Nav ji layê sroştî ve çar cure ne	
1-mê	
A-sernavên mê yê mirovan	Zîn, Şîrîn, Sînem
B-sernavên nivşê mê bi giştî	Kiç, jinik, bizin, mîh
P-peyvên mêkrî bi çi terzê hebin	Mêkew, dotmam, jinmam, dêhle
	gurg
2-nêr	
A-sernavên mê yê mirovan	Mem, Çeto, Rustem
B-sernavên nivşê mê bi giştî	Kur, mêt, beran, dîkil
P-peyvên nêkrî bi çi terzê hebin	Nêrekew, şivan, rezvan, kurmet
3-du alî an duzayend	Hirç, rûvî, pişîk
	Ker: nêreker û maker
4-bê nivş	Navên manayî, keresteyî, navê
	karî (jêder)

(Deham Ebdulfettah, 2006: 18-19)

Cureyên nivşî	Nimûne
Nav ji hêla zayendê (nêr û mê) jî	
du beşên sereke ne	
1-navên rasteza: sê beş in	
A-navên nêrza (nêr)	Mêt, kur, ap, azad
B-navên mêza (mê)	Jin, keç, met, zîn
P-navên duzayend (dulayen)	Dust, heval, mamoste, şagirt
2-navên nerasteza: du beş in	
a-nêr	Xanî, dergeh, çîya, çem
b-mê	Baran, av, gul, roj

(Îbrahîm Remezan Zaxuîy, 2008: 46-49)

Cureyên nivşî	Nimûne
Duzayend hene: nêr û mê	
1-navên mirovan	
A-navên nêr	Çeto, Salar, Azad
B-navên mê	Gulê, Sînem, Narîn
P-navên nêr û mê	Heval, pizîşk, mamhosta Hevalê min mamhostayê law Hevala min mamhostaya ciwan
2-navên caneweran	
A-navên nêr	Hesp, ga, dîkil, ker
B-navên mê	Mehîn, çêl, mirîşk, maker
P-navên nêr û mê	Gurg, hirç, kêvrîşk Mê (mê gurg, mê hirç, mê kew) Nêr (kitikê nêr, pşîkê nêr)

1.2.2.1.2.Hilsengandina Polînkirina Nivşê Siruştî di Karên Berê

de

Di babetê hilsengandinê de emê giringiyê bi bikaranîna zaravan û cureyên nivşî bidin.

Nivşê siruştî

Ji Layê Zaravê ve

1-Navê nêr û mê

Zaravê “nêr, mê” ji layê Cegerxwîn, Qenatê Kurdo, Celadet Alî Bedir-Xan, Sadiq Bihaeldîn Amêdî, Îbrahîm Remezan Zaxuyî, Mihemed Tahir Guherzî, Fazil ‘Umerî bi kar hatiye.

2-Navê duzayend

Zaravên “nêr û mê” ji layê Cegerxwîn, Îbrahîm Remezan Zaxuyî ve bi kar hatiye, Mihemed Tahir Guherzî zaravê “hevbeş” bi kar aniye, Sadiq Bihaeldîn Amêdî ligel zaravê “neutral”, “duzayend”, Fazil ‘Umerî jî ligel zaravê “dualî” “duzayend”, Deham Ebdulfettah bi tenê zaravê “duzayend”, Qenatê Kurdo "navên heinyê yê du cinsî" bi kar aniyne.

3-Navê bêzayend

Deham Ebdulfettah zaravê “nerasteza”, Fazil ‘Umerî zaravê “bê nivş” û Mihemed Tahir Guherzî zaravê “navê nêr yê nedirust” û “navê mê yê nedirust” û Celadet Alî Bedir-Xan û Qenatê Kurdo zaravê "navên tiştine nerihber yên nêr û mê" bi kar aniyne.

4-Cure

Nivşê siruştî bi şêweyekî giştî rêzimanivîsan Cegerxwîn, Sadiq Bihaeldîn Amêdî, Îbrahîm Remezani Zaxuyî kirine sê cure: nêr, mê, duzayend. Qenatê Kurdo: nivşê siruştî kirine sê cure: navên ruhber û navên tiştên neruhberên û heynê yên du cinsî, Celadet Alî Bedir-Xan kiriye dû cure: zayendê (nêr û mê) û navên heyberên rihber yên (nêr û mê), Deham Ebdulfettah ji layê nivşê rêzimanî ve du cureyên nivşî (nêr, mê) diyar kirine û ji layê nivşê siruştî ve Deham Ebdulfettahî ji bilî ew her du cureyên nivşê (nêr, mê), nivşekî dî jî diyar kiriye. Ew jî navê “duzayend” e, Mihemed Tahir Guherzî sê cureyên nivşî (nêr, mê, hevbeş) diyar kirine û Fazil ‘Umerî jî çar cureyên nivşê navî diyar kirine.

1.2.2.2. Nivşê Rêzimanî û Cureyên Wî

Nivşê rêzimanî: Ev nivş di zimanê kurdî de, li gor hebûna du cureyên morfemên nivşî, du cureyên nivşî hene, ew jî nivşê nêr û mê ne.

Nivşê rêzimanî yê mê: Ew cureyê nivşî ye ku peywendî bi rêzimanê ve heye, lewra ev nivş bi rêya morfemên rêzimanî yên taybet bi nivşê mê ve diyar dibe. Ev nivş ligel nivşê siruştî yê navê mê, duzayend, bêzayend bi kar tê:

40-Keça min

Keç: Nivşê siruştî yê mê ye.

a: Nivşê rêzimanî yê mê ye.

41-Mamosteya min

Mamoste: Nivşê siruştî yê dulayen e.

ya: Nivşê rêzimanî yê mê ye.

42-Pirtûka min

Pirtûk: Nivşê siruştî yê bêlayan e.

a: Nivşê rêzimanî yê mê ye.

Nivşê rêzimanî yê nêr: Ev cureyê nivşî ye ku peywendî bi wî nivşî ve heye, ku bi rêya rêzimanî (morfemên nêr) diyar dibe. Ev nivş ligel nivşê siruştî yê navê nêr, duzayend, bêzayend bi kar tê:

43-Birayê min

Bira: Nivşê siruştî yê nêr e.

yê: Nivşê rêzimanî yê nêr e.

44-Mamosteyê min

Mamoste: Nivşê siruştî yê duzayend e.

yê: Nivşê rêzimanî yê nêr e.

45-Pênûsê min

Pênûs: Nivşê siruştî yê bêzayend e.

ê: Nivşê rêzimanî yê nêr e.

Ji layê rêzimanê ve nav bi şêweyekî giştî yan nêr e yan mê ye. Lewra ji bilî morfemên van her du nivşan (nêr, mê) tu morfemên nivşî yên dî di zimanê kurdî de nînin. Ku wate nivşê rêzimanî du nivş hene.

Di encama vê ronvekirinê û xistinerûya vê mijarê de bo me xuya bû ku ev her du cureyên nivşî (siruştî û rêzimanî) ji layê hebûnê ve (nêr, mê) hevdu nagirin. Lewra nivşê rêzimanî yê nêr hem bo navê nêr, duzayend, bêzayend bi kar tê û nivşê rêzimanî yê mê jî bi heman awayî serederiyê ligel nivşê siruştî dike. Lewra ev hevdunegirtin jî kartêkirinê li ser jimareya cureyên nivşê siruştî, rêzimanî dikin. Ku wate nav ji layê nivşê siruştî ve çar cure ne: nêr, mê, duzayend, bêzayend û ji layê nivşê rêzimanî ve du cure ne: nêr, mê.

1.2.2.2.1. Polînkirina Nivşê Rêzimanî di Karên Berê de

(Sadiq Behaeldîn Amêdî, 1987: 166-171)

Nivşê rêzimanî	Nimûne
Alavê palivdanê Ê, yê A, ya Di kirina derbaza burî de Î Ê Cihnavê pêgehê nêr û mê ya yekînî Ê a	Rezê berî, xanî – <u>yê</u> min Difnê hişyarî, serbestî <u>ya</u> miletî darxaze. Serwer – <u>î</u> zevî avda. Gul – <u>ê</u> teşî rist. Ew rezê <u>ku</u> te kolayî rezê me ye. Ew zevî <u>a</u> ku te daçandî ya serwerî ye.

Alavê gazîkrinê O Ê	Kuro te haj xu bî, lawo xwîna te germ e! Dayê xu bes biwestîne, gidyanê te bo çî pez nedot!
-------------------------------	--

(Mihemed Tahir Guherzî, 1999: 38-40, 156-157, 162-163)

Nivşê rêzimanî	Nimûne
Alavên pênas Ê A	Ehmedê xanî serwrê peyva kurdî ye. Meyan keça Memu ye.
Alavên bangkirinê A, o Ê Nîşaên nasînê Î Ê	Şivana, şivano Kiçê Samanî gitar nivîsî. Şirînê gul av da.

(Celadet Alî Bedir-Xan, 2002: 53, 57, 62, 71, 82)

Nivşê rêzmanî	Nimûne
Tewanga navdêran (Ê) bo mê (Î) bo nêr Veqedandekên binavkirî (A) bo mê (Ê) bo nêr Zayendê pronavan Pronavên mê Pronavên nêr	Ez mehîne dibînim. Ez hespî dibînim. Mehîna cemşîd, newala kûr. Hespê soro, çîyayê bilind. Wê got. Wî got.

(Fazil 'Umer, 2004: 108, 110-114)

Nivşê rêzimanî	Nimûne
Nîşana palvedanê Ê, yê, -ê A, ya, -a	Pirtûka min zêrîn e, cîwanîya welatî dilveker e.
Nîşana nivşî û hejmarî Î Ê	Azadî nan xwar, welatî du derya hene, ez çûme bazarî Sînemê kirasek kirî, pirtûkê sê berg hebûn, tu çûye dihokê
Nîşanên gazîkirinê o ê	Kuro! Zû were! Kiçê! Were ma!

(Deham Ebdulfettah, 2006: 56-58)

Nivşê rêzimanî	Nimûne
Navê duzayend bi van rêyan ji hev tên cudakrin: Zêderên (veqetandekên) nêrza û mêza Ê A Nîşandekên verêşê (tewangê) Î Ê Paşgirên bangewazîyê O Ê	Ev pirtûka hevalê te ye. Dosta te rastgo ye. Ev pirtûka vî hevalî ye. Ev pênuşa hevalekê ye. Delalo, tu her tiştî dizanî. Delalê, were male!

(Îbrahîm Remezan Zaxuîy, 2008: 190, 25-30)

Nivşê rêzimanî	Nimûne
a-bang ê	Daykê

o	Kuro
B-amraz şeş kar	Hespê azadî, mihîna a bijarî
1-bo nêr û mêyan	Seyê wî, dapîra a wan
2-bo xoyetîyê	Dergehê xanî, mîha a şermînê
3-bo palivdarîyê	Te gayê reş krî, min çêla a qelew
4-bo nîyasê	krî
5-bo parsitên gehandinî	Tu yî, yê nan xwarî. Ew bû ya şîr vexwarî.
6-cihê (ewê he, ewa he) digire	Ev çîl qelew e û ewa he(ya he) lawaz e.
P-amrazê nîyasê	Ev hesp yê min e û ewê he (yê he) , yê te ye.
1-demê borî ligel pîşkên têper	Hespî ka xwar, mehînê gîya xwar.
2-demê niha û bêl ligel pîşkên têperî	Mehîn gyayî dixwe, hesp kayê dixwe.
3-demê niha, borî û bêl ligel pîşkên têneper	Hesp hat ser afrî.
4-nîyas di guhorîna pîtan da	Nizar çû bo aşî – nizar çû bo êş. ⁽¹⁾
5-nîyas û amrazên şeş karî	Serê mezin
5-1-navbera navekê û pesna wî	Ya pêncê
5-2-pêşya pesnek jimarî	Ya dî , ya din
5-3-pêşya (dî, din)	
6-navên tixmî yên rût	

1.2.2.2.2. Hilsengandina Polînkirina Nivşê Rêzimanî di Karên

Berê de

Hilsengandin ji Hêla Doxê Xistineser ve

A) Ji layê Zaravê ve

Îbrahîm Remezan Zaxuyî zaravê “amrazê şeş karî, Fazil ‘Umer zaravê “nîşana

⁽¹⁾(aş, êş) ev her du peyv yek wateyê digihînin û dibin elomorfên fonolociyê. Ku wate guherîna elofona (a) bo (ê) ev cure babetê morfemên nivşî bi xwe ve nagire û nivîser ketiye şaşiyê.

palvedanê”, Mihemed Tahir Guherzî zaravê “alavê pênas”, Deham Ebdulfettah zaravê “zêderên veqetandekên nêrza û mêza”, Sadiq Bihaeldîn Amêdî zaravê “alavê palvedanê û Celadet Alî Bedir-Xan zaravê "veqedandekên binavkirî" bi kar anîne.

B) Cureyên Xistineser

Mihemed Tahir Guherzî, Fazil ‘Umer, Deham Ebdulfettah, Celadet Alî Bedir-Xan bi tenê yek cureyê xistineser diyar kirine. Sadiq Bihaeldîn Amêdî du cureyên xistineser diyar kirine “palvedan, cihnavê pêgehê nêr û mê ya yekînî”, Îbrahîm Remezan Zaxuyî şeş cureyên xistineser diyar kirine ew jî “bo nêr û mê, xweyetî, palvederî, nîyasê, parsitên gihandinê, cihê (ewê he, ewa he)” digire. Îbrahîm Remezan Zaxuyî, ku ji bilî rolê sereke yê morfemên nivîşî xistineser e, belê di prosa xistineser da çend babetên dî weku diyarkirina nivîşî, xoyetî, nasînê û gehandina paristeyê bi şaristeyê ve di rista aloz de hene.⁽²⁾

Hilsengandin ji Hêla Doxê Tiyan ve

A) Ji Layê Zaravê ve

Celadet Alî Bedir-Xan zaravê "tewang" û "zayendê pronavan", Îbrahîm Remezan Zaxuyî zaravê “amrazê nîyasê”¹, Mihemed Tahir Guherzî zaravê “nîşana nasînê”, Fazil ‘Umer zaravê “nîşana nivîşî û hijmarê”, Deham Ebdulfettah zaravê “nîşandekên verêse (tewangê)”, Sadiq Bihaeldîn Amêdî zaravê “di kirina derbaza borî de” bi kar anîne.

B) Cureyên Tiyan

Celadet Alî Bedir-Xan dû cure diyar kiriye, Îbrahîm Remezan Zaxuyî pênc (5) cure diyar kirine. Nîşana doxê tiyan li dumahiya bikerî digel karê borî yê têper û nîşana doxê tiyan li dumahiya berkar di tafê niha û bê de. Her weha nîşana doxê tiyan li dumahiya girêya pêşnavî, (Fazil ‘Umer) hatina nîşana doxê tiyan li dumahiya girêyên navî û gireyên pêşnavî (piştî daçekan û piştî karê livîn), (Sadiq Bihaeldîn Amêdî) bikaranîna morfemên nivîşî bo doxê tiyan digel girêya navî ya karê borî yê

² Her weku Îbrahîm Remezan Zaxuyî digel doxê xistineser jî cureyên wê diyar kiriye, ku yek ji wan erkên morfemên nivîşî di vî doxî de bo nasînê bi kar anîye. Ku wate nivîser ketiye şaşiyê di bikaranîna vî navî digel doxê xistineser û tiyan de.

têper bi kar aniye, ” Mihemd Tahir Guherzî bo nasîna navê taybetî digel karê borî yê têper morfemên nivîşî bi şaşî ve bo doxê tiyan bi kar aniye.

Hilsengandin ji Hêla Doxê Gazîkirinê

A) Ji Layê Zaravê ve

Îbrahîm Remezan Zaxuyî zaravê “bang” bi kar aniye û her weha Fazil ‘Umer, Sadiq Bihaealdîn Amêdî zaravê “nîşanên gazîkirinê û alavê gazîkirinê” bi kar aniye û Deham Ebdulfettah zaravê “bangewazîyê” û Mihemed Tahir Guherzî zaravê “alavên bangkirinê” bi kar aniye.

B) Cureyên Gazîkirinê

Hemî rêzimanivîsan doxê gazîkirinê bo takê nêr û mê wek hev behs kirine bi tenê Mihemed Tahir Guherzî alavê gazîkirinê bo nêr nîşana (a) bi şaşî bi kar aniye.

1.2.3. Nivîşên Rêzimanî yê Navên Bêzayend di Zimanê

Kurdî de

1.2.3.1. Nivîşê nêr

Ev nivîşên nêr bi çavpêkeftin me berhevkeriye

- 1- Navên rûbar, çem, oqyanus...
- 2- Pêdiviyên xwendekaran (pênûs, hubir, qelem, çante...)
- 3- Navê diyardeyên asmanî (ba, esman, erd, hureba...)
- 4- Bajar, gund, xanî, dergêh, dîwar, şehir, bakur, başûr, rojhelat, rojava ...
- 5- Cihên bilind li ser rûyê erdê (çiya, zinar, bîstan, beroj, nizar, pesar, ...)
- 6- Libas (qemîs, kiras, şal û şapik, bêcame, kulav...)
- 7- Amûrên cotyariyê (bivir, tefşî, çekoç, qasme...)
- 8- Navên darên hişk nêr in.
- 9- Keresteyên xwarin û vexwarinê (çetel, kevçik, tirmiz, tîrar, klas...)
- 10- Endamên laşê mirovî (dev, didan, çav, ezman, stu, guh, sîng, dest, pê, dil...)
- 11- Navên rengan hemî nêr in (şîn, kesk, spî...)

Ev nivşên nêr bi jêderan me vegohastiye:

1- Ji cihên nizim ((gelî)) – derbend – nêr e)) (Sadiq Behaeldîn Amêdî, 1987: 177).

2- Çekên şerî (tîrukvan, gurz, zirî, kunzî) (Sadiq Behaeldîn Amêdî, 1987: 177).

1.2.3.2. Nivşê mê

Ev nivşên mê bi çavpêkeftin me berhevkiyê:

- 1- Navên karî (jêder) hemî mê ne (hatin, kirin, xwastin...).
- 2- Navên welatan (Turkya, 'Êraq, Îran...)
- 3- Navên bajar û gundan (Duhok, Zaxo, Mêrdîn, Şeraniş...)
- 4- Navên rojên hefteyê û meh û sal (şemî, çarşem, bihar, nîsan...)
- 5- Darên şîn hemî mê ne.
- 6- Libas (dersuk, gore, şîtik, pêlav, şal, kemer, kalik...)
- 7- Tiştên bi karebê (ceryan) kar dikin mê ne.
- 8- Pêdiviyên xwendekaran (pirtûk, jêbir, tebeşîr, defter, textereş, pol, pirtûkxane, mêz ...)
- 9- Heyv, tav, stêr, derya, hesare, av, befir, baran, terg, mij, xunav, zerya, co ... mê ne.
- 10- Hemî navên wateyî mê ne (hevalînî, bilindî, dostînî, merdayetî...)
- 11- Navmalî (kursî, betanî, lihêf, mehfûr...) mê ne.
- 12- Amûrên cotyariyê (şalok, meqes, das, qeynax, mer...)
- 13- Endamên laşê mirovî (pirç, tibil, neynok, mêlak, pişt, difin...)
- 14- Navê keresteyên xwarin û vexwarnê (qazan, sînî, mifisk, xanik, piyale...)
- 15- Fêkî hemî mê ne ji bilî “tirî”.
- 16- Çekên şerî (reşaş, cifte, qenase, romane, kalaşnîkof ...)

Ev nivşên mê bi jêderan me vegohistiye:

1- Çend nizmiyên li ser rûyê erdê ji bilî “gelî” hemî mê ne (Sadiq Behaeldîn Amêdî, 1987: 176).

2- Ev navên biyanî ku tên nav zimanî de weku nivşê mê reftarê digel dikin wek: sosyalîzm, bang, benzîn, telewîzyon, setelayit, telefon ... (Leyla Celîl 'Ebas, 2003: 91).

Navên tiştên bê giyan tên dabeşkirin li ser nivşê nêr yan mê. Ev dabeşkirin di zimanî de çî peywendî di navbera wî tiştî û nivşî de nîne ku amajê pê dikin. Belku peywendiyê xwebixwe ye û civak li ser hindê rêkeftî ne, ku hindek nav nêr in yan mê ne û ev ciyawaziya nivşî di zimanê kurdî de bi rêya bikaranîna morfemên rêzimanî yên nêr û mê tên diyarkirin: Dil - der – xwarin – mirad ...

Her du navên dil û der morfemên rêzimanî yên nêr (ê) werdigirin:

46- Serê min dulabe

Dilê min çwîçike (Selman Kuvilî, 2015: 167).



m.niv.nêr

47- Be emrê xudê xalqê 'alemê

Melek çun û girtin derê cehnemê (Ehmedê Nalbend, 1998: 499).



m.niv.nêr

Xwarin û mirad, her du nav mê ne, çunkî morfema rêzimanî ya mê (a) werdigirin.

48- Ezê dibînim,

Xwarina ejdehaya melayketin (Selman Kuvilî, 2015: 17).



m.niv.mê

49- Ew mirada me ji xudê hey dama dîtna teye



m.niv.mê


êk biket bo te fesadê guh nede bê 'aqila (Ehmedê Nalbend, 1998: 21)

1.2.4. Elomorfemên Morfemên Nivşî


Elomorf yek ji mijarên morfolojiyê ye ku giringiyê bi vê mijarê dide. Ji ber ku ev mijar peywendî bi morfemê ve heye, zimannasan bi gelek awayan elomorfem danîne naskirin. yek ji wan “Ew morfemên li jêr bar û doxên ciyawaz de şeweyên cuda hebin, dibêjin elomorf” (Zêrîn Xurşîd Selîm, 2009: 55). Ku wate hemî deman bo morfema nivşê mê bi yek şeweyî dernakeve, eger dumahiya peyvê fonîma nebizwên hat, dê morfema (a) wergirin. Belê eger dumahiya peyvê bi fonîma bizwên hat, dê morfema (ya) wergirin. “Çend şeweyên ku yên morfemekê ne, dibêjin şeweyê morfemê” (Ewrehman Hacî Marif, 1977: 34). “Şeweyên cuda yên heman morfemê ne. Derketina wê di jîngehên cuda de wan şeweyên cuda didin, her yekê ji wan şeweyên cuda morfem e (Wirya 'Umîr Amîn, 1989: 166) .“Elomorf birîtî ye ji şeweyên cuda

cuda yên yek morfemê (Mihemed Me'ruf Fetah, 1990: 80). “Elomorf şêweyên cuda cuda yên morfemekê ye ku di çarçoveyê dî de rol û dewrê morfemê dibînin” (Ewrehman Hacî Marif, 2014: 48) .Wate bi tenê morfem û formê wan ji hev cuda ne û ev şêwe cuda cuda nabin egerê guherîna watayê û heman rol heye: (a) û (ya) ev her du şêweyên morfema nivşê mê ne û elomorfên hev in bi tenê şêweyê dariştina wan ji hev cuda ne. Belê heman rol û wata heye.

Morf formê fîzîkî yê morfemê ye, ku ji formekê yan zêdetir pêk tê. (Katamba, 2006: 24) .Bo nimûne di ferhenga zimanê kurdî de bi şêweyekî giştî gelek peyv hene ku bi yek şêweyî tên nivîsîn û xwendin û yek wata heye. Wek: dar, asin, azad, çiya ... Di van nimûneyên serî de peyva “dar” yek morf e /dar/ û peyva “asin” yek morf e û peyvên dîtir jî bi heman şêweyî ne. Belê hindê peyv hene du morfîn yan jî pirtirin hene. Regê karê “gotin” du morf hene ew jî /go/ û /bêj/ e, ku wate her du dibin elomorfên regê karê gotin:



“Yek formê watadar dibêjinê morf (morph), kumeka morfan, ku form û watayeke wek hev hebe, dibêjin morfem (morpheme) û şêweyê cuda cuda yê morfemê jî dibêjin elomorf (allomorph)” (Girur Hadsin, 1387: 70). Her wesa morfemên /te/, /tu/, /e/, /î/ çar morfên morfema kesê duyem ê tak in, ku dibin elomorfên hevdu:



Wate di zimanê kurdî diyalekta kurmanciya serî de çend morfên cuda pêkve elomorfên morfema kesê duyem ê tak in yan komeka elomorfên kesê duyem ê tak derbirinê ji morfema kesê duyem ê tak dikin. Ku wate elomorf çend morfên cuda cuda yên yek morfemê ne. Babetê vekolinê morfemên nivîşî ye. Ev morfem li dûv fonîmên dumahiya peyvê yan destpêka peyva ku ligel tê, kartêkirinê li ser şêweyê (morf) derketina vê morfemê dike:

51- kelha kevin nûjen bikin.

52- Qutabxaneya kevin nûjen bikin.

Di nimûneyên (51), (52) de her wekî xuya ye morfema nivîşê mê di doxê xistineser de morfên cuda /a/ û /ya/ derketiye û ev çend bo kartêkirina dengên dumahiya wan peyvan e wekî peyva “kelih” bi fonîma /h/ û peyva “qutabxane” bi fonîma /e/ dumahî hatiye, dibine egerê hatina şêweyên cuda cuda yên wan morfan, ku ev morf dibin elomorfên morfema nivîşê mê.

53- Dîwarê xanî herift.

54- Mamosteyê babetî nehate xwendengehê.

Di nimûneyên (53), (54) de morfema nivîşê nêr di doxê xistineser⁽³⁾ de bi şêweyê morfên cuda /ê/ û /yê/ derketiye wekî peyva “dîwar” bi fonîma /r/ û peyva “mamoste” bi fonîma /a/ dumahî hatiye, bûne egerê şêweyên cuda cuda yên wan morfan ku ev morf dibin elomorfên morfema nivîşê nêr

55- Em çûne zankoyê.

56- Em çûne ser darê.

Di nimûneyên (55), (56) de nivîşê mê di doxê tiyan⁽⁴⁾ de bi morfên cuda /yê/ û /ê/ hatiye. lewra dumahiya navê “zanko” bi fonîma bizwên a /o/ û peyva “dar” bi fonîma nebizwên a /r/ dumahî hatiye û her du fonîm bûne egerê şêweyên cuda cuda yên wan morfan, ku morfên /ê/ û /yê/ elomorfên morfema nêr in.

57- Dayikê dergêhî baş bigire.

58- Asyayê babê te hat malê.

Ev her du nimûneyên jimarên (57), (58) morfema nivîşê mê di doxê gazîkirinê⁽⁵⁾ de du morfên ji hev cuda /ê/ û /yê/ wergirtine û her du peyvên “dayik” û “Asya” bûne egerê hatina cuda cuda yên morfan, ku her du morfên /ê/ û /yê/ elomorfên morfema nivîşê mê ne

³ Bo pitir pêzanîn binêre beşa duyem bendê sêyem r. 57.

⁴ Bo pitir pêzanîn binêre beşa duyem bendê sêyem r. 63.

⁵ Bo pitir pêzanîn binêre beşa duyem bendê sêyem r. 67

59- Binve mîrim bi dil tenayî

Pezê zozana wê zayî (D. Bedirxan Sindî, 2002: 138):



M.niv.nêr

60- Çira dil tu wesa evro ji kakil ra yê arhayî

Gutin yaro nê kew rabû sefer kêşa û zavaye (D. Bedirxan Sindî, 2002: 138):

Yê arhayî



m.niv.nêr

61- Bejin û bala qed û qamet sur û şemsa wa bilind

Suret û deng û qiyafet tazetir dê bîte hind (Ehmedê Nalbend, 1998: 302).

Wa



M.niv.mê

62- Min bizav kir bivegerim cîhana xwe ya berhest (Ismet Mihemed Bedel, 2006: 110).



m.niv.mê

Di nimûneyên (59), (60), (61), (62) de morfemên nivşê nêr û mê bo morfên cuda hene: /wê/ û /yê/ elomorf in bo nivşê nêr /wa/ û /ya/ elomorfên nivşê mê ne û ev şêwe li hindek devokên vê goverê bi kar tên (Mihemed Tahir Guherzî, 1999: 97 û Îbrahîm Remezhan Zaxuîy, 2008: 110). Ev cureyên elomorfên bi elomorfên fonolojî tên binavkirin⁶, “ev elomorf ji encamê hokarên fonolojiyê dirust dibin” (Silêman Îsma’îl Receb, 2006: 22). Morfemên nivşî di zimanê kurdî de di doxên cuda de (xistineser, gazîkirin, tiyan) bi şêweyê elomorfên fonolojî derdikevin.

1.2.5. Peywendiya Morfemên Nivşî bi Morfofonîmê ve

Morfem bi şêweyekî giştî yekeyeke zanista morfolojî ye. Belê bi tenê vê yekeyê peywendî bi morfolojiyê ve nîne. Belku hindek caran peywendiyê xurt di navbera zanista fonolojî û morfemê de jî heye û ev peywendî bi rêya hindek morfeman diyardibe. Morfemên nivşî jî yek ji wan morfeman e ku peywendî bi her du astan ve (fonolojî, morfolojî) heye û asteke navincî di navbera her du astan de peyda

⁶ Ji bilî elomorfên fonolocî, elomorfên lêksîkî, elomorfên rêzimanî, elomorfên şêwezarî, elomorfên beramberî, elomorfên sifir, elomorfên guhartî jî hene, bo pitir pêzanîna binêre (Mihemed Me’ruf Fetah û Sebah Reşîd Qadir, 2006 : 19), (Zîrîn Xurşîd Selîm, 2009: 56-59), Çiyayê Gare, Rûbarê Furat; Çiyayo, şivano; Rengê alay, pêşmergeyê Kurdistanê.

dike ku dibêjinê morfofonîm. Eger morfemek di asta morfolojiyê de bi şêweyê fonîmekê derket û ew fonîm jî di asta fonolojîyê de yekeya watadar e, her ji ber vê çendê ew morfem hem rolî di asta morfolojîyê de dibîne û hem wataya peyvê di asta fonolojîyê de diguherîne, lewra dibe morfofonîm.

Morfofonîm: ew fonîm e ewa niwandina morfemekê dike ku hindêk caran ew morfofonîm elomorfan dirust dike (Mihemed 'Elî Alixwalî, 1982: 176). “Ew morfema ku bi şêweyê fonîmekê xwe nîşan dide” (Talîb Husên 'Elî, 2005: 123). Morfofonîm pêkhatî ye ji wê fonîma di asta rêzimanî de derdikeve (Criyistal, 1997: 250). Bi şêweyekî giştî morfemên nivîşî (nêr, mê) di her doxekî de bin, dema ku bi şêweyê yek fonîmê derbirîne ji morfema nivîşî bike, dibe morfofonîm.

Morfofonîma (a) morfema nivîşê mê ye û morfofonîma (ê) morfema nivîşê nêr e di doxê xistineser de:

63- Xwendekara zîrek

64- Nujdara şareza

65- Dergehê pulê

Morfofonîma (î) morfema nivîşê nêr e morfofonîma (ê) morfema nivîşê mê di doxê tiyan da:

66- Kiça nujdarî

67- Kiça nazdarê

Morfofonîma (ê) morfema nivîşê mê ye û morfofonîma (o) morfema nivîşê nêr e di doxê gazîkirinê de:

68-Xwişkê, were mal.

69-Kuro, guhdariya babê xwe bike.

1.2.6. Peywendiya Morfemên Nivîşî bi Morfosentaksê ve

Her du pêkhateyên morfolojî û sentaks temamkerên hev in. Ku wate ya morfolojî çawaniya lêkdana morfeman (azad, bend) di formê wişeyê de diyar dike û sentaks çawaniya rêzkirina keresteyan di gire û risteyan de diyar dike (Radford, 1997: 265, 272). Morfosentaks zaravekî zimannasiyê ye, amaje bi polîn û taybetmendiya rêzimanî dike. Ku wate bo berçavkirina her du pîverên morfolojî û sentaksê tê bicihanîn û keresteyên zimanî wek morfemên nivîşî (xistineser, gazîkirin, tiyan) di şîyan de ye rolê her du zanistên morfolojî û sentaksê dirust bikin (Ebubekir 'Umer Qadir, 2003: 14). Her wekî diyar e çawa ku morfemên nivîşî peywendî bi zanistê morfolojîyê ve heye, bi heman awayî peywendî bi zanista sentaksê ve heye, dema ku

di her bar û rewşekê de morfemên nivîşî ligel navî di risteyê de bi yek şeweyî namînin û li gor wan bar û rewşan formê navî guherîn bi ser de tê û ev guherîn di risteyê de amajê bi peywendî û rolê wan morfeman di sentaksê de diyar dike. Bi zanista morfosenaksê ve heye, çunkî carekê dibe morfema nivîşî di asta morfolojî de û careke dî rolê morfemên "xistineser, gazîkirin, tiyan" dibînin di asta sentaksê de. Ji ber hindê dibêjin "morfosenaks pêkhateke aloz û tevlihev e" (Yara Qadir Hemed Mela Zade, 2013: 71):

70- Ava kaniyê paqij e.

71- Bajare Zaxo xweş e.

Di nimûneyên (70), (71) de morfema (a), (ê) dibin morfosenaks. Çunkî (a), (ê) di asta morfolojiyê de morfemên nivîşî û di asta sentaksê de rolê xistineser di gireyê de dibînin.

72- Kuro, li xwe hişyar be.

73- Nesrîne, dergehî bigire.

Her du morfemên (o), (ê) di nimûneyên (72), (73) de dibin morfosenaks. Çunkî carekê dibin morfema nivîşê nêr (o) û mê (ê) di asta morfolojiyê de û careke dî dibin keresteyên asta sentaksî û rolê gazîkirinê dibînin.


1.2.7. Peywendiya Morfemên Nivîşî bi Morfofonosenaksê ve

Morfofonosenaks ew diyardeya rêzimanî ye ku keresteyek di asta fonolojiyê de fonîm be, di asta morfolojiyê de morfem be û di asta sentaksê de rolekî rêzimanî bibîne û pêdivî ye yek fonîm be û morfemên bendên rêzimanî yên ji yek fonîmê pêk tînin weku morfemên nivîşî peywendî bi vê diyardeyê ve heye (Nazenîn Celal Ehmed, 2015: 5). "Têkelbûna her du astên lawekî morfofonîm û morfosenaks, asteke lawekî ya berfirehtir dirust dibe ku dibêjin morfofonosenaks" (Nefel Salih Îslam, 2015: 109):

74- Gunde Şeransê

Dengê /ê/ di nimûneya (74) de di asta fonolojiyê de fonîm in û di asta morfolojî de morfemên nivîşî ne, di asta sentaksê de rolê wan diyarkirina peywendiya serey û diyarkerî ye. Ku wate ev morfem di her sê astên zimanî de bi kar tînin. Carekê di her du astên fonolojiyê û morfolojî de rolê dibînin û asteke lawekî morfofonîm pêk tînin. Careke dî rolê xwe di her du astên morfolojî û sentaksê pêkve dibînin û asteke dî bi navê morfosenaksê dirust dikin. Ku wate ji vê rûnvekirinê ve xuya dibe ku ev


morfem di demekê de di her sê astan de kar dike. Lewra em dişên bibêjin ku asteke dî dirust dike bi navê morfofonosentaks.



Bo pirtir rûnkirina babetê morfofonosentaksê di zimanê kurdî de li gor wêneyê li xwarê di nimûneya (75) de gireyke navî (dara mazîyê), ku morfemên nivîşî pişkdariyê di pêkhata wê de dikin, em dê amaje bi van morfemên nivîşî yên cuda cuda (a, ê) bikin:

75- Lawê kurda çeperê xo bernede

Misteka axê nede çi car nede (D. Bedirxan Sindî, 2002: 61).



2. BEŞA DUYEM

**GIRE, TAYBETMENDÎ Û CUREYÊN WÊ Û
TÊGEHÊ SENTAKSÊ, RISTE Û DOXÎ Û
ROLÊN MORFEMÊN NIVŞÎ DI SENTAKSA
ZIMANÊ KURDÎ – GOVERA BEHDÎNÎ DE**

2.1. GIRE (FIRÊZ)

Di vê beşê de cure û rolên gireyan weku mijareke sereke tên diyarkirin. Çunkî di beşa sêyem de ji vê vekolînê diyar dibe ku peywendiyêke bihêz di navbera mijara morfemên rêzimanî û cureyên gireyan de heye. di gireya navî de morfemên nivîstî rolê xwe weku pêkhênên gire û diyarkirina peywendiya rêzimanî di navbera pêkhênên wê de dibîne. Her wiha gireya pêşnavî jî ji bilî sereyê wê diyarkerê wê gireya navî ye. Ku wate heman giringî di pêkhata wê gireyê de jî heye. Dîsa pêşnav yek ji wan keresteyan e ku doxî dide gireya navî û gireya karî jî li gor hêzê (têper, têneper) û tafê (borî, niha, bê) doxî dide gireyên navî ku rolê bikerî û berkarî dibînin. Gire yekeyeka sentaksî ye, sebarete pênasekirina wê bîrûboçûnên cuda hene, em dê hindek ji wan pênaseyan berçav bikin:

“Gire komeke peyvan e ku peywendî digel hev heye û kar tê de nîne” (Tufîq Wehbî, 1929: 62) .“Gire ku dibêjinê destê, bi wî keresteyê zimanî tê pênasekirin, ku bi kêmî ve ji sere (diyarkirî) û diyarkerekê pêk tê û cihê peyvekê di risteyê de digire” (Mihemed Me'ruf Fetah, 1984: 95) .“Gire dişê yek peyv be û kar tê de hebe” (Ebdulistar Fetah Hesên, 1996: 17) .“Gire ji peyvekê yan pirtir pêk tê” (Wirya 'Umer Emîn, 2004: 148) .“Yekeyeke zimanî ye ku ji peyvekê yan zêdetir pêk tê û rolî di pêkhateyêke ji xwe mezintir de dibîne” (Şêrzad S'îd Sêdîq, 2008: 62) .“Ew yekeya sentaksî ye, ku ji pêkhêneke sereke (sere), yan ji pêkhêneke nesereke (diyarker) yan zêdetir pêk tê û diyarker dikevin li jêr desthilatiya serî ve” (Sacîde 'Ebdulla Ferhadî, 2013: 10). Gire ew pêkhate ye ku ji sereyêke bi tenê yan jî ji sereyêke û diyarkerekê yan ji çend diyarkeran pêk tê û dişê di risteyê de rolên sentaksî (biker, berkar, hevalkar, kar...) bibîne. Gire biçûktirîn daneya sentaksî ye, ji risteyê biçûktir e û ji peyvê mezintir e û gire çend taybetmendiyên xwe hene ku ji pêkhateyên di yê zimanî tê cudakirin.

2.1.1. Pêkhênên Gireyê

Mebest ji wan pêkhênan e ku di pêkhata gireyê de pişkdariyê dikin, çi pêkhênên sereke yan nesereke bin:

A) Sere (Diyarkirî)

Sere pêkhêneke sereke ye di gireyê de, pêdivî ye di her gireyêke de sere hebe û sere dişê digel diyarkerên xwe rêk bikeve bi hev re di gireyê de bîn yan bê diyarker. Ku wate sere bo dirustkirina gireyê gelek giring e û rolê herî diyar dibîne. “Sere ew

keresteyê bincî ye ku têgeha gireyê tê de hatiye parastin û gire li ser tê avakirin” (Bayz 'Umer Ehmed, 2008: 83). Cureyê gireyê li dûv cureyê serê gireyê tê destnîşankirin. Eger serê gireyê nav be, dibe gireya navî û eger serê wê amrazê peywendiyê (daçek) be, dibe gireya pêşnavî (bend) û eger serê gireyê kar be gireya karî ye:

1- Dilberê da min jivanek min dilê kul bişkorî

min we texmîn kir xudanek evroke **palê** me bû (Ehmedê Nalbend, 1998: 110).



sere (nav) e

palê me (gireya navî)

2- Pilinge; gurg û ruyvî ya kehî diket û

Li kuçka paşay diket xulam û (Selman Kuvilî, 2015: 35)



Sere (daçek) e

Li kuçka paşay (girêya pêşnavî)

3- Ewê **got** aferîn ehmed eza hatim îta'ate

ku şa'r şibhî te nînin di van qerna di van çerxa (Ehmedê Nalbend, 1998: 8).

Got



Sere (kar) e

Got (gireya karî)

“Sere gupîtka gireyê ye di hemî gireyan de peyvek tê de heye ku dibêjinê sere” (Nerîman 'Ebdulla Xoşnaw, 2014: 132):

4-**kurê** min.



se

“Hebûna sereyê di gireyê de xurt e, her gireyekê pêdivî ye sereyek hebe” (Hatim Wilya Mihemed, 2000: 30). “Sere dibe navika (kakilka) gireyan, bi hîç renekî nayê ladan, di rûyê ji nav de çî keresteyek neşêt cihê sereyê bigire” (Şilêr Resul Mihemed Berzencî, 2004: 45). Ebubekir 'Umir Qadir di bêje ku "Tallerman" weha sere xoya dike: “Sere hilgira zanyarî û ramana gireyê ye û gelek giring e” (Ebubekir 'Umir Qadir, 2007: 27). Sebah reşîd qadir di bêje "Hespelmath" weha sere pêname dike: “Sere di kes û jimareyê de digel diyarkerên xwe rêk dikeve” (Sebah Reşîd Qadir, 2007: 14).

B) Diyarker

Ew pêkhênên nesereke ne di gireyê de ku hatin û nehatina wan karî li ser gireyê nakin bi tenê hatina wan pirtir rûnvekirina sereyê ye û diyarker di bin desthelatdariya sereyê de ye .“Ew formên zimanî ne yên jî layê rêzimanî ve sereyê gireyê dî zîvirîn weku beşekê lawekî gireyê kar dikin” (Şilêr Nayf Emîn, 2007: 42):

5- Nimûne: azadî

↓
diyarker

“Ew keresteyên ku gireyê berfireh dikin û di şîyan de ye bên ladan”
(Ebdulwahîd Muşîr Dizey, 2013: 35):

6- ew qutabî

↓ ↓
Dî se

7- Kevintirîn welatê azad

↓ ↓ ↓
Dî se dî

8- Welatê azad

↓ ↓
Se dî

2.1.2. Taybetmendiya Gireyê

- 1- Di her gireyekê de pêdivî ye sereyek hebe û sere desthilatdar e.
- 2- Cureyê gireyê li dûv cureyê serê gireyê tê destnîşankirin (Eger sere nav be dibe gireya navî, eger sere kar be dibe gireya karî û eger sere pêşnav yan amrazê peywendiyê be dibe gireya pêşnavî yan bend yan bernav).
- 3- Di navbera pêkhênên gireyê de peywendiyê sentaksî heye.
- 4- Diyarker pêkhênê nesereke ye dişê di gireyê de bê yan neyê, hatina wê bo pirtir diyarkirina sereyê ye û gireyê berfireh dike.
- 5- Gire daneyêke sentaksî ye.
- 6- Gire ji peyvê mezintir e û ji risteyê biçûktir e.
- 7- Gire di risteyê de rolên cuda cuda dibînin.
- 8- Her gireyekê li dûv pêkhênên wê rêzbûneke taybet bi xwe ve heye. Ku wate sere li destpêkê yan li dawiyê yan nîvê tê.
- 9- gire bo peyvekê tê kurtkirin.

10- Gire pêkhêneke navincî ye ku dikeve di navbera peyvê û risteyê de.

2.1.3. Cureyên Gireyê

2.1.3.1. Gireya Navî

“Bi şeweyekî giştî gireya navî ew gire ye ku ji pêkhêneke sereke (sere yan diyarkirî) û pêkhêneke nesereke (diyarker) pêk tê û sere di vê pêkhatinê de xurt e û hatina diyarkeran bi arezû ye” (Hatim Wilya Mihemed, 2000: 34). “Ew gireyên navî ku di zimanê kurdî de mayîn bi şeweyekî giştî ji sereyekê yan sereyekê û diyarkerekê, yan ji sereyekê û çend diyarkeran pêk tên” (Ebdulsitar Fetah Hesên, 1996: 17).

Pêkhênên Gireya Navî

A) Sere

Ew pêkhên e ew têgeha gireyê tê de hatiye parastin û nayê jêbirin (ladan) û di gireya navî de nav e û her cureyekê navî be û hindek caran sere di pêkhata rûyê ji serve yê gireyê dernakeve. Belku bi rêya wata û bikaranîna wê gireyê hest bi hebûna wê tê kirin û ew peywediya rêzimanî ku di navbera pêkhênên gireyê de hene, amaje bi hebûna sereyê di pêkhata rûyê ji nav de tê kirin. Ew navên ku di gireya navî de rolê sereyê dibînin ev in:

Navê taybetî û giştî:

9- dîyarê law



se.n.taybetîye

10- çiyayê metînî



se.n.giştîye

Navê komel

11- Milletê kurd pir wefaye suffî ên destên tene

Ruh ji êşan pir semaye 'aşq û mestên tene (D. Bedirxan Sindî, 2002: 9).

Milletê kurd



se.n.kumle

Navê binyatê karî

12-destpêka babetî



se.n.binyatê karîye

navê jêderî (çawig)

13-Hêlana daykê



Se.n.jêderîye

Navê cih

14- sevrangeha zaxo



se.n.cihîye

Navê amirî:

15-Dasa cutyarî



Se.n.amirîye

Navê watayî:

16-Azadîya kurdan



Se.n.watayî ye

Navê kesî (cihnavê serbexo):

17-ewê zana



Se.n.kesîye

B) Diyarke

Diyarkerê gireya navî ew kereste ne ku nesereke ne û li dûv cureyê diyarkerî hindek ji wan berî sereyê û hindek piştî sereyê tên û ji evên li xwarê pêk tên:

1- Diyarkerên Berî Sereyê

Ew pêkhênên gireyê ne ku berî sereyê di gireya navî de tên, dibêjinê diyarkerên berî sereyê û di navbera van diyarkeran û sereyê de çî caran morfemên nivîşî nayên. Bi tenê hevalnavê jimara kertî weku diyarkerî dikeve berî sereyê û pêdivî bi morfema nivîşê mê di doxê xistineser de heye. Di zimanê kurdî de diyarkerên berî sereyê ev in: hevalnava amajê, hevalnavê destnîşankirinê, hevalnavê nediyar, hevalnavê pirs, rade, hevalnavê jimarê... (Talib Hisên Elî, 1998:17-18; Dîyar Elî Kimal Kerîm, 2002: 44-45):

Hevalnava amajeyê

18- Meqsed me jê îqbale

Ev ş'ir e çî xoş fale (Ehmedê Nalbend, 1998: 59).

hevalnava amajeyê bo nêzikê (nêr û mê)

19-ew mirovê he

hevalnava amajeyê bo dûrê (nêr û mê)

Hevalnavê destnîşankirinê

20- bes kawe

↓ ↓
Dî se

21- Her nivşek; bi zimanê xwe dixwînît

Her tuxmek; bi rengê xwe dibînît (Selman Kuvilî, 2015: 28)

↓ ↓
Dî se

Hevalnavê nediyar

22-filan mirov nehat.

↓ ↓
Dî se

Hevalnav

23- Hakimin sultan mîsalin ey bira

Xoş qumandarên hemî li bin çadira (Ehmedê Nalbend, 1998: 240).

↓ ↓
Dî se

Hevalnavê pila bala (bilind)

24- Diyare baştirîn rê bo bersînggirtina mirnê ji bîrkirna wî ye (Sebîh Mihemed Hesên, 2011: 84).

↓ ↓
Dî se

Hevalnavê rêzgirtinê

25- hêja remezan

↓ ↓
Dî se

26- mela ehmed

↓ ↓
Dî se

Navê cihî

27- rex malê

↓ ↓
Dî se

Hevalnavê nefî

28- Ci felîtiyê dît çav lê niqandin û

Ci (pîrosî) yê hat ber derî (Selman Kuvilî, 2015: 51)

↓ ↓
Dî se

29- Babo ka bêje eve heftiyê te ci qazanc û ci xosaret ji wan sed zêra kiriye? (Cemîl Mihemed Şêlazî, 2005: 40).

↓ ↓ ↓ ↓
Dî se Dî se

Hevalnavê pirsê

30-Cend rojname li Kurdistanê derdiçin?

↓ ↓
Dî se

31-Kîjk varîzan zîrek e?

↓ ↓
Dî se

Hevalnavê nasînê:

32-Ew qutabî çeleng e.

↓ ↓
Dî se

Hevalnavê çendî

A- Jimare:

Jimareya bincî (asayî)

33- Seş kezî rû qurimçîne heft kezî wechê bitenî

hest keziya pêve nîne rastî malê baş û 'al (Ehmedê Nalbend, 1998: 204).

↓ ↓
Dî se

Jimareya tertîbî (rêkxistin)

34- Lê demê kevî hember êkemîn kes kevte bin piyan û perçiqî ('Ismet Mihemed Bedel, 2006: 116).

↓ ↓
Dî se

Jimareya kertî

35-Çwarêk a pezi bifroşe.

↓ ↓
Dî se

36- Herdû wezîr jî bi duvêk keftin hatine nîva rêkê (Cemîl Mihemed Şilazî, 2006: 10).

↓ ↓
Dî se

B- Rade

37-Hemî stran xoş in.

↓ ↓
Dî se

2) Diyarokerên Piştî Sereyê

Ew pêkhênên gireyê ne ku dibin diyarkerên piştî sereyê û li dûv sereyê tên û diyarkerên piştî sereyê morfema nasînê, morfema komkirinê, morfema nivş, nav, hevalnav, navê karî ne. (Diyar 'Elî Kimal Kerîm, 2002: 46-7; Hatem Wilya Mihemed, 2000: 57-60).

Yek ji taybetmendiyên van diyarkeran ev e, eger diyarker morfemên rêzimanî (nasînê, komkirin, nivş) bin wê demê pêdivî bi morfemên xistineser di navbera sereyê û diyarkerî de nîne, belê eger diyarker nav, navê karî, hevalnav, hevalnavê pila berawrid hwd bin pêdivî ye morfemên xistineser di navbera sereyê û diyarkerî de hebe û diyarkerên piştî sereyê ev in :

Morfema nenasînê

38-Zelam ek hat.

↓ ↓
se Dî

Morfema kumkirinê

39-Zelam an govend girê da.

↓ ↓
Se Dî

Morfema nivşî

40- Sivan î pez çêrand.

↓ ↓
Se Dî

41-Nazdar ê ça çêkir.

↓ ↓
Se Dî

Hevalnavê dubarekirinê

42- Ew î hat.

↓ ↓
se dî

43- Wî î bi merema gehandina nameyekê ku ew xirab têgehşit destê wê zêde givaşt
(Ismet Mihemed Bedel, 2006: 19).

Wî î
↓ ↓
se dî

Nav

44- Rewneqa roja ruyê te sutî wechê 'aşîqa

lew dilê min kefte şuka mihebetê bê qeyd û dav (Ehmedê Nalbend, 1998: 48).

ruyê te
↓ ↓
Se Dî

45- Daîm be 'şqa dilberê

Keftîme cerxa xencerê (Ehmedê Nalbend, 1998: 13).

↓ ↓
Se Dî

Navê karî (çawg)

46- xebera ê kuştin û mirinê pir nexoş e.

↓ ↓ ↓
Se Dî Dî

Hevalnav

47- Kirêneka mezin ji dilê wê hat (Sebîh Mihemed Hesên, 2011: 89).

↓ ↓
Se Dî

Hevalnavê pila berawird

48- kavirek ê mezintir bikre.

↓ ↓
Se Dî

Hevalnavê jimareya rêkxistinê

49- Endazyar ê yekê (êkê) xelat kir.

↓ ↓
Se Dî

50- Paşî xanima dwê û ya syê û ya çwarê, hemû di bê dengî (Ismet Mihemed Bedel, 2006: 80).

↓ ↓
Se Dî

Navê pîşe (şol)

51- Azad ê asinger

↓ ↓
Se Dî

Naznav

Wekî diyarkerê piştî sereyê rolê xwe dibîne û dişêt gireya navî mezin bike. (Hikmet Resul Ehmed, 2010: 115).

52- Kawe Amêdi

↓ ↓
Se Dî

Eger naznav bibe diyarker bi du şeweyan e:

A-sere (nav) + morfemên xistineser + diyarker (naznav):

Newzad + **ê** + **şivan**

Melay + **ê** + **Cizîrî**

B-sere (nav) + diyarker (naznav):

Eyaz + **Zaxoyî**

Bedirxan + **Sindî**

Ev cureyê hatina naznavî ligel sereyê li dûv hindêk bîrûrayan lasayîkirina (çavlêkirin) şeweyê 'erebî ye (Hatim Wilya Mihemed, 2000: 60), ku divê bi vî şeweyî bê:

Eyazê Zaxoyî, Bedirxanê Sindî

Cihnavê serbixwe

Bi tenê desteya cihnavê xudaniyê (min, te, wî/wê, me, we, wan) weku diyarkerê piştî sereyê tên:

53- Be destê min neman xeyrî hewara tu ya dibêjî tu daîm êk tenşitî
(Ehmedê Nalbend, 1998: 115).

destê min
↓ ↓
se dî

Cihnavê xweyî (xo, xwe)

54- Yê tila xwe li enyêt bilind suyar diketin

Yê kabêt mêra xwar diketin (Selman Kuvilî, 2015: 10).

tila xwe
↓ ↓
se dî

Navê deman

55- şev a havînê

↓ ↓
se dî

Navê cihan

56- Gotê: wezîr ma çî li bajêrê bexda qewimîye (Cemîl Mihemed Şilazî, 2006: 14).

↓ ↓
se dî

Hevalnavê amajeyê (evî, evê, ewê he, ewahe)

57- Cîrok a evê xoş e.

↓ ↓
se dî

Hevalnavê nediyar

58- Qîbla me tûy xetre nema me li keseke dî

Paşî te heram bûme teheb tu liçû umêdî (Ehmedê Nalbend, 1998: 17).

keseke dî
↓ ↓
se dî

Hevalnavê pirsê

59- Te gul a cewa divêt?

↓ ↓
se dî

Cureyên Gireya Navî

Mijara cureyên gireya navî li gor jimara sereyê û hatina diyarkeran tê dabeşkirin.

A) Gireya Navî ya Sade

Ew gire bi sereyek bi tenê yan sereyek û diyarkerekê yan çend diyarkeran pêk tê (Hikmet Resul Ehmed, 2010: 90):

1) Gireya Navî ya Sade ya Nawik

Ew gire ye ya bi tenê ji yek pêkhênî (nav) pêk tê û ew nav jî sere ye. Çi ew peyv ji layê pekhatinê ve sade bin yan darêjtî yan lêkdayî yan jî aloz be (Bayz 'Umer Ehmed, 2008: 78): serjêkirin , ciwani , azad , ...

60-azad çû

↓
g.n
↓
se

2) Gireya Navî ya Sade ya Firehkirî

Ew cureyê gireyê ye ku ji pêkhênêkê pirtir pêk tê. Ew pêkhên jî divê sere (nav) û diyarker bin, dibe diyarkerek yan çend diyarker ligel sereyê bîn, çi diyarkerên berî sereyê û çi piştî sereyê bin yan jî her du bi hev re ligel sereyê bîn:

61-dilşadê kurê azadê kurê diyar î

↓ ↓ ↓ ↓ ↓ ↓
Se Dî Dî Dî Dî Dî

B) Gireya Navî ya Lêkdayî

Ew cureyê gireyê ye ku ji lêkdana du gireyên navî yên sade (nawik, firehkirî) yan zêdetir pêk tên. Bi alîkariya amrazê lêkdanê (û) tê lêkdan:

62-warê me û cihê me

↓ ↓ ↓ ↓
se Dî se Dî

63-baştirîn mirov û hoşmendtirîn zana

↓ ↓ ↓ ↓
Dî se Dî se

C) Gireya Navî ya Aloz

Ev cureyê gireyê ji lêkdana du gireyên navî yên sade yên firehkirî yan zêdetir pêk tê. Di vî cureyê gireyê de yan diyarkerên wan bûne yek û diyarkerên wan bi alîkariya amrazê lêkdanê (û) hatine lêkdan yan jî berevajî (Bayz 'umer ehmed, 2008: 84):

31). **64- Ruha min û te** herdûka qurbana (hatim altaî) bibin (Cemîl Mihemed Şilazî, 2006:

↓ ↓ ↓
se Dî Dî

65-war û cihê me

↓ ↓ ↓
se se dî

2.1.3.2. Gireya Pêşnavî

Gireya pêşnavî ew cureyê gireyê ye ku pêkhata wê nêzîkî gireya navî ye, xala herî giring di navbera wan de ew e ku di gireya navî de nav sere ye. Belê di gireya pêşnavî de pêşnav sere ye. “Ew cureyê gireyê ku serê wê morfemeke pêşnavî ye û bi cureyekî rêzkirin heye û li gor diyarkerê wê tê firehkirin” (Ebdulwahîd Mûşîr Dizeyî, 2012: 39).

Pêkhênên Gireya Pêşnavî

Ew cureyê pêkhênan in ku pişkdariyê di pêkhata gireya pêşnavî de dikin û ji du cureyan pêk tên:

A) Sere

Sere di gireya pêşnavî de pêşnav e û sere li despêkê û berî diyarkerî tê, pêşnav ev in: (bo , ji , li , bi , di ... da , ...


B) Diyarker

Diyarkerê gireya pêşnavî gireya navî ye (Sanya Cebar 'Ebuzejd, 2013: 11) . Çi gireya navî ji layê pêkhatinê ve sade yan lêkdayî yan aloz be, her dem diyarkerê gireya pêşnavî piştî sereyê tê ku wate diyarkerên berî sereyê nîne :

66- Xem ji tembîrê dibarin ax û ux zurna dibê


Dil zêmarên bilîlan şirke xuyn û zux jê tê (D. Bedirxan Sindî, 2002: 114).

ji tembîrê



67- Xanî ew resmê te ji merakêşay

Paşe roja me te **li qelemî** day (D. Bedirxan Sindî, 2002: 105).



Ku wate rêzkirina pêkhênên vê gireyê bi vî şeweyî ye û nayê guhertin:

Sere (pêşnav) e + diyarker (girêya navî) e

Di nimûneyên (66, 67) de “bo fêrgehê” û “ji qutabxanê” gireyên pêşnavî ne ji sereyê “bo” û “ji” pêşnav in û ligel diyarkerê wan “fêrgehê” û “qutabxanê” nav in, pêk tê.

Cureyên Gireya Pêşnavî

Li gor jimara sere û hatina diyarkeran gireya pêşnavî li ser van cureyên li xwarê tên parvekirin.

A) Gireya Pêşnavî ya Sade

Ew cureyê gireyê ku ji sereyekê û gireyeke navî ya sade (nawik, firehkirî) pêk tê û di vî cureyê gireyê de gireya pêşnavî ya nawik nîne. Çunkî di zimanê kurdî de çî caran pêşnav bi tenê nayê:


68-bo te



B) Gireya Pêşnavî ya Lêkdayî

Ew cureyê gireyê ku ji du gireyên pêşnavî yê sade yan zêdetir pêk tê û bi rêya amraze lêkday (û) tên lekdanê:


69-bo guhdarî û bo te




C) Gireya Pêşnavî ya Aloz

Ew cure ye ku bi tenê serê wan yek in û diyarker bi rêya amrazê lêkdayî (û)

tên lêkdan:



71- Dest havêtinê daweteka xoş bo 'elyê şivan û kîça soltanî kirin (Cemîl Mihemed Şêlazî, 2005: 31).



2.1.3.3. Gireya Karî

Gireya karî yek ji pêkhênên sereke yê risteyê ye. Kar pêkhateke aloz e ku ji çendîn morfemên bend pêk hatiye (Fattah, M. M., 1997: 208). Li dûv tafê risteyê di gireya karî de binyatê karî tê guherîn (Kurdistan Mukryanî, 2000: 29).

Pêkhata Karî

Berî em amaje bi pêkhênên vê gireyê bidin, em dê amaje bi pêkhata karî bidin. Çunkî kar di zimanê kurdî de ji çendîn morfeman pêk tê û kar jî wek morfemeke tewerî pêkhênên dî yên karî wek taf, nerê, rûkar, binyatê rêje wedgire:

1-Binyat (kok): Ew pişka karî ye ku wataya bingehî ya karî tê de parastî ye.

72 -Çû



Ç: binyat e

2-Taf (dem): Ew dema rêzimanî ye ku kar tê de tê encamdan yan nayê encamdan, dibe sê cure: borî, niha, tê:

Çû (û)morfema tafê borî

Diçim (di) morfema tafê niha

Dêçim (dê) morfema tafê tê

3- Nerê: Ew morfem e ku encamnedena karî diyar dike:

73-neçû naçim
↓ ↓
Morfema nerê Morfema nerê

4-Rûkar: Ew morfem e ku berdewamî, dûrî û temamiyê dide karî:

74-diçû, çûye , çûbû
↓ ↓ ↓
berdewamî temamî dûrî

5-Reje: Ew morfem e ku ji layê merc, ragihandin û fermanî ve karî diyar dike:

75-xwariba bixwe
↓ ↓
merc fermanî

Pêkhêna Gireya Karî

Ew pêkhênê ku pişkdariyê di pêkhata girêya karî da dikin ew jî ev in:

A) Sere

Kar bi şeweyekî giştî bi hemî pêkhênên xwe ve çî kar ji layê pêkhatinê ve (sade, darêştî, lêkday) dibe sere bo vê gireyê (hat, hilnebijard, serkeftiba ...):


76-Kuşt
↓
Se.k

B) Diyarker


Di gireya karî ya zimanê kurdî de diyarkerek heye ew jî morfema dubarekirinê (eve/ ve) ye û dikeve dumahiya gireya karî:

77-Hat eve
↓ ↓
Se dî
↓ ↓
K m.dubarekirinê

78-Hilnebijard eve



79-Serkeftiba ve



Cureyên Gireya Karî

Her weku berî niha di mijara cureyên gireya navî û pêşnavî de amaje bi jimara sere û diyarkeran hatiye kirin bo destnîşankirina cureyên wan gireyan. Belê gireya karî û cureyên wê ji wan her du cureyên gireyan cuda ye. Lewra bo destnîşankirina cureyên gireya karî di zimanê kurdî de, me bi vî şeweyê li xwarê mijara cureyên gireya karî diyar kiriye:

A) Gireya Karî ya Sade

Girêya karî ya sade du cure ye.

1) Gireya Karî ya Sade ya Nawik

Di zimanê kurdî de her keresteyeke em bişên bibêjinê kar, pêdivî ye bi kêmî ve di pêkhata wê de du pêkhên hebin, ew jî binyatê karî û taf in ku hebûna yekê hebûna ya dî diselmîne û ji bilî van di şîyan de ye ev her sê pêkhênên nerê, rêje û rûkar jî di karî de hebin, anku kar di nav xwe de keresteyekî fireh morfem e:

80- Ew bi xo agre berbûye dila


Her me gazinde kirin **got** me bila (Ehmedê Nalbend, 1998: 23).



2) Gireya Karî ya Sade ya Firehkirî

Ev cureyê gireyê ye ku ji sereyekê (kar) û dîyarkerêkê (eve) pêk tê:

81- Careka dî zivrîn eve kuçkê (Cemîl Mihemed Şîlazî, 2006: 49).



B) Gireya Karî ya Lêkdayî û Aloz

Heger ev cureyê gireyê hebe, divê bi kêmî ve du sere (kar) tê de hebin, yan di risteyê de du kar hebin. Anku di sadetirîn risteya kurdî de bi tenê karek heye naguncit. Wate gireya karî ya lêkdayî di zimanê kurdî de nîne. gireya karî ya aloz jî gireya karî ya lêkdayî çêbibe, ka çawa gireya navî ya aloz jî gireya navî ya lêkdayî çêdibe yan pirtir jî gireyêke sade. Her wesa jî ber ku di gireya karî ya mezinkirî de bi tenê yek diyarker heye, ev jî dest nade bo çêkirina gireya aloz. Çinku di gireya aloz de bi kêmî ve divê du diyarker yan du diyarkirî hebin. Ji ber van egeran gireya karî ya aloz jî nîne (Bayz 'Umer Ehmed, 2008: 87).

2.1.4. ROLÊN GIREYAN DI RISTEYÊ DE


1- Biker: Ew pêkhêneye, ku di rêzbûna bineretên ristê da herdem li pêşiya hemî pêkhênên di dihêt, bi wata biker êkem grêya naviye (Xisru Ehmed Resul, 2007: 16). ev gire di risteyê de dibe bersiva pirsyara “kî, kê, çi?”:

82- Narîn hat.




2-Berkarê rastewxo: Berkar dikevîte bin desthelata karîve (Sacîde 'Ebdulla Ferhadî, 2013: 23). ev gire di risteyê de dibe bersiva pirsyara “kî, kê, çi?” û dikeve navbera bikerê û karê têper û hemi dema girêya naviye:

83- Wî agirê newrozê hil kir.



3- Berkarê nerastewxo: Pêkhênê neserkiyê ristêye, li gel karê (têper, têneper) dihêt û herdem girêya pêşnavîye û dibîte berisva pirsyara "kê, çi" (Xisru Ehmed Resul, 2007: 54-56):

84- Min name bo wî bir.



4- Hevalkarê demî: Ew cureye, ku demê rudan yan runedana karî dinav ristê da diyadikit (Azad Ehmed Hisên, 2001: 35). ev gire di risteyê de yan girêya navî yan pêşnaviye û dibe bersiva pirsyara “kengî?” :

85- Ew **duhî** çû.



86- Wi aheng **bi şev** gira.



5- Hevalkarê çawayî: Ew curê hevalkariye, ku çewaya rudan yan runedana karî dinav ristê da diyadikit (Bayz 'Umer Ehmed, 2012: 43). Ev gire di risteyê de yan girêya navî yan pêşnaviye û dibe bersiva pirsyara “çawa?”:

87- Te wane **baş** nivîsî.



88- Ew **bi lez** hat.




6- Hevalkare cihî: Ew cureye, ku cihê rudan yan runedana karî dinav ristê da diyadikit (Dîmen 'Ebdulla 'Umer, 2009: 51). ev gire di risteyê girêya pêşnavî ye û de dibe bersiva pirsyara “li ku dere, li kîve?”:


89- Kabira **li cem te** rûnişt.



7-Temamker: Ew pêkhênê ye, ku di gel herdû karên "bihêz, bêhêz" dihêt û wataya karê ristê tamam dikit (Bayz 'Umer Ehmed, 1999: 4) Ev gire di risteyê de yan girêya navî yan pêşnaviye:



8-Kar: Ew pêkhênê serekiyê ristiye, ku hebûna wê di ristê da bi xurtiye û "pêkhênêkê desthelstdare" (Sanya Cebar 'Ebuzeîd, 2007: 4). Ev pêkhêne herdem girêyeka kariye:




2.2. PÊNASE Û TÊGEHÊN SENTAKS, RISTE Û DOX

2.2.1. Sentaks


Sentaks peyveke yewnanî ye ku bi wataya rêkxistin û rêzkirina peyvan tê. Ev rêkxistin û rêzkirina peyvan li dûv yasayên rêzimanî yên zimanan tê ku her zimanekî yasayên xwe yên taybet sebarek bi rêzkirina peyvan heye û ev rêzkirin dibe binemayek ji bo cudakirina zimanan. Bo nimûne zimanê kurdî rêzkirina peyvan bi şeweyê (SOV) yan (biker, berkar, kar) ye:

94-Armanî baxçe av da.



Belê di zimanê îngilîzî de bi şeweyê (SVO) yan (biker + kar + berkar) ye:

95-He drinks the water.



Her çend ev her du ziman ji yek xêzana zimanî ne, belê rêzkirina peyvan di risteyên her du zimanan de cuda ye.

“Sentaks weku zanist, pêkhatyêke rêzimanî ye. Ligel morfolojî û dengsazî û watayê ye” (Mihemed Mehwi, 2001: 1). “Sentaks serbixwetiya temam heye, digel vê çendê jî digel pêkhatyên dî yên rêzimanî de, pêkve kar dikin û kartêkirina wan jî li ser hevdu heye” (Radford, 1988: 16). Qanatê Kurdo derbarê sentaksê de dibêje: “Sentaks ilmê rêzkirina xeberan (bêjeyan) e, şirove dike bi çi teherî (cure) cumle ji xeberan çêdibin. Çawa bendên xeberan di cumleyan de bi hev tîn û çawa cumle bi hev re tîn girêdan û çend cure cumle di xeberdanê de hene” (Sadiq Behaedîn Amêdî, 1987: 445). “Hevoksazî zanista pêkînan û şirovekirina hevokan e” (Sadiq Behaedîn Amêdî, 1987: 445).

Chomsky derbarê giringiya sentaksê di zimanî de dibêje: “Dil di laşê mirovî de, cihekî giring heye, sentaksê jî di zimanî de heman giringî heye”(Fereydûn 'EBdil Berzincî, Bekir 'Emer 'Elî, 2004: 19).

2.2.2. Riste

“Ew axaftin e ku kar tê de heye û ramana tamam dide” (Mihemed Emîn Hewramanî, 1981: 31). “Her derbirîneke bişê serbixwe bê gotin û peywendiya rêzimanî bi yekeyeke ji xwe mezintir nebe, dê bibe riste” (Baîz ‘Omer Ehmed, 2012: 51). “Mezintirîn yekeya zimanî ye ku ji layê pêkhatinê ve serbixwe ye” (Mihemed Me’rûf Fetah, 1990: 98). “Riste rûyekî zimanî ye, ku awazeke taybet û rawistiyaneke li dumahiyê hebe û watayeke tamam bide û di pêkhatina yekeyeke zimanî ya mezintir bi kar neye” (Xisro Ferşîd Werd, 1382: 85). Wate riste mezintirîn yekeya zimanî ye ku dişê ji gireya navî û gireya karî pêk bê. Belê hindê caran di rûyê ji serve bi tenê ji gireyê karî pêk tê. Lewra zimannas dibêjin divê di her risteyekê de karek hebe:

96-Hat.

↓
g.k

Di risteya (96) de di rûyê ji serve bi tenê gireya karî derketiye û gireya navî (ew) yan her navek ku bo kesê sêyem ê tak bê bikaranîn, di rûyê ji serve dernakeve û ev riste di bineret de di rûyê ji nav de ji gireyê karî pêk tê. Belge ji bo vê çendê ew e ku rêkkestin di navbera gireya navî, ku rolê bikerî dibîne digel karî de heye. Di zimanê kurdî de nîşana rêkkestinê digel karê borî yê teneper bo kesê sêyem ê tak morfema (ə) e ye. Eger em risteya “Hat.” bo “Hatim.” biguherînin:

97-Hatim.

Di risteya (97) de gireya navî, ku rolê bikerî dibîne “ez” di rûyê serve derneketiye. Belê morfema rêkkestinê “im” bo kesê yekem ê tak digel karê borî yê teneper (im) derketiye û morfema “im” belge ye ku gireya navî ya “ez” di rûyê ji nav de heye.

“Riste mezintirîn yekeya sentaksî ye, keresteyên pêkhênên gireya navî û gireya karî bi rêya yasayên sentaksî bi hev re girê didin” (Trask R.L., 1993: 250):

(Pêkhênên) g.n + (Pêkhênên) g.k = riste (pêkhat).

↓ ↓ ↓
Kawe + hat = kawe hat.

(Pêkhênên) g.n + (Pêkhênên) g.k = riste (pêkhat).

↓ ↓ ↓
Kurê Kaweyî + çû = Kurê Kaweyî çû.

Wate riste mezintirîn daneya zimanî ye û pêkhênên riste yê gireya navî û gireya karî ne. Di nimûneya “Kawe hat.” de riste ji du gireyan pêk hatiye (kawe) gireya navî û (hat) gireya karî ye. Sebaret bi risteya “Kurê Kaweyî çû.”, bi heman şeweyî riste ji du gireyan pêk hatiye “Kurê Kaweyî” gireya navî ye û “çû” gireya karî ye. Di vê riste yê de morfemên rêzimanî jî wek peyvan kereste ne bo avakirina gireyan, morfema “ê” nîşana nivşê nêr e di doxê xistineser de ketiye di navbera navê “kur” û navê “Kawe” de, ku peywendiyê rêzimanî heye û gireyê navî ya mezinkirî dirust kiriye.

2.2.3. Dox

Di binyatê de peyva dox ji peyva latînî *casus* hatiye wergirtin, ku wergêrana peyva girîkî *ptosis* bi wataya *fall* ya îngilîzî ye (Viyan Îbrahîm ‘Elî Îbo, 2015: 26). Her ji kevin de zimannasan hest bi giringiya doxî di rêzimanê de kiribû. Lewra ew guherînên bi ser dumahiya navan de dihatin û rolê navî di riste yê de diyar dikirin û ew guherîn di zimanî de bi dox dihatin nasîn (Mihemed Rezayî Batînî, 1993: 62). Her gireyê navî di riste yê de bi rêya nîşanên (morfemên) rêzimanî rolê wan di nav riste yê de tê diyarkirin û diyarkirina rolê van gireyan bi rêya doxî ye û ev dox jî bi rêya morfemên rêzimanî tên diyarkirin û dibêjine van cureyên doxan doxê morfolojî yan nîşaneyî, her ji ber vê çendê di rêzimana kevin de dox ne diyardeyê cîhanî (seranserî) bû, çunkî hemî zimanên cîhanî nîşaneyên morfemên taybet bi diyarkirina doxî ve nînin. Li dûv boçûna Floomfieldî “di destpêkê de hemî zimanên cîhanî xwedî nîşanên doxî bûn, piştî borîna demê ev nîşan ji dest dane” (Bloomfield, 1933: 30).

Diyalekta serî ya zimanê kurdî xwedî nîşanên rêzimanî ye, ku ev nîşan ji bilî diyarkirina nivşî, jimare, kesî ev morfem rolekî giring di diyarkirina rolê gireyan di riste yê de û diyarkirina peywendiyê rêzimanî di navbera pêkhênên gireyê de dibînin û doxî derdibirin. Lewra ev diyalekt bi zimanekî xwedî doxê morfolojî tê hijmartin.


2.3. ROLE MORFEMÊN NIVŞÎ DI GIREYÊ DE

2.3.1. Doxê Xistineser

Xistineser yek ji wan doxan e, ku di pêkhata gireya navî de rolekî sereke dibîne û di şiyana da ne ev gire bi rêya xistinesera sere û diyarkeran heta bê dawî bînin berfirehkirin. “Morfemên xistineser ew morfem in, ku diyarker û sereyê pêkve gire didim û peywendiyê wesfî (pesnî) û xwedîtî di navbera wan de nîşan didin” (Ewrehman Hacî Marif, 1979: 226). “Sere peywendiyê rêzimanî bi alîkariya doxê


xistineser dirust dike, di hindek biyavan de ev doxê xistineser peywedîya wê li ser binemayê heyî ye” (Cristal, 2003: 200). “Morfemên xistineser di pêkhata gireya navî de rolê pêkvegirêdana pêkhênên diyarkeran in ku bi navî ve (diyarkirî) girê didin” (Ebûbekir ‘Omer Qadir, 2003: 43-4). Her ji ber vê çendê hindek pêkhênên dî jî dişên bi rêya pirosa xistineser bibin diyarker bo serê wê gireya navî û vê pirose bi rêk dixê û dibe morfosentakseke xistineser, ji ber ku rolekî sentaksî di gireya navî de dibinin.

Morfemên nivîşî (a, ê) di zimanê kurdî de rolê xistineser dibînin, ku hindek diyarkeran bi serê gireyê ve girê didin û vê girêdanê bi şeweyekî rêkxistî diyar dikin û gireyê berfîreh dikin:




Her diyarkerêkî di pêkhata gireya navî de bi mercekî piştî sereyê bê, divê di navbera wî diyarkerî û sereyê de morfemên doxê xistineser bên, ji bilî hevalnavê çendî yê jimareya kertî, ku berî sereyê tê û pêdivî bi morfema xistineser heye. Peywendiyêke rêzimanî di navbera sereyê û diyarkerî de heye û rêzkirineke taybet ya pêkhênan bo gireya navî di zimanê kurdî de ev morfem diyar dike û ew jî bi vî rengî ye: Sere + m. xi + diyarker

Ku wate her gireyêke navî rêzkirina pêkhênên wê bi vî awayî be, diyarkerê wî neşê biçê berî sereyê. Çunkî rêzbûna rêzimanî ya pêkhênên gireyê têk dide. Ji bilî diyarkerê berî sereyê (hevalnavê jimareya kertî) nebe ku dişê berî sereyê bê û di navbera wê diyarkerî û sereyê de morfema xistineser bê:



Hemî deman morfema nivîşî di doxê xistineser de dikevin di bin karîgerîya sereyê de. Ku wate cureyê hatina morfema xistineser li dûv nivîşê sereyê tê:



102- Kiç a wê
 ↓ ↓
 se.(mê)ye dî.(mê)ye

Di van her du gireyan (101, 102) de morfema nivşê xistinesera “a” li gor nivşê sereyê “kiç” hatiye nek diyarkerî “wî û wê”.

Her wiha eger navekî duzayend be ka merem pê kîjan nivşê diyarkirî ye (sereyê) dê morfema wî nivşî ligel sereyê bi kar bê, di nimûneyên (103), (104), (105), (106) de xuya dibe:

103- nujdarê wî
 ↓ ↓
 se.(nêr)e dî.(nêr)e

104- nujdarê wê
 ↓ ↓
 se.(nêr) e dî.(mê)ye

105- nujdara wî
 ↓ ↓
 se.(mê)ye dî.(nêr) e

106- nujdara wê
 ↓ ↓
 se.(mê)ye dî.(mê)ye

Giringiya morfemên nivşî di gireya navî de ew e ku gireya navî weku yek parçe hem ji layê sentaksî û hem ji layê watayê ve pêkve girê dide, peywendiyê xurt di navbera pêkhênên gireyê de dirust dike. Bi ladana van morfeman ev gire tê hilweşandin û rêzimanîbûna xwe ji dest dide (Sanya Cebaz Ebuzejd, 2013: 23):

107- **bazinê zêrî**

108- ***bazin zêrî**

Ji encama ladana morfema nivşê mê ya doxê xistineser gireyeke rêzimanî û pesenda watayî (bazinê zêrî) bo gireya nerêzimanî û nepesenda watayî (bazin zêrî) tê guherîn. Lewra ev nimûne ji her du layan ve dirust nîne. Gireya navî weku yek parçe (pêkvê) cihguherîna di risteyê de dike:

109- Wî **berhemê hozanvanî** li Diyarbekirê çap kir.

110- **Berhemê hozanvanî** wî li Diyarbekirê çap kir.

111- Wî li Diyarbekirê **berhemê hozanvanî** çap kir.

112- Wî li Diyarbekirê **berhemê hozanvanî** çap kir.

Her wiha hebûna morfema nivşê nêr “ê” di vê gireyê de, dibe egerê peydabûna peywendiya rêzimanî di navbera sereyê û diyarkerî de heye û her wiha ji layê watayê ve jî divê sere û diyarker, ku digel hev tên ji layê lojîkî ve ligel hev biguncin:

113-*Berhemê berî

Bi şêweyekî giştî morfemên nivşî di doxê xistîneser de, ji bilî diyarkirina nivşê navî wê peywendiya rêzimanî ya di navbera sere û diyarkerî de diyar dike û çawaniya rêzbûna “sere+morfemên xistîneser+diyarker” destnîşan dike û hindêk taybetmendiyên dî ji bo navî diyar dike (jimare, xwedî, nasîn), her wiha pesnî jî diyar dike (Segvan Cemîl Mihemed, 2008: 89).

Cureyên Xistîneser⁽⁷⁾

A) Xistînesera Xudaniyê (Xwedîtîyê)

Cureyê xistîneserê bi rêya desteya cihnavên serbixwe (min, te, wî/wê, me, we, wan) dirust dibe û dema cihnav diçe pal navekî û ev desteya cihnavan dibe diyarker û nav dibe sere û morfema nivşî rolê xistîneser di navbera sereyê û diyarkerî de dibîne:

114-Çavê te

Çav: Sere ye. Nav e

ê: m.xi

te: Diyarker e. Cihnava serbixwe ye.

Yan eger sere navekî giştî be û diyarker navekî taybetî yan cihnavê serbixwe be:

115-Kurê Nizarî

Kur: sere (navêkî giştî)

ê: m.xi

Nizar: diyarker (navêkî taybet)

116-Kurê min

Kur: sere (navêkî giştî)

ê: m.xi

min: diyarker(cihnava serbixwe)

⁷ Hindêk cureyên dî yên xistîneser hatîne diyarkirin: (karay, berkarî, parçedar, behay, jêder) bo pitir pêzanîn binêre: (Viyan Îbrahîm 'Êlî Îbo, 2015: 142-4).

Xistinesera Xudaniyê Du Cure ne:

1-Xudaniya Aşna

Ev gire ji layê watayê ve bo wan tiştan tê bikaranîn, ku parçeyek in ji xudanê xwe û jêkve nabin, peywendiyê lojîkî di navbera sereyê û diyarkerî de heye (Mihemed Merûf Fetah, 2010: 33):

117- Qewmê wî gotê: qet em serê te teslîm nakeyn (Cemîl Mihemed Şîlazî, 2006: 29).

Di nimûneya (117) de navê “ser” endamek e ji laşê mirovî. Lewra peywedîya lojîkî di navbera pêkhênên vê gireyê de (sere) parçeyek e ji diyarkerê “te”, û “ser” û “te” jêkve nabin.

2-Xudaniya Neaşna

“Ev gire bo wan tiştan tê bikaranîn ku parçeyek ji xudanê xwe nîne û pêkve nayên nasîn. Wate nenasyar in ji ber vê nîşana nasyariyê ligel tîn” (Mihemed Merûf Fetah, 2010: 34). Di vî cureyê dae sere û diyarker çî peywedîya pêkve nîne, bi tenê wataya wê xudaniyê bi rêya xistineser diyar dibe û sere pişkek ji diyarkerî nîne:

118-dergehê me

B) Xistinesera Zikmakî

Ev cureyê xistineser heman pêkhata xistinesera xudaniyê heye. Ku wate heman peywendîya di navbera diyarkerî û sereyê de heye di vî cureyê xistineseriyê de navê yekê bo navê duyan tê destnîşankirin û nabe navê yekê digel navekî dî bê:

119-barîna berxî

Di nimûneya (119) de “barîn” wek taybetmendiyeke zikmakî ye bo (berxî). Çunkî “ev her du nav di siruştî de pêkve girêdayî ne û çî nav neşên li cihê her duyan bîn” (Ebdulcebar Mistefa Me’rûf, 2005: 51).

120-*barîna şêrî

121-*qebqeba berxî

Di nimûneya (120) de “şêr” weku diyarker bo navê “barîn” hatiye, belê “barîn” dengê siruştî yê “şêrî” nîne. Lewra dibe hoyê nepesendiya watayê a vê gireyê û ev dibe eger ku bihayê diyarker di vî nimûneyê de wê bê kêmkirin

Bi heman şêweyî di nimûneya (121) de (“qebqeba berxî” bi vî rengî ye, bi tenê cudahî di navbera nimûneya borî de ev e ku diyarkerî (qebqeb) ev deng bi siruştê “berxî” ve ne girêdayî ye û yek ji taybetmendiyan wê nîne. Lewra bi

heman şêweyî ji layê watayê ve nepesend e, belê her du gire ji layê rêzimanî ve pesend in.

C) Xistinesera Taybet

Ev cureyê xistineserê wekî xistinesera xudanî ya neaşna ye, navê diyarkirî navekî giştî ye û navê diyarker navekî taybetî ye, yek ji taybetmendiyên vê xistineserê ew e ku navê diyarker û diyarkirî ji layê watayî ve pêkve girêdayî ne:

122-bajarê Dihokê

123-Çiyayê Cûdî

124-Rûbarê Xabîrî

Di nimûneyên (122), (123), (124) de navên Dihok, Cûdî û Xabîr her sê navên nasyar û taybetî ne û dibin diyarker bo navên bajêr, çiya û rûbar, ku ev nav di bineret de giştî ne û di gireyê de diyarkirî ne û ev navên diyarkirî bi rêya navên taybetî tên destnîşankirin û ev destnîşankirin bi rêya morfema nivîşî tê derbirin û dibe ji cureyê xistinesera taybet.

D) Xistinesera Wesfî

Ev cureyê sereyê hemî deman nav yan cihnav e û diyarker hevalnav e û sere çî navekî taybetî yan giştî be:

125-kurê zîrek

126-Bêrîvana ciwan

E) Xistinesera Paristeyê

Di vî cureyê xistineser de risteyek dibe diyarker bo pêkhêneke risteyeke dî (biker, berkar hwd) û ev cureyê xistineser di risteya aloz de heye:

127- Ew zelum ê ku ji bîstanî tê, xalê min e.

Ew zelum: g.n, bi

Ê: m.niv.nêre.d.xi

ku ji bîstanî tê: pariste (risteya nesereke ye)

Ew zelum xalê min e: şariste (risteya sereke ye)

Risteya “ku ji bîstanî tê” dibe diyarker bo gireya navî ya bikerî ya risteya sereke (şariste) û ev cure xistineser dibe diyarker bo “berkar rastewxo, berkar nerastewxo...”

2.3.2. Diyarker

Her weku di bendê yekê ji beşa duyem de çendîn cureyên diyarkeran bo gireya navî hatine diyarkirin û ji wan jî morfemên nivîşî ne, ku ev morfem di doxê çiyawaz

de (tiyan, gazîkirin, amajê) bi şeweyekî rastewxo digel navî tîn û dibine diyarkerên navî. Ku wate gireya navî ya sade ya nawik bi zêdekirina van morfeman bo gireya navî ya sade ya firehkirî tê guherîn. “Her wiha hatina morfemên rêzimanî yên navî weku nêr û mê, kom û nenasyarî, eger ligel navekî sade (rût) bîn dibêjin vê pîrosê berfirehkirina gireya navî ya ji nav de”(Hatim Wilya Mihemed, 2000: 36-40).

2.3.2.1. Doxê Tiyan

Celadet Alî Bedirxan amaje bi hindê dide ku di diyalekta kurmanciya serî de nav weku xwe namîne û li pêdiviyatiya cih û rolê navî formê navî tê guherîn (Celadet Alî Bedirxan, 2002: 57). Ku wate mebest ew e ku morfemên nivî li dumahiya navî li dûv cih û rolê wî navî tê, ew morfemên bo vê meremê di vê diyalektê de tîn bikaranîn û morfema nivîşê mê (ê) û nivîşê nêr (î) in. Ev morfem di asta gireyê de bi rolê berfirehkirina gireya navî ya sade ya nawik bo sadeya firehkirî radibe û dibe diyarker bo heman navî, ku digel hatiye:

128-Bêrîvanê

Ê: .m.niv.mê.d.t.dî

129-Karwanî

î.m.niv.nêr.d.t.dî

Ev morfem bi pêkhata ji nav de ya gireya navê tê hijmartin bi mercekî eger ligel wî navî bi tenê diyarkerek hebe û ew diyarker jî morfema nivîşî ya doxê tiyan be.

2.3.2.2. Doxê Amajeyê

Doxê amajeyê ew dox e ku di nav pêkhata gireya navî de heye ji encamê amajepêkirina kesekî yan tiştekî peyda dibe. Lewra em dê destpêkê amajeyê bi şeweyekî giştî di zimanî de diyar bikin, da ku têgehê vî doxî xuya be.

Amaje di zimanî de mebest pê ew e ku amaje bi kesekî yan tiştekî nêzîk yan dûr bê kirin ji layê zimanî ve çî kit yan kom be û ji layê nivîşî ve (siruştî û rêzimanî) nêr yan mê be. Di govera Behdînî de ev hevalnavên amajê bi kar tîn:

Bo nêzîk: ev ... e

Bo duyr: ew ... a / ê he

Andrew Radford derbarê amajeyê de dibêje: “Amaje wek keresteyekî bo amajekirina sereyê gireyê bi kar tê. Wate dema derketina wan weku diyarkerî amaje bi kereste û kesekî diyarkirî dike”(Hikmet Resûl Ehmed,

2010: 92) Ebdalwahab Xalid dibêje: “Amaje di kirmanciya serî de ji bilî ku rolê amajê dibîne navê diyarkerî weku navekî nasyar xuya dike, çunkî di vê diyalektê de nîşana taybetî bi nasyariyê ve nîne (‘Ebdihewab Xalid Mûsî, 2009: 126) Weku xuya ye bo hevalnava amajeya dûr nîşanên nivîşî têne bikaranîn û ev nîşan di gireya navî da rolê diyarkerî dibîne, ku wate bi vê awayî:

130-Ew baxçê he

“ew ... he” hevalnava amajeyê bo dûr û diyarkerê berî sere ye

“baxçe” navê giştî yê sere

“ê” morfema nivîşê nêre doxê amajeyê, diyarker

131-Ew dara he

“ew ... he” hevalnava amajeyê bo dûr û diyarkerê berî sere

“dar” navê giştî yê sere

“a” morfema nivîşê mê ye doxê amajeyê da, diyarker

Morfemên doxê amajeyê “a” bo nivîşê mê û “ê” bo nêr bi kar tên.

Her wekî di serî de me diyar kir, hevalnava amajeyê bi şêweyekî giştî ji du parçeyan pêk tê û yek ji taybetmendiyan axêverên vê goverê di bikaranîna hevalnava amajeyê weku parçeya yekê ji hevalnava amajê bo sivik gotinê hindêk caran ladan:

132-Qutabxana he

Di nimûneya (132) de parçeyê yekê ya hevalnava amajeya dûr e (ew) hatiye ladan, belê parçeyê duyem (he) hebûna hevalnava amajeyê diselmîne. Her wiha hebûna morfema nivîşî (a) di vî doxî de amaje ye bo hebûna hevalnava amajeya dûr, ku ligel navê nivîşê mê bi kar hatiye. Morfemên nivîşî, ku ligel hevalnava amajeyê bo dûr tên bikaranîn ji layê şêweyî ve her weku morfemên nivîşî yên xistineser in. Belê rolê wan û hatina van morfeman (amaje, xistineser) dibin xalên ji hevdu cudakirina wan:

1- Rolê morfemên xistineser dirustkirina peywedîya rêzimanî di navbera sere û diyarkerî de ye. Belê morfemên nivîşî digel hevalnava amajeyê dibin diyarker.

2-Hatina morfemên xistineser dikevin di navbera sereyê û diyarkerî yan sere û çend diyarkeran de, belê morfemên nivîşî doxê amaje diçin pêşîya parçeyê duyem yê hevalnava amajeyê:

133-Kilîl	a	dergehî
↓	↓	↓
Se	m.x.niv.mê	dî

134-Kilîl a dergeh ê qesr a mezin
 ↓ ↓ ↓ ↓ ↓ ↓ ↓
 Se m.x.niv.mê dî m.x.niv.nêr dî m.x.niv.mê dî

135-Ew dasa he

Das: sere

A: m.niv.mê.d.am

ew... he: diyarker e, her du parçeyên hevalnava amajeyê ye

136-Ew nujdarê he

nujdar: sere

ê: m.niv.nêr.d.am

ew... he: diyarker e, her du parçeyên hevalnava amajeyê ye

3- Morfema xistineser her dem divê li pêşiya wê, navek yan cihnavêk hebe ku sere ye û sere ligel nayê ladan. Çunkî dibe egerê dirustbûna gireyeke nerêzimanî. Belê morfema nivêşe doxê amaje sere digel tê ladan yan jî parçeyê yekê ji hevalnava amajeyê tê ladan. Belê her gireyeke rêzimanî ye:

137-Baxç ê zarokan
 ↓ ↓ ↓
 Se m.x.nêr dî

138-Pencer a qutabxan ê
 ↓ ↓ ↓ ↓
 Se m.xi.mê dî dî

139- *ê zarokan

140- *a qutabxanê

141-Ew_a he

A: m.niv.mê.d.am

ew... he: Her du parçeyên hevalnava amajeyê

142-Kiça he
 ↓ ↓
 Se parçeyê duyê ji hevalnava amajeyê

143- **Wa he** ronahiyeka tirumbêlaye, belku ew bit ('Ismet Mihemed Bedel, 2006: 75).

Wa he
 ↓ ↓
 M.niv.mê.d.am parçeyê duyê ji hevalnava amajeyê

144-Ya he
↓ ↓
M.niv.mê.d.am parçeyê duyê ji hevalnava amajeyê

145-Kurê he
↓ ↓
Se parçeyê duyê ji hevalnava amajeyê

146- Vêcar evî kça **wêhe** revanid û **wêhe** dikana yê dî neqeb kir û şelanid (Cemîl Mihemed Şîlazî, 2006: 12).

Wê he
↓ ↓
M.niv.nêr.d.am parçeyê duyê ji hevalnava amajeyê

147-Yê he
↓ ↓
M.niv.nêr.d.am parçeyê duyê ji hevalnava amajeyê

4-Morfemên nivîşî yên doxê xistineser gireyê berfireh dikin bi rêya zêdekirina diyarkeran, belê morfemên nivîşî yên amajeyê neşên gireyê berfireh bikin:

148- Destê Kawey

Ê: m. niv.nêr.d.xi

149- Destê Kaweyê xalê te

ê: m. niv.nêr.d.xi

150-Ew rojnama he

A:m.niv. mê.d.am

151-*Ew rojnama he a mezin

A: m.niv. mê.d.am

Yek ji taybetiyên hevalnava amajeyê ew e ku ji du pirtan pêk tê. Yek dikeve berî navî û ya dî dikeve piştî navî. Ji layê hatina morfemên rêzimanî, morfemên nivîşî yê doxê: xistineser û tîyan ligel hevalnavên amajeyê tên (K.K. Kurdojev, 1984: 149).

152- Vî karek encam da.

153- Ewê he karek encam da.

Di nimûneya jimareya (152) de (vî) gireyeke navî ye ku ji hevalnava amajeyê bo nêzîk (ev ... e) û navekî (☞) û nîşana nivşê nêr bo doxê tiyan pêk tê. Di nimûneya jimareya (153) de (ewê he) gireyeke navî ye û ji hevalnava amajeyê bo dûr (ew ... he) û navekî (☞) û nîşana nivşê nêr bo doxê amajeyê pêk tê.

Nivîserî diyar kiriye ku morfemên doxê xistineser ligel vî hevalnava amajeyê tên. Her weku di nimûneya duyê de me daye diyarkirin ku ew morfem ji layê şêweyî ve weku morfema xistineser e ku bo nivşê nêr bi kar tê, belê ji layê erk û hatina wan ve ji hev cuda ne. “Hevalnava amajeyê gelek caran di rûyê sere de nav (sere) ligel dernakeve, belê di rûyê ji nav de hebûna xwe heye” (Qeys Kakil Tufîq, 2002: 77). Her ji ber vê çendê morfema (☞) li cihê navî tê û dibe sere:

154- Ewê he

ew ... he: hevalnava amajeyê bo dûr, diyarker

☞: nav, sere

ê: m.niv.mê.d.am

2.3.2.3. Doxê Gazîkirinê

Gazîkirin ew sîstem e bo gazîkirina kesekî yan hişyarkirin ji karekî ku axêverî divê bigihîne guhdarî axêver vê sîstemê peyrew dike û di kurmanciya serî de ji bilî bikaranîna hindêk formên taybet bi rêya morfemên nivşî jî di pêkhata gireya navî de ev dox diyar dibe. “Di diyalekta kurmanciya serî de di doxê bangkirinê de cudahî di navbera nêr û mê de tê kirin. Eger regezê navî nêr be dê nîşana ‘o’ wergire, bele eger mê be dê nîşana ‘ê’ biçê ser navî” (Ewrehman Hacî Marif, 1979: 194).

Her weha morfemên gazîkirinê ji bilî diyarkirina doxê gazîkirinê bo navî di gireya navî de rolê diyarkerî jî dibîne û ev morfem dibin diyarkerên piştî navî, di navbera wan û sereyê de çî keresteyên di nayên û bi heman şêweyî morfema doxê tiyan gireya navî ya sade ya nawik bo gireya navî ya sade ya firehkirî diguhere yan jî weku pêkhata navda ya gireya navî bi rêya morfemên rêzimanî tên berfirehkirin:

155- Lew dinalim lew dikalim bilbilo .. Hêlîn herfit

Sed hizar hêlîn heriftin dijmino teheq kerfit (D. Bedirxan Sindî, 2002: 25).

Bilbilo/ dijmino: sere

o: m.niv.nêr.d.gazîkirinê.diyarker

156- Şîrînê xoşke agrî

Geşke wek babagurgurî (D. Bedirxan Sindî, 2002: 76).

Şîrîn: sere

ê: m.niv.mê.d.gazîkirinê.diyarker

2.3.3. Kopîkirin

Kopîkirin yek ji yasayên veguhastinê ye û kopîkirinê bo merema rêkkeftinê ji layê nivş, jimarê, kes ve di navbera sereyê û diyarkerî de li govera Behdînî ligel hevalnava amajeyê bo nêzîk û hevalnavê nasînê û hevalnavê jimarê tê (Baîzî Emerî, 2008: 44-5).

Kopîkirin di van rewşan de morfema nivşî ya doxê tiyan ku cihê wê yê bineretî li dumahiya navî tê, belê li dumahiya hevalnava amajeyê, nasînê û jimarê jî tî kopîkirin. Ku wate kopîkirin di vê goverê de ligel van hevalnavan tê, ew jî morfemên doxê tiyan li dumahiya gireya navî li dumahiya van hevalnavan jî tê kopîkirin. Sere bi rêya kopîkirinê sîmayên xwe yê kes û jimarê û nivşî li ser diyarkerê xwe hevalnava amajê, nasînê, jimarê ve disepîne (Viyân Slêman Hacî Slêvantî, 2001: 21). Her weku di van nimûneyan de tê xuyakirin:

157- Evî sofî eve sê axiftin bo min kirine mereq û êdî ez tehemulê nakem (Cemîl Mihemed Şêlazî, 2005: 26).

ev... e: hevalnava amajê bo nêzîk, diyarker

î: morfema nivşê nêr, kopîkirin

sofî: nav, sere

î: morfema nivşê nêr, doxê tiyan

158-Em vî şerî sera çî dikeyn (Cemîl Mihemed Şêlazî, 2006: 27).

ev... e: hevalnava amajê bo nêzîk, diyarker

î: morfema nivşê nêr, kopîkirin

şer: nav, sere

î: morfema nivşê nêr, doxê tiyan

159- Dar di eşqê da dibine komir

Belg jê diweryên

Dibêjî,

Vê maçê jî ... Vê jî (Selman Kuvilî, 2015: 47)

ev... e: hevalnava amajê bo nêzîk, diyarker

ê: morfema nivşê mê, kopîkirin

maç: nav, sere

ê: morfema nivşê mê, doxê tiyan

160-bîst û êkê adarê

bîstûêk: hevalnavê jimarê, diyarker

ê: morfema nivşê mê, kopîkirin

adar: nav, sere

ê: morfema nivşê mê, doxê tiyan

161-ewî hevalî

ew: hevalnavê nasîne, diyarker

î: morfema nivşê nêr, kopîkirin

heval: nav, sere

î: morfema nivşê nêr, doxê tiyan

Her weku di nimûneyên (157), (158), (159), (160), (161) de morfema nivşî ya doxê tiyan dema ku li dumahiya van hevalnavan tê kopîkirin, çî rolê xistineser yan diyarkerî nabîne, bi tenê hatina wê bo diyarkirina rêkkeftinê ji layê kes, nivş, jimareyê ve ye.

Hatina van morfeman di rewşa kopîkirinê de giringiya xwe heye. Çunkî egerê nehatina wan dibe egerê dirustkirina gireyeke nerêzimanî. Çunkî binemayê rêkeftina kes, jimare, nivş nehatiye peyrewkirin. Lewra giringiya vê rêkeftinê ew e ku peywendiya rêzimanî ya di navbera sereyê û diyarkerî xuya dike:

162-*ev dergehî

163-*bîst û êk adarê

164-*ew hevalî

2.3.4. Rolê Morfema Nivşî di Sînardarkirina Gireya Navî de

Pişî rolên morfemên nivşî di gireya navî de di vê vekolînê de me behs kir, ku ev morfem rolekî sereke di avakirina gireya navî de dibînin çî weku berfirehkirina gireya navî bi rêya xistineser, çî weku diyarker, ku rolî di berfirehkirina gireya navî de dibînin.

Li vir hindek pirs peyda dibin, ew jî ev in: Morfemên nivşî tenha rolî di nav pêkhata gireya navî de dibîne yan jî rolekî di jî ligel gireya navî dibîne bi taybetî di risteyê de? Çunkî her risteyek dişê ji gireyeke navî yan jî zêdetir pêk

bê. Di vê mijarê de tiştê giring ew e ka çawa sînorê her gireyekê tê destnîşankirin?
Gelo morfemên nivîştî jî rol di vê mijarê de heye?

Bo bersivdana van pirsên li serî em dişên bi vî şeweyî bidin diyarkirin ku morfemên xistineser bi şeweyekî giştî tenha rolê wê berfirehkirina gireyê ye û sînorê bi dumahîhatina gireyê destnîşan nake:

165- Aşna

166- Aşnaya xwişka Jîlayê

167- Aşnaya xwişka Jîlaya ciwan

Morfemên nivîştî, ku rolê diyarkeran di doxê amajê, tiyan û gazîkirinê de dibînin. Her weku di babetên berî niha de amaje pê hatiye dan xuya dibe ku ev morfem dema dibin diyarker li dumahiya gireya navî tînin. Ku wate sînorê dumahî hatina gireya navî destnîşan dikin û rolekî sereke di vê mijarê de heye:

168- ew kurê he

ew... he: hevalnava amajeyê bo dût, diyarker

kur: nav, sere

ê: morfema nivîştî nêr, doxê amajê

Her weku di şirovekirina vê gireya serî ya (168) de xuya dibe ku morfema nivîştî nêr (ê) rolê wê diyarker e di gireya navî de û li dumahiya vê gireyê hatiye. Belê yek ji taybetmendiyên hevalnava amajeyê ew e ku parçeyê duyê (he) bi yasayeke veguhastinê diçe dumahiya gireyê.

Em dişên vê gireyê bi rêya morfemên xistineser û hatina navî û hevalnavî berfireh bikin. Belê bi mercekê, ku her morfema nivîştî di vî doxê de li dawiya gireyê tê û ew berfirehkirin bi rêya xistineser her di nav sînorê vê gireyê de ye û vê morfemê derbas nake:

169-Ew kurê nujdarê he

Ew... he: hevalnava amajeyê bo dût

Kur: sere

Ê: morfema nivîştî nêr di doxê xistineser de

Nujdar: diyarker

Ê: morfema nivîştî nêr di doxê amajeyê de

170-Ew kurê nujdara he

Ew... he: hevalnava amajeyê bo dût

Kur: sere

Ê: morfema nivîştî nêr di doxê xistineser de

Nujdar: diyarker

A: morfema nivşê mê di doxê amajeyê de

Morfema doxê tiyan jî rolê diyarkerî dibîne û li dumahiya gireya navî tê. Ku wate sînore bi dumahî hatina gireyê destnîşan dike û dibe rêgir bo berfirehkirina gireyê. Belê em dişên her gireyeke ku bi morfema doxê tiyan dawî bê, wê morfemê labidin û morfema xistineser li cihê wê bi kar bînin û gireyê berfireh bikin:

171- Seyrana zankoyê

172- Seyrana zankoyê + a + Zaxo = seyrana zankoya Zaxo

Morfemên nivşî di doxê gazîkirinê de weku morfemên doxê amajeyê û tiyan dibin diyarker. Ev morfem sînore bi dumahî hatina gireya navî destnîşan dike. Belê bo berfirehkirina gireyê digel hatina vê morfemê karekî giran e li ser zimanê axêverî. Eger heman gire jî bê berfirehkirin morfema doxê gazîkirinê tê ladan û gazîkirin bi rêya morfemê nayê derbirîn tenha li dûv şêwazê risteyê gazîkirin tê derbirîn:

173-hejaro, were.

174-*hejar + ê + zîrek + o +were.

2.4. Rolê Morfemên Nivşî di Sentaksê de

2.4.1. Sîstemên Doxî

Dox diyardeyeke cîhanî ye û di hemî zimanan de heye. Eger bi şêweyekî berçav yan ku bê nîşane be, dibêjin doxî vî zimanî doxê abstrakt e û gelek sîstemên doxî di zimanan de hene û her zimanek li dûv taybetmendiyên wî zimanî doxekî yan çend doxan peyrew diken. Her yek ji van doxan sîstemeke cuda ji doxên dî hene ji wan doxên berbelav:

A) Sîstema Nomînatîv-Akuzatîv

Ev sîstem wan zimanan bi xwe ve digire ku bikerê karê teneper û bikerê karê teper nîşanên doxî wernagirin û berkarê karê teper nîşana doxî werdigire. Wate bikerê karê teneper û bikerê karê teper doxê nomînatîv û berkar doxê akuzatîv werdigire û 93 zimanên cîhanî ji vê sîstemê ne û bi şêweyekî giştî di hemî cîhanê de berbelav e û di zimanê îngilîzî û 'erebî û latînî hwd. de heye:

175-He came.

↓
S

176-He will see him.



O



A

177-Zêrevan revî.



S

178-Zêrevan pirtûkê dê helgirit



A



O

B) Sîstema Ergatîv-Absolutîv

Di vê sîstemê de bikerê karê têneper û berkar doxê absolutîv werdigirin û bikerê karê têper doxê ergatîv werdigire. Wate bikerê karê têneper û berkar nîşanên morfolojîk wernagirin, lê belê bikerê karê têper nîşanên morfolojîk werdigirin. Di zimanê hîndî, îranî, kurdî, pencabî û peştûyî hwd. de ev sîstem heye.

179-Gavan nivist.



S

180-Wî gavan dît.



O

181-Gavanî av rişt.



A

C) Sîstema Notral

Bikerê karê têneper û bikerê karê têper û berkar bi yek şeweyî derdikevin û heman nîşanên doxî werdigirin û ev sîstema doxî li başûrê rojhilata asya û di îngilîzî de heye.

182-The bus is coming.



S

183-The bus hit the buy.



A

184-I saw the bus.



D) Sîstema Sêlayan

Ev sîstem di wan zimanan de tê bikaranîn ku bikerê karê têneper û bikerê karê têper û berkar her yek ji wan bi nîşanên ji hev cuda derdikevin û ev sîstem li başûrê Afrîqayê û rojavayê Awistralyayê heye (Mizgîn Ebdulrehman Ehmed, 2006: 23-4).

E) Sîstema Kêmbaw

Bikerê karê têper û berkar bi yek şêweyî nîşanên morfolojîk werdigirin belê bikerê karê têneper bi şêweyekî cuda nîşanê werdigire. Ev sîstem di zimanê rûsî û îranî de tê dîtin, belê di demên borî de (Comrie, 1981: 118).

2.4.1.1. Ergatîv û Cureyên Wê

Ergatîv ew zarav e di zimanvaniyê de, bi taybetî di zanistê polînkirina zimanî de [language typology] bi kar tê. Peyva ergatîv ji navê *ergates* ê yewnanî hatiye, ku bi wateya “karker” yan encamderê karî tê (Mizgîn Ebdulrehman Ehmed, 2006: 5). Bi şêweyekî giştî eger di nava risteyê de kesek yan tiştek karekî encam bidin dibêjin vî encamderê karî biker (kara).

Ergatîv doxekî rêzimanî ye ku peywendî bi bikerê karên borî yê têper ve heye. Di vê pêkhata ergatîvê de biker (kara) di doxê nekara de ye û berkar di doxê kara derdikeve (Mizgîn Ebdulrehman Ehmed, 2006: 5):

185- şivanî dengê muzîkê bihîst.

Di vê nimûnê da bikerê ristê "şivan" di doxê nakara da ye û berkarê risteyê "dengê muzîkê" di doxê kara da ye.

Cureyên ergatîvê:

- 1- Ergatîva morfolojî
- 2- Ergatîva sentaksî
- 3- Ergatîva qlîşaw

A) Ergatîva Morfolojî

“Merem ji ergatîva morfolojî ew e ku ji layê morfolojiyê ve bikerê karê têneper û berkar heman nîşanên doxê morfolojî (eger nîşane hebin) werdigirin

berovajî bikerê karê têper” (Viyan Îbrahîm ‘Elî Îbo, 2015: 58). Sîstema ergatîvê di kurmanciya serî de bi rêya nîşanên doxî û rêkkeftina karî ligel bikerî û berkarî tê diyarkirin:

186- Kawe hat.

↓ ↓
bi k.bu.têne

187- Aryanî Kawe bo qutabxanê bir.

↓ ↓ ↓
bi ber k.bu.tê

Di risteya jimare (186) de karê risteyê borîyê têneper e û bikerê risteyê çî nîşanên (morfemên) rêzimanî wernagire. Ku wate biker di doxê absolutîv de ye û biker digel karî ji layê kes û jimarê ve rêk dikeve.

Di risteya (187) de karê ristê borîyê têper e û berkarê risteyê hîç morfemên rêzimanî wernagire. Ku wate heman doxê bikerê karê têneper absolutîv werdigire û ji layê rêkkeftinê ve jî berkar û kar ji layê kes û jimarê ve rêk dikevin. Belê bikerê karê têper (aryan) morfema rêzimanî ya nivşê nêr (î) wergirtiye û ev çend diyar dike ku sîstema ergatîv hem bi rêya rêkkeftinê û hem bi rêya morfemên nivşî xuya dibe.

B) Ergatîva Sentaksî

Ew cureyê ergatîvê ye ku dema pêkhêneke risteyê di risteya lêkdayî de bê ladan (jêbirin) bi mercekî ku gireyêke navî di her du laristan de pişkdariyê bike û gireya navî di risteya duyê de tê jêbirin (ladan). Dîkson derbarê ergatîva sentaksî de diyar dike “eger di pêkhata risteya lêkdayî de biker û berkar heman reftar hebe û bikerê karê têper ji wan cuda be, ew ziman bi zimanê ergatîva sentaksî tê nasîn” (Viyan Îbrahîm ‘Elî Îbo, 2015: 59).

188- Karwanî mêhvan gehand û hateve.

189- Azadî nan xwar û Aramî nexwar.

190- Wî dergehê me çêkir û dergehê wan jî.

Di risteya (188) de diyar dibe ku bikerê risteya duyê hatiye ladan (jêbirin) ew jî “Karwan” e .Di risteya (189) de berkarê duyê (nan) ya di risteya lêkdayî de hatiye ladan. Di risteya (190) de bikerê “wî” û karê “çêkir” yên risteya duyê hatine ladan. Eger em binêrin li her sê risteyan, ku (biker) û (berkar) û (biker, kar) hatine ladan, wate di kurmanciya serî de ergatîva sentaksî heye.

C) Ergatîva Qilîşaw

“Ergatîva qilîşaw ew ergatîv e ku hindek taybetmendiyên sîstema ergatîvî tê de bin û hindek taybetmendiyên akuzatîvî tê de bin” (Barwarî M.S., 2004: 88) . Ergatîva qilîşaw çêdibe ji layê morfolojîyê ve qilîşaw be yan ji layê sentaksî ve (Ura, 2000: 187-190). Wate di govera Behdînî de her du sîstem tên bikaranîn. Di sîstemq akuzatîvî de bo tafê niha û bê, berkar morfemên nivîşî werdigire. Belê sîstema ergatîvî bo tafê borî tê bikaranîn û biker morfemên nivîşî werdigire:

191-Nesrîn gulê av didet.

↓ ↓ ↓
bi ber ta.niho

192-Rezvan rezî dikezêxit.

↓ ↓ ↓
bi ber ta.dihêt

193-Çîroknivîsî çîrok xwand.

↓ ↓ ↓
bi ber ta.bu

194-Dadwerî tawanbar siza da.

↓ ↓ ↓
bi ber ta.bu

Di risteyên (191), (192) de bikerên her du risteyan (nesrîn) û (rezvan) doxê absolutîv û berkarê her du risteyan (gulê) û (rezî) doxê akuzatîv wergirtine û karên “avdidet” bo tafê niha û “dikezêxit” bo tafê bê neboriyê têper in. Di risteyên (193), (194) de karên her du risteyan boriyê têper in û bikerên her du risteyan “çîroknivîsî” û “dadwerî” doxê ergatîv û berkarê heman risteyan “çîrok” û “tawanbar” doxê absolutîv wergirtine.

2.4.1.2. Doxê Nomînatîv û Doxê Absolutîv

Pitirya zimanên cîhanî doxên nomînatîv û absolutîv wekî hev in yan her du dox bê nîşanên morfolojî xuya dibin (Holguin, 2007: 32). Zimannas diyar dikin ku ev her du dox doxê bikerê karê têper û bikerê karê teneper çî nîşanên rêzimanî ligel nayên. Ku wate di destnîşankirina wan de nebûna vê nîşanê dibe amajepêker bo diyarkirina van doxan.

Di zimanê kurdî de li dûv taybetmendiya karê risteyê tafê wê hindex gire bi nîşane û hindex jî bînîşane derdikevin .Di doxê nomînatîv de bikerê karê têper di tafê niha û bê de çi morfemên nivîşî yê taybet bi doxê bikerî ve wernagire:

195- Hişyar kutrê difrînit.

↓ ↓
bi. (d.no) ta.nihoyê.tê

196- Zinar avê dêresînit.

↓ ↓
bi (d.no) ta.dihêtê.tê

Di risteyên (195), (196) de gireyên bikerî (hişyar, zinar) di doxê nomînatîv de ne û çi morfemên nivîşê nêr wernegirtine .Doxê absolutîv jî weku doxê nomînatîv ew gireya navî ya ku çi nîşanan wernagire û di zimanê kurdî de ev dox çi morfemên nivîşî wernagire û ev dox digel bikerê karê teneper di tafê borî û neborî de û berkarê karê têper di tafê borî de heye:

197- Diyar revî.

↓ ↓
bi(d.ebs) ta.bu.têne

198- Şîlan dê revit.

↓ ↓
bi(d.ebs) k.nebu.dihêtê.têne

199- Pirjîn direvit .

↓ ↓
bi(d.ebs) k.nebu.nihoyê.têne

200- Diyarî pênûs kirî.

↓ ↓
Ber.(d.ebs) k.bu.tê

Di risteyên (197), (198), (199) de gireyên navî yê bikerî (diyar, şîlan, pirjîn) û di risteya (200) gireya navî ya berkar (pênûs) di doxê absolutîv de ne çi morfemên nivîşê nêr, mê wernegirtine.

2.4.1.3. Doxê Ergatîv û Doxê Akuzatîv

Ev her du dox di zimanê kurdî de nîşanên morfolojî werdigirin û hindex zimannas van her du doxan bi doxê tiyan bi nav dibin. Çunkî ev dox heman nîşanên doxî ji layê morfolojîyê ve werdigirin. Bi taybetî di zimanê kurdî de, zimannasên kurd

wisa dihesibînin, çunkî bi boçûna wan doxê ergatîv, akuzatîv û tiyan heman nîşanên morfolojî werdigirin (Viyan Êbrahîm ‘Elî Îbo, 2015: 64). Bo nimûne di doxê ergatîvî de biker nîşana “î” bo nivşê nêr û “ê” bo nivşê mê ye û di doxê akuzatîvî (berkar) û doxê tiyan de nîşanên nêr û mê heman nîşanên doxê ergatîvî werdigirin:

201-Rustemî agirî helkir.



m.niv.nêr.d.êr (bi)

202-Rewşenê av vexwar.



m.niv.mê.d.êr (bi)

203-Rustem agirî heldiket.



m.niv.nêr.d.ek (ber)

204-Rewşen avê dêvexot.



m.niv.mê.d.ek (ber)

205-Rustem bi agirî mir.



m.niv.nêr.d.t

206-Rewşen di avê da xendiqî.



m.niv.mê.d.t

Eger em binêrîn li risteyên (201), (202), (203), (204), (205), (206) em dibînin ku doxê ergatîv, akuzatîv û tiyan heman nîşanên morfolojî bo nivşê nêr û mê wergirtine. Lewra em dişên van doxan bi doxê tiyan bi nav bikin.



2.4.2. Rolê Morfemên Nivşî di Destnîşankirina Doxî di Zimanê Kurdî de

Zimanvanan amaje bi gelek sîstemên doxî kirine. Lewra ew sîstemên ku di zimanî de bi rêya nîşanan tên destnîşankirin, ew sîstemên doxî di zimanê kurdî de (govera Behdînî) hene, em dê amaje bi wan sîsteman bikin ku bi rêya morfemên nivşî tên diyarkirin.


2.4.2.1. Doxê Tiyan

Doxê tiyan bi doxê nerastewxo di zimanê kurdî de tê nasîn. Ev dox bi nîşanên morfolojî di zimanê kurdî de bi rêya morfemên nivîşî û komkirinê tê destnîşankirin û di gelek jêderan de li ser çend cureyan hatiye diyarkirin bi navên doxê bikerî, berkar. Her wiha ligel hevalkaran jî û berkarê nerastewxo jî ev nîşane tên dîtin bi mercekî ku hevalkar û berkarê nerastewxo divê ji cureyên gireya pêşnavî (bend) bin.


Doxê bikerî û berkar li dûv taf û hêza karê têper, teneper tê diyarkirin. Ku wate kar van her du doxan (bikerî, berkar) dide Pêkhênên risteyê (biker, berkar), her wiha pêşnav di zimanê kurdî de doxê tiyan dide wê gireya navî ya ku di dûv de tê (Viyan Silêman Hacî: 2009: 124):




210-Ew ji mal ê derkefit.



211-Wan konfiransê me bo spêd ê paş êxist.




212-Em weku barov ê hatîn.




2.4.2.2. Doxê Akuzatîv

Ev cureyê sîstemê di tafê niha û bê de digel berkarê karê têper tê dîtin û doxê tiyan werdigire û ev dox bi rêya nîşanên morfolojî “î” bo nivşê nêr û “ê” bo nivşê mê tê bikaranîn (Barwari M.S, 2004, 92-93).

213-Nivîser govar ê dikirit.



214-Mamoste dergeh î dêgirit .



Her çend ev her du risteyên (213), (214) ji layê tafê karî ve ji hev cuda ne (tafê niha, tafê bê), belê di gireyên navî de (govarê, dergehî) rolê berkarî dibînin û van her du gireyan nîşanên rêzimanî yê nivî wergirtine û ev nîşane di zimanî de dibin egerê destnîşankirina berkar di risteyan de, her ji ber vê taybetmendiye hindek zimannas dibêjine vê sîstemê doxê berkarî.

Di sîstema akuzatîv de rêkkestin di navbera bikerî û karê neborî yê têper de ye û biker doxê absolutîv werdigire, wate bikerê risteyê nîşanên morfolojî wernagire.

Ev xişta li xwarê nîşanên doxê akuzatîvî (berkarî) li dûv nivîşê nêr û mê di govera Behdîni de diyar dîke:


Nîşanên doxê akuzatîvî (berkarî)		Tafê karî
Nivîşê mê	Nivîşê nêr	
Ê	Î	Tafê niha û bê têper
⊗	⊗	Tafê borî yê têper

2.4.2.3. Doxê Ergatîvî


Yek ji taybetmendiyan kurmanciya serî ew e ku ev diyalekt bi sîstemê ergatîva qilişaw [split ergativ] tê nasîn, ku di vê sîstemê de gireyên navî (biker) nîşanên morfolojî werdigirin. Ku wate wan zimanan bi xwe ve digirt ku hem taybetmendiyan sîstema ergatîvî û hem taybetmendiyan akuzatîvî hene.

Di vê mijarê de em giringiyê bi ergatîva morfolojî didin. Çunkî ev cureyê ergatîvê bi rêyên morfemên nivî têne destnîşankirin bi mercekî ku divê kar ji layê hêzê ve têper be û ji layê tafi ve borî (nêzîk, dûr, tamam, berdewam) be û bo nivîşê nêr nîşana “î” û nivîşê mê “ê” werdigire (Barwari M.S., 2004: 88):


215-Darvan î dar birîn.



216- Soltan î 'elî îna kuçkê û gotê (Cemîl Mihemed Şêlazî, 2005: 31).



217-Hêlîn ê hesp bezandibû (dibezand).



Rêkkeftin digel sîstema ergatîvî di navbera berkar û karî de ye û berkarê risteyê dê doxê absolutîv wergire, yan hîç nîşanên morfolojî wernagire.

Ev xişta li xwarê nîşanên doxê ergatîvî (bikerî) li dûv nivşê nêr û mê di govera Behdînî de diyar dike:

Nîşanên doxê ergatîvî (bikerî)		Tafê karî
Nivşê mê	Nivşê nêr	
Ê	Î	Tafê borî yê têper
∅	∅	Tafê borî yê têneper
∅	∅	Tafê niha û bê têper û têneper

2.5. Rolê Morfemên Nivşî Di Diyarkirina Rûkaran de

Karî çend taybetmendî û sîma hene, lewra kar ji gelek layan ve tê destnîşankirin wek ji layê hêzê (têper, têneper), hebûnê (hêz û bêhêz), tafî (borî, niha, bê), rêjeyê (ragehandin, mercî, fermanî) û ji layê rûkarî ve (berdewam, tamam, dûr). Her wiha şeweyê erê û nerê, ku ev taybetmendî bi rêya morfemên rêzimanî tên diyarkirin.

Morfemên nivşî di sentaksa govera Behdînî de ya diyalekta serî ji bilî diyarkirina doxî, her wiha bi rolê diyarkirina cureyê karî radibe, bo nimûne di diyarkirina cureyê rûkaran de weku rûkara berdewam û tamam.

Di vî bendî de em dê ronahiyê bidinde ser mijara diyarkirina cureyên karî ji layê morfemên nivşî ve.

2.5.1. Pênaseya Rûkaran (Espêktan)

Rûkar ew kategorî ye ya bûyer yan rewş yan kirineke destnîşankirina karî diyar dike ka tamam bûye yan hê maye (berdewam) e (Katamba, F., 1993: 221). “Rûkar kategoriyeke bo saloxdana (karan) bi kar tê, ku amaje bo wê domdariya karîgerî ya karî derdibire û giring e ji tafî bê cudakirin, ku berî her tiştî pîtey giringî bi qonaxên demî dide” (Fincih, G. 2000: 85).

218-Nazdarê derman **dianîn** .



Tafê boriyê berdewam

219-Nazdarê derman **înavne** .



Tafê boriyê tamam

220-Nazdarê derman **înabûn**.



Tafê boriyê dûr

221-Nazdarê derman **dînit** .



Tafê niho

222-Nazdarê derman **dêint** .



Tafê dihêt

Rûkar bi du şêweyan di govera Behdînî de diyar dibin. Ew jî rûkara morfolojî û rûkara sentaksî ne. Ev her du cureyên rûkaran (berdewam, tamam) bi rêya morfolojî û sentaksî diyar dibin. Lewra di vî bendî de pirtir giringî bi rûkara sentaksî tê dan.

2.5.1.1. Destnîşankirina Rûkara Berdewamiyê


Ev cureyê rûkarê, berdewamiya bûyeran yan encamdana karî diyar dike çi kar ji layê tafî ve borî yan niha be.

Rûkara berdewamiyê bi du şêweyan e:



1- Morfolojî

2- Sentaksî



Rûkara berdewamiya morfolojî morfema “di”, ligel karê boriyê têper, têneper yê rêjeya ragiehandinê tê:



Rûkara sentaksî bi rêya morfemên nivîşî di vê goverê de derdikeve ew jî ligel karê tafê niha, kar çi têper, têneper be di rêjeya ragiehandinê de (Sanya Cebar ‘Ebûzîd, 2007: 45-8).



226- Çwîçikêt di ser quba babê min ra diçin ezê perêt wan diqusînîm (Cemîl Mihemed Şîlazî, 2006: 17).



Di nimûneyên (224), (226) de karên “divehînt”, “diqusînîm” têper in û ji layê tafî ve tafê niha ne û di rêjeya ragihandinê de ne. Bi tenê cudahî di navbera bikerê wan e, ku ji layê nivşî ve ji hev cuda ne. Lewra carekê bikerê risteyê “Peyman” morfema nivşê mê (a) û bikerê risteyê “ez” morfema nivşê nêr (ê) wergirtiye û di risteyên (225), (227) de karên “ditirse”, “dihêt” karên têneper in û bikerên wan li gor nivşê wan, morfemên nivşî wergirtine.

Kar di risteyên (224), (225), (226), (227) de bi tenê derbirînê ji tafê niha yê rêjeya ragihandinê nake. Çunkî bi zêdekirina morfemên nivşî ligel bikerî (mê, nêr) kar dişê derbirînê ji rûkara berdewamiyê bike. Ev rûkar ji layê Qanatê Kurdo ve jî amaje pê hatiye dan bi navê “doxê niha yê berçavan”. Ezê dixunim... Reşîtê tê mal (yanê jî Reşît wê tê mal). (Qanadê Kurdo, 1981: 78).

Gelo van morfemên nivşî peywendî bi pêkhata gireyê ve heye yan ne? Bo bersivdana vê pirsê eger di risteyên (224), (225), (226), (227) de gireya navî ya bikerî jî bê ladan morfema nivşê nêr, mê çi guherîn li ser nayê kirin û weku xwe dimînin û di risteyê de derdikevin:



230- Yê perêt wan dîqusînim.

↓ ↓
m.niv.nêr m.ta.niho

231- Yê dihêt û diçit, yê radiwestit ('Ismet Mihemed Bedel, 2006: 40).

↓ ↓
m.niv.nêr m.ta.niho

Ji nimûneyên (228), (229), (230), (231) de xuya dibe ku van morfeman çi peywendî bi pêkhata gireyê ya “Peyman”, “Aryan” ve nîne, bi tenê hatina van morfeman ji layê rêkkeftina nivîşî, jimarî, kesî ve li gor bikerî tê, eger bikerê mê be morfema nivîşê mê diçe ligel gireya bikerî û eger nêr be morfema nivîşê nêr diçe ligel gireya bikerî.

Şêweyê derbirîna vê rûkarê di vê goverê de taybetmendiya xwe heye, ku dîsa bi tenê di şêweyê erê yê risteyê de derdikeve û ligel şêweyê pirsyarî û nerê dernakeve:

232- *Peymana kezya xwe **navehînit**.

233- *Peymana **natirsit**.

234- *Aryanê yarîyê **naket**.

235- *Aryanê **nazivirit**.

236- ***Erê** peymana kezîya xwe divehînit?

237- ***Bo çî** Aryanê yarîyê diket?

Ku wate van morfeman peywendî bi karê risteyê ve heye belê di risteyên (232-237) pirsyarî û nerê de morfemên nivîşê (nêr, mê) digel karê neborî yê tafê niha de dernakeve.

Rêkkeftin di tafê niha de di navbera bikerî û karî de ye. Her wiha hatina morfema nivîşî, ku rûkara berdewamiyê ya sentaksî derdibire, ligel gireya navî ya bikerî derdikeve. Ku wate hatina morfema nivîşî bo diyarkirina rûkara berdewamiyê peywendî bi rêkkeftinê biker û karî ve heye, çunkî ev morfem naçe li ser gireya navî ya berkarî.

2.5.1.2. Destnîşankirina Rûkara Temamiyê

Ev cureyê rûkarê ye ku bûyer û encamdana karî ji layê domdariyê ve diyar dike. Ku wate ew karê ku ev rûkar ligel tê xuyakirin, di dema borî de hatiye rûdan û encamdan, belê hêsta ev kiryar bi dawî nehatiye karîgeriya wê hêsta maye (Sanya

Cebar ‘Ebûzeyd, 2007: 62). Ku wate rûkarê temamiyê derbirînê ji karekî dike ku di tafê borî de hatiye encamdan û heta niha ew encam pêşçav e.

Rûkara temamiyê digel karê borî yê rêjeya ragihandinê tê û kar çi têper, çi têneper be, rûkara temamiyê bi her du şêweyan (morfolojî, sentaksî) tê derbirîn û rûkarê morfolojî morfema rêzimanî ya taybet heye û ev morfem “î... e” ye:

238-Ez hatîme.

hatîme: Karê têneper e, tafê borî ye, rêjeya ragihandinê, şêweyê erê.

î... e: Morfema rûkara temamiyê.

m: Cihnavê rêkkeftinê ye.

239-Min hûn nedîtîne.


nedîtîne: Karê têper e, tafê borî ye, rêjeya ragihandinê, şêweyê nerê.

î... e: Morfema rûkara temamiyê.

n: cihnavê rêkkeftinê ye.

Rûkara temamiyê di vê goverê de bi rêya sentaksî jî tê derbirîn. Bi şêweyekî berbelav di axaftina rojane de tê gotin û dibe yek ji taybetmendiyanê vê goverê, ku bi şêweyekî berçav morfemên nivîşî ji bilî diyarkirina rolê xistineser û doxî, rolê rûkara temamiyê jî dibîne û ew morfemên rêzimanî yên ku bo rûkara temamiya sentaksê bi kar tên form û şêwe lihevçûnek di navbera wan û morfemên xistineser de heye. “a, ya” bo nivîşê mê û “ê, yê” bo nivîşê nêr bi kar tên û di risteyan de digel karê tafê borî yê rêjeya ragihandinê bi şêweyê erê derdikeve:

240-Zarok yê nivist î.



rûkara temamiyê bi rêya sentaksî

Di nimûneya (240) de morfemên nivîşê nêr “yê” ligel gireya navî “zarok” hatiye, belê çi peywendiyên rêzimanî bi vê gireyê ve nîne. Çunkî “yê” nîşana doxê xistneser, tiyan, gazîkirinê nîne, lewra eger navê “zarok” jî bê jêbirin (ladan) her heman nîşane di risteyê de derdikeve. Belê nîşanên xistneser, tiyan, gazîkirinê digel jêbirina gireya navî di risteyê de namîne:

241-Xatîne! Were!

242-*Ê! Were!

243-Zarokê ciwan hat.


244-*Ê hat.

245-Nesrîn zarokê dinivînit.

246-*Nesrîn ê dinivînit.

Ku wate ev morfem taybet bi gireya navî ve nîne, belku bi risteyê û bi taybetî bi karê risteyê ve girêdayî ye û yek ji taybetmendiyên karî ye. Ev morfema nivîşî ligel pirta yekê ya morfema temamiyê bi hev re rûkara sentaksî derdibirin û divê kar di şeweyê erê de be, di şeweyê nerê û pirsiyarê de dîsa ew rûkara sentaksî bo ya morfolojî tê guherîn:

247- Keremî cigare ya kêşay.



248-*Erê keremî cigare ya kêşay?


249-*Keremî cigare ne ya kêşay.

250- Erê keremî cigare kêşaye?


251- Keremî cigare ne nekêşaye.

Eger karê borî yê teneper be wê demê dê morfema nivîşî, ku rolê rûkara temamiyê dibîne, ligel bikerî tê li dûv nivîşê bikerî tê guherîn:


252-Ez a keftîm.



253-Ez ê keftîm.





254- Deyka min a mirî û babê min ê mirî (Cemîl Mihemed Şîlazî, 2006: 44).



Di risteyên (252), (253), (254) de rêkveftin di navbera bikerî û karî de ye. Her wiha morfema nivîşî digel bikerî hatiye û pirta yekê ya morfema temamiyê digel karî hatiye. Ku wate hatina morfema nivîşî bo diyarkirina rûkara temamiyê peywendî bi rêkveftinê heye, her weku di risteyên serî de xuya ye.

Eger karê risteyê boriyê têper be, dê morfema nivîşî ya rûkara temamiyê ligel gireya navî ya berkarî bê. Ku wate hatina morfema nivîşî li dûv cureyê berkar (nêr û mê) tê guherîn:



Di risteyên (255), (256) de berkarê rista yekê “ez” morfema nivîşê nêr wergirtiye û di risteya duyê de “çîrok” morfema nivîşê mê wergirtiye. Her çend bikerê her du risteyan nêr in, belê hatina morfema nivîşî ku derbirînê ji rûkarî ligel karî dîke li dûv nivîşê berkarî (nêr, mê) tê. Çunkî rêkveftin di navbera berkarî û karî de ye. Lewra hindek caran bo sivikgotinê berkar tê ladan, lê morfema nivîşî her dimîne:

257-te yê kirîm.



258-Şivanî ya gutî.



Her weku me di nimûneyên (257), (258) de amaje pê dayî, ku ligel karê têper morfema nivîşî ligel berkarî derdikeve û her çend gireya berkarî jî bê ladan, ev morfem û pirta yekê ji morfema temamiya rûkara sentaksî derdibirin. Her wiha digel heman karî (boriyê têper) rêkkeftin di navbera berkar û karî de ye.

ENCAM

1. Morfema nivşî ji bilî diyarkirina nivşî (nêr, mê) navî ji layê jimare û kes ve diyar dike û peywendiyê xurt ligel wî navî dirust dike ku ev peywendî bi rêya rêkevtina civakî peyda dibe. Hatina vê morfemê li gor wî navê ku li berî wê tê ligel navî bi kar tê û bo navên duzayend û bêzayend mijdariya nivşê navî di zimanê kurdî de nahêle.

2. Du nivşên rêzimanî di zimanê kurdî de hene. Bi rêya morfemên nivşî ev nivş peyda dibe. Bikaranîna van morfeman li gor nivşê siruştî (nêr, mê, duzayend) hev digirin belê hindêk caran bo nivşê siruştî yê bêzayend hev nagirin û ji devokekê bo devokeke di ciyawaz e. Lewra peywendî di navbera navê bêzayend û morfemên nivşî de xwebixwe ye û civak li ser rêkvevtî ye.

3. Nivşê siruştî di karên berê de li ser sê cureyên nivşî yan çar cureyan hatiye polînkirin û zaravê cuda cuda bi kar aniye, belê nivşê rêzimanî bi du cureyan hatiye destnîşankirin û cureyên wê bi şêweyekî tevlihev hatine polînkirin. Her wiha zaravên cuda cuda yan bînavkirin bi şêweyekî nerastewxo hatine diyarkirin.

4. Morfema nivşî yek ji morfema benda rêzimanî ye. Şêweyên wê yên cuda cuda ji egerê fonolojî ne, lewra dibine elemorfên fonolojî, vê morfemê peywendî bi morfofonîmê û morfosentaksê û morfofonosentaksê ve heye.

5. Rolê morfemên nivşî di gireya navî de di doxê xistineser de bo diyarkirina peywendiya rêzimanî di navbera pêkhênên wê de diyar dibe. Bi rêya vê morfemê gire berfireh dibe û nebûna wê dibe egerê hilweşandina pêkhata gireyê û li dûv cureyê diyarkerî çend cureyên xistineser di vê goverê de hene.

6. gireya navî di ristê da role "biker, berkarê rastewxo, hevalkarê dem, hevalkarê çewayî, temamkerî" dibînit û gireya pêşnavî role "berkarê nerastewxo, hevalkarê dem, hevalkarê çewayî, hevalkarê cih, temamkerî" û gireya karî rolê "karî" dibînit.

7. di gireya navî da nav sereye û di gireya pêşnavî da amrazê peywendî "daçek" sereye û di gireya karî da kar sereye.

8. Ev morfem weku diyarkerê gireya navî di doxê tiyan, amaje û gazîkirinê de, her wiha rolê sînardarkirina gireyê di van doxan da dibîne.

9. Yek ji taybetmendiyan hevalnava amajeyê bo nêzîk û hevalnava nasînê û hevalnavê jimarê di vê goverê de wergiritina morfemên nivşî ye û ev taybetmendî bi rêya kopîkirinê tê encamdan.

10. Morfemên nivîşî di doxê xistineser û amajeyê de ji layê şêweyê ve wek hev in, belê rolê cuda di gireyê de dibînin.

11. Morfemên nivîşî di diyalekta serî de kartêkirinê li ser cureyê sîstemê doxê ergatîv, akuzatîv de dike. Bi taybetî eger karê risteyê boriyê têper be biker dê doxê ergatîvî wergire, eger karê risteyê têperê niha yan bê be, berkar doxê akuzatîvî wergire û ev her du dox bi rêya morfemên nivîşî tên diyarkirin.

12. Peywediya di navbera morfemên nivîşî û rêkvevtinê de di risteyê de bi vî awayî ye: Eger biker doxê ergatîv wergire, wê demê rêkvevtin di navbera berkarî û karî de ye. Eger berkar doxê akuzatîv wergire, rêkvevtin di navbera bikerî û karî de ye. Ku wate peywediya wan di risteyê de hevdij in.

13. Doxê tiyan di zimanê kurdî de ji bilî her du sîstemên doxên akuzatîv û ergatîv ku taybet in bi gireyên navî yên berkarî û bikerî ve, belê ev dox digel gireya pêşnavî jî tê û pêşnav vî doxî dide wî navê ku di dûv re tê. Ev car ev gire her rolî di risteyê de bibîne.

14. Zimanê kurdî yek ji zimanên ergatîva qilîşaw e, lewra gireya navî ya bikerî doxê ergatîvî bi tenê di tafê borî de werdigire.

15. Di govera behdînî de eger rûkarê karan bi rêya sentaksî di risteyê de derbirîn jê bê kirin û morfemên nivîşî vî rolî dibînin û du cureyên rûkaran diyar dikin û derkeftina van rûkaran bi tafê karî ve girêdayî ne, rûkarê berdewamiyê bi tafê niha û rûkarê temamiyê bi tafê borî ve girêdayî ne.

16. Peywendiyeka xurt di navbera rûkaran (berdewamî, temamî) û rêkvevtinê di risteyê de heye, her gireyeke navî (biker, berkar) bo diyarkirina rûkaran eger morfemên nivîşî wergirin, rêkvevtin di navbera heman gireya navî (biker, berkar) û karî de ye.

ÇAVKANÎ

Pirtûkên bi Zimanê Kurdî bi tîpên Erebî:

Marif, E. H. (1977). *Wişe Ronan le Zimanî Kurdî da*. Bexda: Çapxaneya Kurî Zanyarî Kurdî.

Marif, E. H. (1979). *Rêzimanî Kurdî, Bergî Yekem (Morfolocî)*, beşî yekem – naw. Bexda: Çapxaneya Korî Zanyarî.

Marif, E. H. (2004). *Ferhengî Zarawey Zimannasî Kurdî – 'Erebî – Îngilîzî legel Dû Paşko*. Hewlêr: Çapxaneya Rojhelat.

Marif, E. H. (2014). *Ferhengî Zarawey Zimannasî Kurdî – 'Erebî – Îngilîzî legel Dû Paşko*. Hewlêr: Çapxaneya Rojhelat.

Zaxuîy, Î. R. (2012). *Rêzimana Kurdî*. (Çapa 1.). Dihok: Çapxaneya Xanî.

'Elî, T. H. (2005). *Ferhengî Zarawekanî Dengsazî (Îngilîzî – 'Erebî – Kurdî)*. (Çapa 1.). Hewlêr.

Tufîq wehbî, destûrî zimanî kurdî, cîzmî yekem, Bexdad, 1929.

Ciger xuyn, awa û destura zimanê kurdî, Bexda, 1961

Bedirxan, C. A. (2002). *Elfabêya Kurdî û Bingehên Gramera Kurdmancî, Çapa Dîjîtal*. Stockholm: Weşanxana Nefel.

Ferhadî, S. 'E. (2013). *Hendê Layenî Ristesazî Zimanî Kurdî*. Hewlêr: Çapxaneya Hacî Haşim.

Amedî, S. B. E. (1987). *Rêzmana Kurdî Kirmancîya Jurî Û Jêrî Ya Hevberkirî*. (Çapa 1.). Hewlêr: Zankoya Selaheldîn.

Hesen, 'E. F. (1996). *Rêzimanî Kurdî*. Dihok: Çapxaneya Xebat.

Dizey, ‘E. M. (2013). *Ristesazî Ronankarî û Gwêzanewe*. (Çapa 1.). Hewlêr: Çapxaneyaya Hawar, Weşanên Yekîtiya Nivîserên Kurd.

Musa, ‘E. X. (2009). *Çend Babet û Lêkolînên Zimanî*. Dihok: Çapxaneyaya Hawar, Weşanên Yekîtiya Nivîserên Kurd.

‘Umer, F. (2004). *Çend Awirek li Zimanê Kurdî*. (Çapa 1.). Hewlêr: Çapxaneyaya Wezareta Perwerdê.

Hacî, V. S. (2009). *Kerese Betalekan Le Irwangey Tyorî deselat û Bestinewe (Şêwe Zarî Kirmancî Serû)*. Hewlêr: Çapxaneyaya Hacî Haşim.

Kurdoyêv, K. K. (1984). *Rêzimanî Kurdî Be Kerestey Dîyalêktî Kirmancî û Soranî*. K. Mukiryani (Wergêr). Bexda: Çapxaneyaya Eledîb Elbexdadî.

Mukiryani K. (2000). *Sîntakîs*. Hewlêr: Çapxaneyaya Aras.

Guherzî, M. T. (1999). *Rêzimana Kurdî (Zarê Kirmancî)*. Ji Blavukêt Govara Metîn. (Çapa 1.). Dihok: Çapxaneyaya Xebat.

Hewramanî, M. E. (1981). *Zarî Zimanî Kurdî Le Tirazûy Berawrida, Dezgay Roşinibîrî û Blawkirdnewey Kurdî*. Bexda.

Batîni, M. R. (1993). *Awirêkî Taze bo ser Rêziman*. H. Qazî (Wergêr). Swîd.

Mehwî, M. (2001). *Ristesazî Kurdî*. Hewlêr: Çapxanaya Zankoya Silêmanî.

Fetah, M. M. (1990). *Zimanewanî*. Silêmanî: Çapxaneyaya Zankoya Selahedîn.

Fetah, M. M. û Qadir, S. R. (2006). *Çend Layenêkî Morfolocî Kurdî, Dezgay Bilawkirdinewey Beşî Rûnakbîrî*. Silêmanî: Çapxaneyaya Rûn.

Fetah, M. M. (2010). *Lêkolînewe Zimanewaniyekanim, Ku Kirdinewe û Amade Kirdinewey Şêrwan Hisên Xoşnaw û Şêrwan Mîrza Qadir*. (Çapa 1.). Hewlêr: Çapxaneyaya Rojhelat.

Xoşnaw, N. 'E. (2014). *Dengsazî*. (Çapa 2.). Hewlêr: Çapxaneyaya Hêvî.

Emîn, W. 'U. (2004). *Çend Asoyekî Tirî Zimanewanî*. (Çapa 1.). bergî yekem, dezgay çap û bilawkirdinewey aras. hewlêr , 2004

Melazade, Y. Q. H. (2013). *Morfosîntakis Le Şêwe Zarî Koyeda*. Silêmanî: Çapxaneyaya Kemal.

Pirtûkên bi Zimanê Kurdî bi Tîpên Latînî:

Ebdulfettah, D. (2006). *Nav Di Zimanê Kurdî De (Kurmancîya Jorîn)*. (Çapa 1.). Hewlêr: Weşanxaneyaya Spîrêz.

Kurdo, Q. (1981). *Zimanê kurdî-Reziman*. Frankfurt: Weşanxaneyaya Komkar.

Kurdo, Q. (1990). *Gramera Zimanê Kurdî (Kurmanjî – soranî)*. Roja Nû. Stockholm.

Ebdulfettah, Deham. (2006). *Nav Di Zimanê Kurdî De (Kurmancîya Jorîn)*. (Çapa 1.). Hewlêr: Weşanxaneyaya Spîrêz.

Nameyên Akademîk yên kurdî:

Qadir, E. 'U. (2003). *Berawirdêkî Morfosîntaksî le Zimanî Kurdî û Farsî da*. Nameya Doktorayê. Silêmanî: Zankoya Silêmanî. Kolêja Zimên.

Kerîm, D. ‘E. K. (2002). *Rêzmanî Kurdî Rwaneyekî Berhemhênan û Gwêzanewe*. Nameya Masterê. Hewlêr: Zankoya Selahedîn. Kolêja Perwerdeyê.

Selîm, Z. X. (2009). *Elomorî di Zimanê Kurdî da*. Nameya Masterê. Dihok: Zankoya Dihokê. Kolêja Adabê.

Mihemed, H. W. (2000). *Firêzî Nawî û Firêzî Karî le Kirmancî Jûrûda*. Nameya Masterê. Silêmanî: Zankoya Silêmanî. Kolêja Zimên.

Ehmed, H. R. (2010). *Nawî Darêjraw û Girêy Nawî le Diyalêktî Serû û Nawerast da*. Nameya Masterê. Dihok: Zankoya Dihokê. Kolêja Adabê.

‘Ebuzejd, S. C. (2007). *Espêktên Karî di Kurdya Serî da*. Nameya Masterê. Dihok: Zankoya Dihokê. Kolêja Adabê.

‘Ebuzejd, S. C. (2013). *Cihgorîna Keristan di Ristê da “Govera Behdîni”*. Nameya Doktorayê. Hewlêr: Zankoya Soran. Kolêja Adabê.

Receb, S. Î. (2006). *Morfîmên Rêzîmanyên Kurdîya Serî “Govera Badînan”*. Nameya Masterê. Hewlêr: Zankoya Selahedîn. Kolêja Perwerdeyê.

Qadir, S. R. (2007). *Hendê Layenî Rêzmanî Destelat û Bestnewe (Gib) Le Zimanî Kurdî da*. Nameya Doktorayê. Silêmanî: Zankoya Silêmanî. Kolêja Zimên.

Mihemed, S. C. (2008). *Morfîma (- A) û Taybetmendiyên Wê di Kirmancya Jorî da*. Nameya Masterê. Dihok: Zankoya Dihokê. Kolêja Adabê.

Sedîq, Ş. S. (2008). *Ristey Zimanî Kurdî be Pêy Tîyurî (Katîgorî û Pêwane)Î Halîdey*. Nameya Masterê. Hewlêr: Zankoya Selahedîn. Kolêja Zimên.

Qadir, Ş. H. E. (2002). *Morfîme Bende Lêksîkî û Rêzmanîyekan û Erkiyan le Diyalêktî Goran da*. Nameya Masterê. Silêmanî: Zankoya Silêmanî. Kolêja Zimên.

Berzencî, Ş. R. M. (2004). *Yasakanî Darîştinî Laristey Diyarxerî le Zimanî Kurdî da*. Nameya Doktorayê. Hewlêr: Zankoya Selahedîn. Kolêja Adabê.

Emîn, Ş. N. (2007). *Nasyar û Nenasyar di Kirmancya Jûrî da*. Nameya Masterê. Dihok: Zankoya Dihokê. Kolêja Adabê.

Îbu, V. Î. ‘E. (2015). *Dox di Zimanê Kurdî da “Govera Behdîni”*. Nameya Doktorayê. Dihok: Zankoya Dihokê. Kolêja Adabê.

Silêvaney, V. S. H. (2001). *Rêkkewtin le Şêwey Jûrûy Kurdî da*. Nameya Masterê. Hewlêr: Zankoya Selahedîn. Kolêja Adabê.

Tufîq, Q. K. (2002). *Peywendîyekanî Nêw Deq*. Nameya Doktorayê. Hewlêr: Zankoya Selahedîn. Kolêja Adabê.

Me’ruf, E. M. (2005). *Dirustey Firêz le Zimanî Kurdî da*. Nameya Masterê. Silêmanî: Zankoya Silêmanî. Kolêja Zimên.

‘Ebas, L. C. (2003). *Nêr û Mê le Zimanî Kurdî da (Be Kereseş Kirmancî Jûrû û Xwarû)*. Nameya Doktorayê. Bexda: Zankoya Bexdayê. Kolêja Perwerdeyê – îbin ruşd.

Ehmed, M. ‘E. (2006). *Doxî Êrgetîv le Zimanî Kurdî da (Kirmancî Serû)*. Nameya Masterê. Hewlêr: Zankoya Selahedîn. Kolêja Perwerdeyê.

Ehmed, N. C. (2004). *Wişey Lêkdiraw Le Diyalêktî Kirmancî Xwarûy Zimanî Kurdî Da (Le Rûy Ruxsar û Nawerokewe)*. Nameya Doktorayê. Bexda: Zankoya Bexdayê. Kolêja Perwerdeyê - îbin ruşd.

Îslam, N. S. (2015). *Peywendî di Navbera Dengsazî û Watayê da di Her Dû Diyalêktên Kurdîya Jurî û Naverast da*. Nameya Masterê. Zaxo: Zankoya Zaxoyê. Skula Zimên.

Hesen. A. A. (2001). *Erkî Edvêrbil le Frawankirdnî Frêzî Karî da*. Namey Macsîtêr. Silêmanî: Zankoy Silêmanî. Kolîjî Ziman.

Ehmed. B. 'U. (1999). *Tênis le Dayalêktî jûrûy Zimanî Kurdî da (Goverî Badînî)*. Namey Master. Hewlêr: Zankuy Selahedîn. Kulîcî Adab.

Reswl. X. E. (2007). *Berkar le Zimanî Kurdîda be pêy Rêbazî Formî (Şiklî)*. Hewlêr: Zankoy Selahedîn. Kolîjî Ziman.

'Umer. D. 'E. (2009). *Hevalkarê Çewayî di Diyalêkta serîya Zimanê Kurdî da*. Nama Masterê. Dihuk: Zankuya Dihuk. Kulîja Adabê.

Ew pertûkên nimûne (mînak) jê hatîne wergirtin:

Bedel, 'I. M. (2006). *Xewneka Binevîşî – Kurte Çîrok*. Çapa Êkê. Ji Weşanên Êketiya Nivîserên – Dihuk. Çapxana Hawar. Dihuk.

Sindî.B. (2002). *Zêmarên Çiyayî. Çapa êkê*. Çapxane: Wezaretê Perwerdê. Hewlêr.

Hesen, S. M, (2011). *Nêzîkî Dumahya – Kurte Çîrok*. Çapa Êkê. Ji Weşanên Êketiya Nivîserên – Dihuk. Çapxana Hawar. Dihuk.

Kuvilî, S. (2005). *Tîr Ji Kivana Diweşyên û Ber Têne Min*. Ji Weşanên Êketiya Nivîserên – Dihuk. Çapxana Hawar. Dihuk.

Nalbend, E. (1998). *Baxê Kurda. Kumkirin: Teha Mayî*. Bergê Çarê, Çapa Êkê. Çapxana Xebat. Dihuk.

Şîlazî, C. M. (2006). *Çîvanoka Gayê Sor – Têkistek Foliklorê Kurdî ye*. Ji Weşanên Êketiya Nivîserên Kurd – dihuk, Çapxana Hawar. Dihuk.

Şêlazî, C. M. (2005). *Ji Çîrokên Foliklorê Kurdî – Komele Têkisit*. Çapa Îkê. Ji Weşanên Êketiya Nivîserên – Dihuk. Çapxana Hawar. Dihuk.

Pirtûkên bi Zimanê Erebi

Mihemed, H. Y. (2007). *Altezkîr û Altanîs Fî Qewa'd Alluxe Alkurdîye (Lehce Behdînî)*. M. F. Albazî (Wergêr). Hewlêr: Çapxaneya Hecî Haşim.

Alixwalî, M. 'E. (1982). *Mu'cem 'İlim Alluxe Alnezerî (İngilîzî – 'Erebî), Alteb'e Alula*. Lubnan: Meketbe.

Pirtûkên bi Zimanê Farisî:

Kilyasî, A. (1380). *Saxt Eştiqaqî Waje Der Farsî Êmruz*. (Çapa 2.) Tehran: Pijuhîşgahê 'İlum İnsanî û Mutali'at Ferhengî.

Zade, X. X. (2003). *Saxtê Zebanê Farsî*. (Çapa 4.). Tehran: Antişaratê Ahya Kêtab, Muctem' Çap û Neşir Ruydad.

Hal, E. R. (1381). *Zeban û Zenanşenasî*. T: Mihemed Rêza Batinî. Capê sêvum. Têhran: Çapxanê Şîrîn.

Ferşîdverd, X. (1382). *Cumlê û Tehevulê An Der Zebanê Farisî*. (Çapa 3.). Tehran: Çapxaneya Sipihir, Întêşarat Emîr Kebîr.

Hadsun, G., Zarurî, M. û Zebanişenasî B. M. (2008). *T: 'Elî Bihramî*. (Çapa 3.). Tehran: Çapxaneya Guher Endîşê, Antişarat Rehnema.

Gotarên ekadimîk:

Qadir, E. 'U. (2007). Partikil li zimanê kurdî da. *Govara Zankoya Silêmanî*, 22.

Emerî, B. (2008). Kupîkrin û guhrîn. *Govara Pirêz*, 1, weşanxaneyaya sipîrêz, dihoc.

Ehmed, B. 'U. (2008). Girê di diyalêkta serî da. *Govara Zankoya Dihok*, 1.

Ehmed, B. 'U. (2012). Riste ji layê pêkhatinêve di diyalêkta serî ya zimanê kurdî da (govera behdînî). *Govara Zankoya Dihok*, 1.

Berzincî, F. 'E. û 'Elî, B. E. (2004). Morfîme sîntaksîyekan le ristey nesade da. *Govarî Zankoya Silêmanî*, 14.

Ehmed, N. C. (2015, Nîsan). Morfofonosîntakis le zimanê kurdî da “kirmancî nawerast weku nimûne”. *Govara Zankoya Dihok*.

Emîn, W. 'U. (1989). Elemorfî rêzmanî. *Govara Roşinbîrî nwê*, 122.

Pirtûkên bi Zimanê Îngilîzî:

Barwari, M.S. (2004). *Topics in government and binding theory, with reference to English and Northern Kurdish*. Unpublished doctoral dissertation. Salahaddin: University of Salahaddin.

Bloomfield, L. (1933). *Language*. New York: Holt Rinehart.

Comrie, B. (1981). *Language Universal and Linguistic Typology: Syntax and Morphology*. England: Basil Blackwell Ltd.

Crystal, D. (1997). *A dictionary of Linguistics and Phonetics*. (4th Edition). United Kingdom: Blackwell Publishers.

Crystal, D. (2003). *A dictionary of Linguistics and Phonetics*. (5th Edition). United Kingdom: Blackwell Publishers.

- Finch, G. (2000). *Linguistic terms and concepts*. London: Macmillan.
- Fattah, M. M. (1997). *A Generative Grammar of Kurdish, Unpublished Ph.D. Dissertation*. Amestrדם: University of Amestrדם.
- Form Kin, V. (1988). *An introduction to Language*. U.S.A.: Holt, Rine hart and Winston Ins.
- Holguin, J. (2007). "The Status of Errgative Case in Bsque" From :<http://www2.hawaii.edu/yotuska/pubs/ch4.pdf>, 2007.
- Katamba, F. (1993). *Morphology*. London: Macmillan.
- Katamba, F. and Stomham, J. (2006). *Morphology*. (2th Edition). Palgrave: Macmillan.
- Lyons, J. (1968). *Introduction to Theoretical Linguistics*. Cambridge: First Puplicated, University Press.
- Radford, A. (1988). *Transformational Grammar*. Cambridge: Cambridge University Press.
- Radford, A. (1997). *Syntax: Aminimalist Introduction*. Cambridge: Cambridge University Press.
- Trask, R. L. (1993). *Adictionary of Grammatical Terms in Linguistics*. London: Roultedg.
- Ura, H. (2000). *Cheeking Theory and Grammatical Function in Universal Grammar*. Oxford: Oxford University Press.
- Quirk, R. At At. (1972). *A Grammar of Contemporary English*. London: Longmans Group Ltd.

ROLÊ MORFEMÊN NIVŞÎ DI SENTAKSA ZIMANÊ KURDÎ DE(GOVERA BEHDÎNÎ)

Yazar Majid Jabar Abozaid

Gönderim Tarihi: 26-Nis-2018 02:12PM (UTC+0300)

Gönderim Numarası: 953956259

Dosya adı: TEZA_MASTER_MARD_N.pdf (2.09M)

Kelime sayısı: 25096

Karakter sayısı: 122430

ROLÊ MORFEMÊN NIVŞÎ DI SENTAKSA ZIMANÊ KURDÎ DE(GOVERA BEHDÎNÎ)

ORIJINALLIK RAPORU

%**2**

BENZERLIK ENDEKSI

%**1**

İNTERNET
KAYNAKLARI

%**0**

YAYINLAR

%**1**

ÖĞRENCİ ÖDEVLERİ

BIRINCIL KAYNAKLAR

1

Submitted to University of Duhok

Öğrenci Ödevi

%**1**

2

eski.artuklu.edu.tr

İnternet Kaynağı

<%**1**

3

www.artuklu.edu.tr

İnternet Kaynağı

<%**1**

4

www.um.edu.mt

İnternet Kaynağı

<%**1**

5

www.scribd.com

İnternet Kaynağı

<%**1**

6

Submitted to College of Education for Pure
Sciences/IBN Al-Haitham/ Baghdad University

Öğrenci Ödevi

<%**1**

7

jflcc.com

İnternet Kaynağı

<%**1**

8

studentsrepo.um.edu.my

İnternet Kaynağı

<%**1**

9

majidnazari.persianblog.ir

İnternet Kaynağı

<% 1

10

Annette Herkenrath. "Ezafe and the complexity of attribution in academic Kurmanji", Walter de Gruyter GmbH, 2016

Yayın

<% 1

11

Submitted to Istanbul Aydin University

Öğrenci Ödevi

<% 1

12

acikogretimedebiyat.com

İnternet Kaynağı

<% 1

13

www.caluniv.ac.in

İnternet Kaynağı

<% 1

14

link.springer.com

İnternet Kaynağı

<% 1

15

www-compsci.swan.ac.uk

İnternet Kaynağı

<% 1

16

www.xweza.com

İnternet Kaynağı

<% 1

17

ku.wikipedia.org

İnternet Kaynağı

<% 1

18

documents.mx

İnternet Kaynağı

<% 1



T.C.

Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü

Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Yüksek Lisans Tezi

**BEHDİNİ YÖRESİ ÖRNEKLEMİNDE
KÜRT DİLİNDE CİNSİYET
MORFEMLERİNİN ROLÜ**

MAJID JABAR ABOZAID

15711018

Danışman

Doç. Dr. Rafik Sulaiman

Mardin 2018